ji is used after a comparative adjective or adverb to express a comparison like *than* in English. The noun/pronoun following **ji** must be in the oblique case.

Hesp ji mehînê bezatir e./The horse is faster than the mare.

Ker ji hesp hêdîtir e./The donkey is slower than the horse.

Ev ji wan spehîtir in./These are more beautiful than those are.

Ev ji wê şêrîntir e./This is sweeter than that.

Ew ji vî tahltir e./That is more bitter than this.

Xanîyê me ji yê we bilindtir e./Our house is taller than yours.

Keça Serdar bedewtir e./Serdar's daughter is more beautiful.

Ew çiya asêtir in./Those mountains are steeper.

Ew tirştir e./That is more sour.

Ev tirî şêrîntir e./These grapes are sweeter.

Balafir çêtir e./The aircraft is better.

Hesen ji Eyşanê mezintir* e./Hesen is bigger (older) than Eyşan.

Ev ji yên din hişkîtir in.These are harder than the others.

SUPERLATIVE

The superlative expresses the highest degree of an adjective or adverb. In Kurdish it can be formed in the following ways:

1) using **-tirîn** as the superlative ending:

Xecê keça bedewtirîn e. Xecê is the most beautiful girl.

Ûso kurê xurttirîn e. Ûso is the strongest boy.

A spehîrtirîn ev e. The most beautiful one is this.

Ên şortirîn ew in. The saltiest ones are those.

(*) **Mezintir** is often contracted as **mestir** in the spoken language.

2) using **herî**:

Ev çiya yê herî asê ye. This mountain is the steepest one.

Azad herî teral e. Azad is the laziest.

A herî xweş ev e. The nicest one is this.

Ên herî beza Elî û Silo ne. The fastest (ones) are Elî and Silo.

Elî û Silo yên herî beza ne. Elî and Silo are the fastest ones.

Sêva herî sor a min e. The reddest apple is mine.

3) using the words **hemî** or **giş(t)** (all) with the comparative:

Çiyayê Everest ji hemîyan bilindtir e.

Tirîyê me ji hemî tirîyan tirştir e.

Ev ji hemîyan hişkîtir e.

Mount Everest is the highest/is higher than all. Our grapes are sourest/sourer than all. This is the hardest/harder than all.

AS ... AS - WEKHEVÎ

The Kurdish words **bi qasî** and **wek (wekî)** act as **as ... as**.

1. **Ez bi qasî te dirêj im.**

2. **Tu bi qasî me ne jîr î.**

3. **Ma Mizgîn bi qasî wê qelew e?**

4. **Na, ew bi qasî wê ne qelew e.**

5. **Darên kê bi qasî yên wî bilind in?**

6. **Ên me ji yên wî bilindtir in. Ên me yên herî bilind in.**

7. **Na, yên Bawer ji yên we jî bilindtir in.**

1. I am as tall as you. 2. You are not as hard-working as we are. 3. Is Mizgîn as fat as her? 4. No, he is not as fat as her. 5. Whose trees are as tall (high) as his? 6. Ours are taller than his. Ours are the tallest ones. 7. No, Bawer's are even taller than yours.

INTENSIFYING THE ADJECTIVES

The Kurdish words **pir**, **zehf**, **gelek**, **gelekî** are used to intensify adjectives. Note that they act as both indefinite determiners and adverbs. They all mean: **much**, **many**, **a lot**, **very**. **yekcar** means very much, quite, entirely, completely.

1. Ez gelekî lawaz im.
2. Hun ji me pir xurttir in.
3. Bavê min zehf jêhatî ye.
4. Mamoste yekcar baş e.
5. Ev keç yekcar teral e.

1. I am very thin. 2. You are much stronger than us. 3. My father is very skillful. 4. The teacher is quite good. 5. This girl is quite lazy.

DIMINUTIVE - HÛREDAR

-ek, -ik and -ok are diminutive endings used to imply smallness, just like -t in **eaglet** (young eagle), -ette in **kitchenette**:

| | |
|-------------------------|------------------------------------|
| kêr (knife) | kêrik (pocket-knife) |
| dar (tree, wood) | darik (short stick, match) |
| dest (hand) | destik (handle, small hand) |

It can frequently be without evident diminutive implication:

| | |
|-----------------------|-------------------------|
| jin (woman) | jinik (woman) |
| law (boy, son) | lawik (boy, son) |
| mêr (man) | mêrik (man) |

The smallness may be in token of affection, pity, etc.:

mêrik (poor fellow)
keçik (poor girl)
mirovok (poor fellow)

HÎNDARÎ 8

A: Make sentences suitable to the pictures.
 Li gora wêneyan hevokan çêkin.

Example: *Hesen - Bawer (xizan)*; *Hesen ji Bawer xizantir e.*



Zinê Fatê (qelew)

1)



Kalo



Zelal (ciwan)

3)



beran



mîh (mezin)

6)




Weyso




Newal (beza)

Reşo

2)



çay dew



qeşa (sar)

4)



goşt



hêk (sivik)

5)



pênuşa wî



pênuşa wê (zirav)

7)

B: Cihên vala tije bikin.

1. Serbest ... Bişar dirêjtir e.
2. Ev keç ji wê keç... bedewtir e.
3. Ma tu ji Eyşan... kintir î?
4. Ma kur ji keç... jîrtir in?
5. Na, keç jî bi ... kuran jîr in.
6. Kî ji ... kintir e?
7. Ma dew ... qasî mast xweş e?
8. Na, mast ... dew xweştir e.
9. Ma Azad xwendekar... herî teral e?
10. Na, yên din ji wî teraltir
11. Tu ji hemî... lawaztir î.
12. Ew ji hemî karker... jîrtir e.
13. Yê tirştirîn ev ...
14. Teqşî ji hespan bezatir in. Lê yên ... beza balafir in.
15. Ma kera te, ji ya wê beza... e?
16. Çiyayên kuderê yên herî asê ...?

C: 5 ji hevokên jêrîn çewt in. Kîjan? Çima?/5 of the following sentences are wrong? Which? Why?

1. Keça herî bedew kî ne?
2. Kura xurttirîn a kê ye?
3. Ma tu bavê qelewtirîn herî yî?
4. Ez xwendekarê herî jîr im.
5. A min ji ya te şêrîntir e.
6. Kêra kî ji ya min tûjtir e?
7. Serbest û Azad mamosteyên herî lawaz in.
8. Kî ji kê bezatir e?
9. Ez ji wan gişan bezatir im.
10. Lê tu ji mintir beza yî.

FERHENG

| | |
|---|---|
| bakur (m) north | karsaz businessman |
| bes but | kes person |
| bi rastî in fact, actually | metbex (f) kitchen |
| çend some; how many? | nandank (f) bread box, bread-bin |
| çenek, çenikek little, a little | lîstok (f) toy |
| demjimêr (f) watch, clock | navçe (f) centre |
| derew (f) lie | penîr, penêr (f) cheese |
| dest (m) hand | piçek, piçikek a little (bit) |
| dexlik (f) drawer | qutik (m) shirt |
| dor (f) surroundings | rast right, true |
| fêkî fruit | sabûn (f) soap |
| herwekî din(hwd) et cetera (etc) | sermîyandar capitalist |
| hin, hinek some | tax (f) neighbourhood, district |
| hindîkek little, a little | vexwarin (f) drink, drinking |
| karmend civil servant, employee | xwarin (f) food, meal, eating |

HEBÛN

The Kurdish verb **hebûn** covers for the English verbs **to exist** and **to have**, as well as the expressions like **there is/are**.

a) There is/are

present conjugation: heye (sing.), hene (plural)

Darek heye. There is a tree.

Darin hene. There are (some) trees.


The sentence starts with a prepositional phrase, if any.

b) to have


1. The object is connected to an oblique pronoun:

Piçek nanê wî heye.

He has a little bread.




Li ser masê pirtûk hene.



Li kuçê darek heye.




Di destê wê de listokek heye.




Li mala me televîzyonek heye.



Di şûşê de av heye.



Li ber pînikê mirîşk hene.



Di dexlikê de pirtûk hene.

Ma televîzyona we heye?

Erê, heye.

Çar gogên min hene.

Ma pêûsa te heye?

Erê, pêûsa min heye.

Pêûseke min heye, lê ne

bi min re ye, li malê ye.

Do you have a TV set?

Yes, we have.

I have four balls.

Have you got a pen?

Yes, I have a pen.

I have a pen, but it is not on me, it's at home.

2. using the oblique pronouns as the subject (this form is not common in the spoken language):

Min du xwişk hene.

I have two sisters.

Wî lènûskek heye.

He has a notebook.

Me welatek heye.

We have a homeland.

We demjimêrin hene.

You have watches.

Ma wan zaro hene?

Do they have children?

In the first form, the connective pronoun **yê** links **çi** (what) and the oblique pronoun. **çi** and **yê** may be contracted to **çî** in the spoken language.

Çi yê min heye?

What do I have?

Çi yê te heye?

What have you got?

Çi yê wî heye?

What has he got?

Çi yê me heye?

What have we got?

This form is also used for expressions such as **What is the matter with you?** **What is wrong with you?**, etc.

Çi yê te heye?

What is wrong with you?

Ez nexweş im.

I am ill.

Çi Azad heye?

What is wrong with Azad?

Nexweş e.

He is ill.

yê is not used in the second form, as no link is needed.

Te çi heye?

What do you have?

heye/hene is replaced with **tune(ye)**, when being negated. **tunin** is normally the plural of **tune**, but usually **tune** is used as plural too. (*)

1. **Di taxa me de sermîyandar tunin.**
2. **Li hin taxan gelek karker hene.**
3. **Li kargeha bavê min karsazek û gelek karmend hene.**
4. **Sarkera wan tune.**
5. **Piçikek goştê me jî tune.**
6. **Xweheke min heye, lê birayê min tune.**
7. **Nandanka wan heye, lê belê, nan di wê de tune.**
8. **Çi we heye?**
9. **Tiştêkî me tune.**

1. There are no capitalists in our neighbourhood. 2. There many workers in some neighbourhoods. 3. There are a businessman and many employees in my father's office. 4. They don't have a fridge. 5. We haven't got even a little bit of meat. 6. I have a sister, but I don't have a brother. 7. They have a bread box, but there is no bread in it. 8. What have you got? 9. We haven't got anything.

c) to exist

| | | |
|-----------------|------------------|---------------------------|
| Ez heme | I exist | Ez tuneme (tunim) |
| Tu heyî | You exist | Tu tuneî (tunî) |
| Ew heye | He/she/it exists | Ew tune (tune) |
| Em hene | We exist | Em tunene (tunin) |
| Hun hene | You exist | Hun tunene (tunin) |
| Ew hene | They exist | Ew tunene (tunin) |

Ew ji me re dibêjin, "hun tunin". They tell us, "you don't exist"

This form is also used to indicate a willingness or a refusal to participate in something:

| | |
|------------------------------------|--|
| Ez di tiştên wanî de tunim. | I have nothing to do with such things. |
| Ez di wî karî de tuneme. | I have nothing to do with that matter. |
| Ez heme. | Count me in. (I am willing to do it.) |

(*) In some regions **nîye** (sing.) and **nîne** (plural) are used for the negation (has/have not). However, as they mean **is/are not** in some other regions, **tune** may be preferred to avoid confusion.

Bûk e, tune zar-ziman; xwesî ye, tune dîn-îman.

Kuştin heye, reva mêran tune.

bûk (f) bride **xwesî** (f) mother in law **zar-ziman** speech

**Tiştêkî min heye;
Canê wî goşt e,
Kincê wî derzî.
Ew çi ye?**



HÎNDARÎ 9

Mala Me

Mala me li bajarekî ye. Bajar li bakurê Kurdistanê ye. Li Kurdistanê gelek bajarên piçûk hene. Bes, gelek bajarên mezin tune. Zehf gund hene. Gund ji bajaran pirtir in. Li hin gundan xwendegeh hene, lê belê li hinan tune. Gund tije gundî ne. Lê, hindik axa hene. Li bajaran zehf xwendegeh û mamoste hene. Hin xwendegeh baş in, hin jî ne baş in.

A: Pirsên jêrîn bersîv bikin/Answer the following questions.

1. **Mala wî li ku ye?**
2. **Ma li Kurdistanê gelek bajarên mezin hene?**
3. **Ma bajar ji gundan pirtir in?**
4. **Ma xwendegeh gişt baş in?**
5. **Ma axa ji gundîyan pirtir in?**
6. **Ma li hemî gundan xwendegeh hene?**

Taxa Me

Taxa me li rojhilatê Mêrdînê ye. Taxeke piçûk e. Hemî taxên dora wê ji wê mestir in. Ew taxa piçûktirîn e. Mirovên li taxa me karker, karmend û her wekî din in. Ew xizan in. Bi qasî mirovên li navçeya bajêr ne dewlemend in. Bi rastî, li bajarê me, em ên herî xizan in. Karsaz ji mirovên herî dewlemend in.

Xanîyê me jî piçûk e. Xanîyên cîranan mezintir in. Li mala me 5 kes hene: ez, dêya min, bavê min û du xwişkên min. Birayê min tune. Xwişkên min Çîçek û Nalîn in. Çîçek pir bedew e. Nalîn jî bi qasî wê bedew e. Nalîn ji Çîçekê dirêjtir e. Lê belê, Çîçek ji Nalînê girantir e. Ê herî giran ez im. Ez ji wan girantir, mezintir û bezatir im. Bes bavê me yê xurttirîn û dêya me ya jirtirîn e. Çîçek a herî kin û herî piçûk e. Sarkera me di metbexê de ye. Li kuçê kanîyek heye. Ava wê hênik e. Lê ya sarkerê hêniktir e. Penîr, mast û fêkîyên me di sarkerê de ne. Dew xweş e, lê mast jî dew xweştir e.

B: Pirsên jêrîn bersîv bikin.

1. Ma taxa wî mezin e? 2. Mirovên li taxa wî kî ne? 3. Kî dewlemend in? 4. Ma xanîyê wan mezin e? 5. Ma birayê wî tune? 6. Xwişkên wî hene? 7. Xwişkên wî kî ne? 8. Kî bi qasî kê bedew e? 9. Ê herî xurt kî ye? 10. Li kuderê kanîyek heye? 11. Ava ku hêniktir e? 12. Çi xwarina derew e? 13. Çi xwarina rast e? 14. Çi xwarina mîr e?

**Nan û dew xwarina derew;
nan û mast xwarina rast;
nan û şîr xwarina mîr.**

derew lie, false rast true, actual mîr prince

HEJMARÊN KURDÎ - KURDISH NUMBERS

| | | | |
|----|-------------------|-----------|-----------------------|
| 0 | sifir, nîn, tune | 30 | sî, sîh |
| 1 | yek | 31 | sî û yek |
| 2 | du, dudu, dido | 40 | çel, çil |
| 3 | sê, sisê | 50 | pêncî |
| 4 | çar | 60 | şêst |
| 5 | pênc | 70 | heftê |
| 6 | şeş | 80 | heştê, heştê |
| 7 | heft | 90 | nod |
| 8 | heşt, heşt | 100 | sed |
| 9 | neh | 101 | sed û yek |
| 10 | deh | 112 | sed û dozdeh |
| 11 | yanzdeh, yazde(h) | 120 | sed û bîst |
| 12 | donzdeh, dozde(h) | 121 | sed û bîst û yek |
| 13 | sêzdeh | 200 | du sed |
| 14 | çardeh | 300 | sê sed |
| 15 | panzdeh, pazde(h) | 1.000 | hezar |
| 16 | şanzdeh, şazde(h) | 2.543 | du hezar û pênc |
| 17 | hevdeh, huvdeh | | sed û çel û sisê |
| 18 | hejdeh, hîjdeh | 10.000 | lek, deh hezar |
| 19 | nozdeh | 500.000 | kirûr, pênc sed hezar |
| 20 | bîst | 1.000.000 | milyon |

Yek yek e, dudu komek e.
kom (f) group

FERHENGOK

| | |
|---|-------------------------------|
| çaryek, çarîk (f) quarter | meh (f) month |
| çend how many; some | nîv (m) half |
| çend salî how old | rêz (f) line, order |
| deqe, deqîqe (f) minute | sal (f) year |
| heb, lib (f) a single thing, item, piece | saniye (f) second |
| kêm to (time); less, insuffi- cient, not enough | seet (f) hour |
| | tenê only, just, alone |
| | û past (time) |

dudu and **sisê** lose their first syllable, when modifying a noun:

| | |
|-----------------|--------------|
| du kes | two persons |
| sê mirov | three people |
| çar mîh | four sheep |

| | |
|------------------------------|--------------------------------|
| Çend birayên te hene? | How many brothers do you have? |
| Çar birayên min hene. | I have four brothers. |
| Çend gogên Dara hene? | How many balls has Dara got? |
| Du gogên Dara hene. | Dara has got two balls. |

The number **yek** (1) and all numbers ending in **yek** are feminine singular. Oblique: **yekê, pêncî û yekê**.

When the number **yek** is used to refer to a noun, it gets an ending according to the gender of that noun:

| | |
|--------------------|------------------------|
| pênûsa yekî | someone's pen (male) |
| pênûsa yekê | someone's pen (female) |

The numbers **dudu** (2) through **neh** (9) and any numbers ending in **2** through **9** (22, 34, 98, etc.) are treated as **plural** nouns.

sala 1994'an.

The numbers ending in **0** are treated as **masculine singular**.

When a number (except **1**) modifies a noun, the noun is declined as **plural**.

2 keçên min hene.
10 kurên wan hene.
30 mîhên me hene.
155 xwendekarên xwendegehê hene.

lek and **kirûr** are no longer in use, although used in some old texts.

Ji is used in fractions.

| | |
|----------------------------|------|
| Ji çaran yek | 1/4 |
| Ji sisêyan dudu | 2/3 |
| Ji bîst û çaran yek | 1/24 |

Ji can also be used in such expressions as **one of us, some of us, three of them, etc.:**

| | |
|-----------------------------|---------------|
| yek ji me | one of us |
| sisê ji wan | three of them |
| hinek ji we | some of you |
| çend (kes/heb) ji me | some of us |
| gelek ji wan | many of them |

Giş^K(all) and **piranî** (majority) get a connective ending, when linked with a noun/pronoun.

| | | |
|--------------------------------|--------------------|----------------------------------|
| Giş^K me | all of us | also em giş^K |
| Piranîya wan | most of them | |
| Piranîya xaniyan | most of the houses | |
| Giş^K xaniyan | all of the houses | also xanî giş^K |

1. Yek ji mêvanan mamoste ye.
2. Çar ji wan nexweş in.
3. Hinek ji wan baş in, lê hinek ne baş in.
4. Çend heb ji me xwendekar in.
5. Gelek ji we karker in.
6. Gişa gundîyan li vir in.
7. Gundî giş li vir in.
8. Piraniya xaniyan piçûk in.

ORDINAL NUMBERS - HEJMARÊN RÊZDAR

An **ordinal number** tells us the position of something in an ordered group of things: **first, second**, etc.

In Kurdish, ordinal numbers can be formed in the following ways:

1) Using the oblique endings: -ê, -î, -an.

yek is singular feminine, thus it takes -ê.

Normally, the rest of the numbers are considered as **plural**, and they all take the plural ending **-an**. However, in some regions the numbers ending in **0** are considered as singular masculine, thus the ending **-î** is used instead of **-an**.

| | |
|-------------------------|----------------------------|
| xwendekarê pêşîn | the first student (male) |
| meha çaran | the fourth month |
| kovara yazdehan | the eleventh magazine |
| ê heftêyan | the seventieth (masculine) |
| ên pêşîn | the first (ones) |
| mirovê dawîn | the last person |

2) Using the ending -em.

3) Using the ending -emîn.

Di rêzê de hezar kes hene. E pêşîn ez im. Baranê çaran e. Evîn a bîstan (bîstî) e. Ya sedan (sedî) Berfînk e. Serdar dusedemîn e. Kesa dawîn Xecê ye.

HÎNDARÎ 10

Practice the following and similar questions.

- Tu kî yî?
 Tu çawa yî?
 Navê te çi ye?
 Ev çi ye?
 Ew çi ne?
 Ma ev nan e?
 Kî dirêj e?
 Kî mezin e?
 Ma ev ji wê kintir e?
 Kî ji te jîrtir e?
 Hevalê herî baş kî ye?
 Zilamê herî qelew kî ye?
 Kî lawaztirîn e?
 Kî bi qasî te dirêj e?
 Ma tu bi qasî min bedew î?
 Rengdêrên xwedîtî çi ne?
 Rengê ala we çi ye?
 Sakoyê te çi reng e?
 Ma şîr reş e?
 Bavê te li ku ye?
 Birayên te li ku ne?
 Di sarkera we de çi heye?
 Li ser masê çi heye?
 Di bêrikên te de çi hene?
 20, 35, 41 bi Kurdî çi ne?
 Demjimêr çend e?
 Çend xwişkên te hene?
 Çend pênûs li ser masê ne?
 Li ser masê çend pênûs hene?

SEET PIRSÎN Û GOTÎN ASKING AND TELLING THE TIME

Seet çend e? What time is it?

Seet çi ye? What time is it?



Demjimêr pênc e.



Seet dozdeh e.



Seet şeş û pênc deqîqe ye.



Demjimêr neh û nîv e.



Seet yek û çarîkek e.



Seet şeş kêr sê deqîqe ye.

Seet di çendan de? (At what time?)

çend takes the oblique ending, because it is the object of a preposition (di). So do the other words or numbers. Deqe (deqîqe) might take -yan or be contracted as deqan (deqîqan). Nîv (half) is normally masculine. But when used with a number, it takes an ending in agreement with the number.

Demjimêr di çendan de? At what time?

Demjimêr di yekê de. At one o'clock.

Seet di çaran de. at 4:00.

Seet di çar û pênc deqîqan de. at 4:05.

Demjimêr di şeş kêr du deqan de. at 5:58.

Seet di heft û nîvan de. at 7:30.

Seet di sisê û çaryekê de. at 3:15.

Seet di şeş û nîvan de. at 6:30.

Seet di yek û nîvê de. at 1:30.

FERHENGOK

biro, biroj by day, during the day,

bişev by night, at night

borîn (bibore) vi to pass; to forgive

bûn (bibe) vi to be, to become

çûn (biçe) vi to go

dan (bide) vt to give

dem (f) season; time

dereng late

dirûtin (bidirû) vt to sew

dîtîn (bibîne) vt to see

erd (f) ground

êvar (f) evening

êvarî in the evening

firavîn (f) lunch

gotîn (bibêje) vt to say, to tell

hatîn (bihê, bê) vi to come

hefte (f) week

her every

her diçe gradually, increasingly

herroj, hero every day

hêsan easy

hiştin (bihêle) vt to leave, to let

jîn (bijî) vi to live

kar (m) work

kirin (bike) lg to do, to make

kişandin (bikişîne) vi to pull,

to draw; to smoke

kişik (m) chess

listîn (bilîze) vi to play

navnîşan (f) address

nêrîn (binêre) vt to look

nivîsîn (binivîse) vt to write

peyvîn (bipeyive) vi to speak

pirsîn (bipirse) vt to ask

razan (razê) vi to sleep

revîn (bireve) vi to write

roj (f) day, sun

sal (f) year

sibê tomorrow

şev (f) night

şîv (f) dinner

şuştin (bişo) vt wash

taşê (f) breakfast

tîpnivîs (f) typewriter

xebitîn (bixebite) vi to

work

xew (f) sleep

xwarin (bixwe) vt to eat

xwastin (bixwaze) vt to want

xwendin (bixwîne) vt to read

zan (bizê) vt to give birth

zanîn (bizane) vt to know

zû early, quick(ly)

The words in brackets indicate the imperative form. vi means verb intransitive and vt verb transitive.

LÊKER - VERB

The Kurdish infinitive is normally one word:

past stem + in/n: çûn (çû/n), xwarin (xwar/in)

RAWEYA FERMANÎ - IMPERATIVE

Because there are many rules governing the formation of the imperative, it is very difficult for the beginners to keep all those rules in mind. Learning the imperative together with the infinitive is easier. In this book, the imperative of each verb is written in brackets following the infinitive.

The singular imperative normally starts with the prefix **bi-** and ends in **-e**: **nivîsîn (binivîse)**

binivîse (write) is imperative singular. This means it is directed to one person. **-e** is replaced with **-in** to form the imperative plural: **Binivîsin!** Write! (to more than one person)

If the imperative does not end in **-e**, **-n** is used instead of **-in** so that the sounds agree.

| | | | |
|----------------------|---------------------|-------------------------|--|
| Şuştin (bişo) | jîn (bijî) | | |
| Bişo! Wash! | Bijî! Live! | directed to one person | |
| Bişon! Wash! | Bijîn! Live! | to more than one person | |

The imperative is negated by replacing **bi-** with **ne-**.

| | | | |
|------------------|--------------|-------------------|----------|
| Nenivîse! | Don't write! | Nenivîsin! | (plural) |
| Neşo! | Don't wash! | Neşon! | (plural) |
| Nexwe! | Don't eat! | Nexwin! | (plural) |

In some regions **me-** is used instead of **ne-**.

The imperative also helps with forming certain tenses. It is therefore important to learn it with the infinitive.

Tev bikin, tev bixwin.

Bibêje rast, razê rast.

Zêr bidin destê zêrnasan.

Bixwe mîna mêran, rabe mîna şêran.

Nanê xwe bihêle sibê, şuxulê xwe nehêle sibê.

| | | |
|---------------|----------------------------------|---------------------|
| dest (m) hand | rast right, true, flat, straight | mêr (m) (brave) man |
| mîna like, as | zêr (m) gold | şuxul (m) work |
| tev together | zêrnas gold-expert | |

DEMA NUHA PRESENT TENSE

The present stem is that part of the verb between the **bi-** and **-e** of the imperative of the verb. This is one of the reasons why one should learn the imperative of a verb with the infinitive.

| <u>imperative</u> | <u>present stem</u> |
|-------------------|---------------------|
| binivîse | nivîs |
| biçe | ç |
| bixebite | xebit |
| binivîse | nivîs |

Some imperatives end in a vowel other than **-e**. In this case, the present stem includes that vowel too.

imperative present stem

| | |
|--------|------|
| bişo | şo |
| bidirû | dirû |
| bijî | jî |

The present indicative is formed by prefixing **di-** to the present stem of the verb and suffixing the appropriate part of the verb "bûn/to be".

present tense: **di + present stem + bûn**

BÛN DEMANUHA

| | | |
|-----------------------|------------------------|---------------------------|
| Ez karker im. | Ez di+nivîs+im. | I write/am writing. |
| Tu karker î. | Tu dinivîsî. | You write/are writing. |
| Ew karker e. | Ew dinivîse. | He/she writes/is writing. |
| Em karker in. | Em dinivîsin. | We write/are writing. |
| Hun karker in. | Hun dinivîsin. | You write/are writing. |
| Ew karker in. | Ew dinivîsin. | They write/are writing. |

xwarin (bixwe)

| | | | |
|-------------------|--------------------|--------------------|---------------------|
| Ez dixwim. | Em dixwin. | Ez direvim. | Em direvin. |
| Tu dixwî. | Hun dixwin. | Tu direvî. | Hun direvin. |
| Ew dixwe. | Ew dixwin. | Ew direve. | Ew direvin. |


If the present stem ends in a vowel other than -e, then the first vowel of "bûn" is dropped. This leaves no endings for the second and the third person.


jîn (bijî)

| | | | |
|-----------------|------------------|------------------|-------------------|
| Ez dijîm | Em dijîn | Ez dişom. | Em dişon. |
| Tu dijî | Hun dijîn | Tu dişo | Hun dişon. |
| Ew dijî | Ew dijîn | Ew dişo. | Ew dişon. |

şuştin (bişo)

| | |
|------------------|-------------------|
| Ez dişom. | Em dişon. |
| Tu dişo | Hun dişon. |
| Ew dişo. | Ew dişon. |





In some regions, instead of dropping the second person singular ending, *y* is used as a buffer between the stem and the ending *î*.

Tu dişo **Tu dişoyî**
Tu didirû **Tu didirûyî**

But even in those regions, no ending is used for the stems ending in *î* and *ê*.

Tu dijî., **Tu digirî** **girîn (bigirî)** to cry, to weep

NEYÎNÎ - NEGATION

The present tense is negated by replacing *di-* with *na-*.

Ez dixwim **Ez naxwin**
Tu dinivîsî **Tu nanivîsî**
Tu diçî **Tu naçî**
Ew direve **Ew nareve**

Note that the only difference between the negative of the present tense and the imperative is *na-*.

Neçe! (Don't go!) **Ew naçe** (He is not going)
Neçin! **Em/hun/ew naçin**

PIRS - QUESTION

As always, questions are formed by stress and voice inflection, or by using words, such as *ma*, which make the questions more emphatic.

Tu diçî? Are you going?
Ma tu diçî? Are you going?
Kî dipeyive? Who is speaking?
Ma ew napeyivin? Are they not speaking?

Golika malê ji gayê malê natirse.

ga (m) ox **golik** calf **tirsîn (bitirse)** to be afraid/scared

A Kurdish sentence normally starts with the subject and ends in the verb. However there are exceptions which will be dealt with later in this chapter.

| | |
|----------------------------------|-------------------------------|
| Biro pir dipeyive. | Biro speaks a lot. |
| Mamoste li Aksarayê dijî. | The teacher lives in Aksaray. |
| Tu pir cixare dikişînî. | You smoke a lot. |
| Dara hindik dixebite. | Dara works a little. |

As a general rule, if the subject of a sentence is **simple**, the direct object should be **oblique** and vice versa.

| | |
|-------------------------------|--------------------------------|
| Bavê min sêvekê dixwe. | My father is eating an apple. |
| Azad pirtûkê dixwîne. | Azad is reading the book. |
| Ez nameyekê dinivîsim. | I am writing a letter. |
| Ew nanekî dixwe. | He/she eats a (loaf of) bread. |
| Ew helbestan dixwazin. | They want the poems. |
| Ez wan nabînim. | I don't see them. |
| Ma tu Xelîl(î) nabînî? | Don't you see Xelîl? |
| Ew me dixwazin. | They want us. |

Some verbs are used with certain prepositions; it is therefore important to know the appropriate preposition for a verb.

| | |
|-------------------------------|-------------------------|
| Ez ji te re dibêjim. | I am telling you. |
| Hun li kê dinêrin? | Who are you looking at? |
| Ew bi me re napeyivin. | They don't talk to us. |
| Ew ji te dipirse. | He is asking you. |

Note that the objects of the prepositions are in the oblique case.

There are four basic prepositions:

| | |
|---------------------|----------------------|
| ji from, off | li at, on, in |
| bi with, by | di in |

Those prepositions and their objects can be contracted to:

| | |
|----------------------|------------------|
| jê (ji wî/wê) | from him/her/it |
| lê (li wî/wê) | at/on him/her/it |
| pê (bi wî/wê) | with him/her/it |
| tê (di wî/wê) | from him/her/it |

| | |
|-------------------------------------|------------------------|
| Ez heroj ji Xezalê dipirsim. | I ask Xezal every day. |
| Ez heroj ji wê dipirsim. | I ask her every day. |
| Ez heroj jê dipirsim. | I ask her every day. |

| | |
|-----------------------------|--------------------------|
| Em li Şoreş dinêrin. | We are looking at Şoreş. |
| Em li wî dinêrin. | We are looking at him. |
| Em lê dinêrin. | We are looking at him. |

| | |
|------------------------------|--------------------------|
| Ew bi Zînê re dilîze. | He is playing with Zînê. |
| Ew bi wê re dilîze. | He is playing with her. |
| Ew pê re dilîze. | He is playing with her. |

Note the difference between **bi** and **bi...re**, and **ji** and **ji...re** in the following sentences

1. **Ma tu ji wî re dibêjî?**
2. **Jê re nebêje!**
3. **Ev ji te re ye.**
4. **Dêya min herşev ji min re çîrokekê dibêje**
5. **Ji min re navnîşana xwe binivîse.**
6. **Ji te re çi?**

7. Bavê wan ji wan re pirtûkan dixwîne.
8. Ez her meh ji birayê xwe re nameyekê dinivîsim.
9. Ez ji wî re pir tiştan dikim, lê belê nabîne.

1. Are you telling him? 2. Don't tell him! 3. This is for you. 4. My mother tells me a story every night. 5. Write your address for me. 6. What is it to you? 7. Their father reads books to them. 8. I write a letter to my brother every month. 9. I do a lot of things for him, but he doesn't see (realize).

1. Bi wêneguhêzê nelîze!
2. Pê nelîze!
3. Kurê Azad pir bi kişik dilîze.
4. Ma tu bi Kurdî dipeyivî?
5. Na, ez bi Îngîlîzî dipeyivim.
6. Ma ew bi çi jê dike?
7. Ew bi kêrê jê dike.
8. Ma tu bi kevçî naxwî?
9. Na, ez pê naxwim.
10. Ew bi balafirê diçin ku?
11. Ma ew bi otobozan naçin?
12. Tu namên xwe bi çi dinivîsî?
13. Ez bi tîpnevîsê dinivîsim.
14. Tu jî pê binivîse, pir hêsan e.

1. Don't play with the television! 2. Don't play with it! 3. Azad's son plays a lot of chess. 4. Do you speak Kurdish? 5. No, I speak English. 6. With what is he/she cutting? 7. He/she is cutting with the knife. 8. Are you not eating with the spoon? 9. No, I am not eating with it. 10. Where are they going by aeroplane? 11. Are they not going by buses? 12. With what are you writing your letters? 13. I am writing with the typewriter. 14. You too write with it, it is very easy.

bi with, by (when something is used)
bi...re with, together (in the company or presence of sb/sth, having or carrying sb/sth).

1. Mizgîn bi kê re dilîze?
2. Ew bi Rojda re dilîze.

3. Ma bavê wî pê re nalîze?
4. Na, ew bi Dara re dilîze.
5. Kurê min, bi Silo re nepeyive, ew ne baş e.
6. Ez bi Delalê re ders dixebitim. Tu bi kê re dixebitî?
7. Ez bi keşî re naxebitim. Ez bi tenê dixebitim.
8. Ma Serdar ne cîranê te ye?
9. Belê, bes ez pê re naxebitim.

1. With whom is Mizgîn playing? 2. He is playing with Rojda. 3. Is his father not playing with him? 4. No, he is playing with Dara. 5. My son, don't talk to Silo, he is not good. 6. I am studying with Delal. With whom are you studying? 7. I don't study with anybody. I study on my own (alone). 8. Is Serdar not your neighbour? 9. Yes, but I don't study with him.

1. Ma tu hevokan li ku dinivîsî?
2. Ez li lînûskê dinivîsim.
3. Ez lê nanivîsim.
4. Tu li ku direvî?
5. Ez li bexçe direvim.
6. Hun li ku dijîn?
7. Em li Diyarbekirê dijîn.

1. Where do you write the sentences? 2. I write (them) on the notebook. 3. I don't write on it. 4. Where do you run? 5. I run in the garden. 6. Where do you live? 7. We live in Diyarbekir.

borîn (to pass) also means **to forgive/excuse** when being used with **lê**.

Li wî bibore, ew nizane? Excuse him, he doesn't know.
Lê bibore, ew piçûk e. Excuse him/her, he/she is small (young).

Bibore! Excuse me!
Biborin! Excuse me!

Nêrîn also means **to look after, to take care of** when used with **lê**.

Note that the infinitive of **nêrîn** is also spelt as **nihêrtin** or **nihêrîn** in some regions. The imperative is **binihêre** in both cases.

- Tu li çi dinêrî?** What are you looking at.
Ez li wî zilamî dinêrim. I am looking at that man.
Lê nenêre, diqehire. Don't look at him, he is getting angry.
Kî li zarokan dinêre? Who is looking after the children.
Xaltîka wan li wan dinêre. Their aunt is looking after them.

Bûn can also mean **to become, to get**. The imperative is **bibe**, as **to become**, and **be** as **to be**.

| bûn (be) | | bûn (bibe) | |
|---------------|--------------|------------------|-------------------|
| Ez im | I am | Ez dibim | I become |
| Tu yî | You are | Tu dibî | You become |
| Ew e | He/she/it is | Ew dibe | He/she/it becomes |
| Em in | We are | Em dibin | We become |
| Hun in | You are | Hun dibin | You become |
| Ew in | They are | Ew dibin | They become |

- Tu qelew dibî.** You are becoming/getting fat.
Av her diçe sar dibe. The water is getting colder and colder.
Ma Zelaî lawaz dibe? Is Zelaî getting thin?
Hesen zû dirêj dibe. Hasan is quickly getting tall.
Ew dewlemend dibin. They become rich.

Note that when used with a noun, the noun is placed after the verb.

- Îsal ez dibim mamoste.** I am becoming a teacher this year.
Ma tu nabî polîs? Are you not becoming a policeman?

Kirin + adjective can be used to create compound verbs.

- baş kirin** to improve, to cure, to make (sth) right
reş kirin to darken, blacken
kin kirin to shorten
xizan kirin to impoverish

Note that when used with a noun, the noun is placed after the verb.

Min bikin muxtar! Make me the muxtar!

hatin (bihê)/to come is mostly used in a contracted form.

| HATIN | | |
|------------------|---------------|---------------------------|
| (bihê) | (bê) | |
| Ez dihêm | têm | I come/am coming |
| Tu dihê | tê(yî) | You come/are coming |
| Ew dihê | tê | He/she/it comes/is coming |
| Em dihên | tên | We come/are coming |
| Hun dihên | tên | You come/are coming |
| Ew dihên | tên | They come/are coming |

The contracted negative imperative is **neyê** (or **nê**) and the negative present is:

- Ez nayêm.** **Em nayên.**
Tu nayê. **Hun nayên.**
Ew nayê. **Ew nayên.**

Yê ku sîr nexwe, bêhn ji dev nayê.
Rovî digere, tê dora mirîşkan.

sîr (f) garlic bêhn (f) smell dev (m) mouth rovî fox
dor surroundings gerîn (bigere) walk/travel/roam around

The verb **werîn** (were) also means **to come**. This verb does not have a present and past indicative.

Rindîyê bike bila rindî were pêşîya te.

pêşî (f) front rindî (f) favour, goodness

herîn (here) also means to go, it cannot be used in the past tense.

Nere! Don't go!

Nerin! Don't go!

Ez diherim. I go/am going.

Em diherin.

Tu diherî.

Hun diherin.

Ew dihere.

Ew diherin.

çûn (biçe) is regular and used in all tenses.

Biçe! Go!

Neçe! Don't go!

Ez diçim. I go/am going.

Em diçin.

Tu diçî.

Hun diçin.

Ew diçe.

Ew diçin.

COMPOUND VERBS WITH PREVERBALS

There are a number of Kurdish compound verbs with non-verbal prefixes. These act as preverbals and can change the meaning of the verb.

ra-:

rabûn

to get up, to stand up

raketin

to sleep

rakirin

to lift, to raise

ji xew rabûn

to wake up

ji xew rakirin

to wake (sb.) up

da-:

daketin to come/go down

ve-:

vebûn to be opened, to open

vekirin to open (sth.)

vexwarin to drink

veketin to lie (down)

Kurdish has a series of such preverbals. We will deal with the rest in the following sections.

The Imperative of such compounds verbs does not use the prefix **bi-**, the preverbal element being used instead.

infinitive

imperative

rabûn

rabe

raketin

rakeve

rakirin

rake

vebûn

vebe

vekirin

veke

vexwarin

vexwe

veketin

vekeve

The present indicative prefix is placed between the **preverbal** and the **present stem***.

Ew derî vedike.

He is opening the door.

Ew derî venake.

He is not opening the door.

Em dereng radikevin.

We sleep late.

*) In some regions one may find that the prefixes **di-** and **na-** have moved to the front of the **preverbal** (**Ez divexwim/navexwim**).

1. Rabe, mamoste tê.
2. Ez sibehîni zû radîbim.
3. Ma tu dereng ji xew radîbî?
4. Bi rastî, ez ji xew ranabim, dêya min min ji xew radîke.
5. Wê kêrê ji erdê rake!
6. Ez herşev seet di 12:00-an de radîkevîm.
7. Em pir ranakevin.
8. Ji darê dakeve!
9. Ez çay venaxwim, lê pir qehwe vedixwim.
10. Kurê Ūso araqê vedixwe.
11. Derî veke!
12. Ev pace baş venabe.
13. Tu çi vedîkevî, rabe biçe kar!

1. Stand up, the teacher is coming. 2. I get up early in the morning. 3. Do you wake up late? 4. Actually, I don't wake up, my mother wakes me up. 5. Pick that knife up. 6. I go to sleep at 12:00 every night. 7. We don't sleep much. 8. Climb down the tree! 9. I don't drink tea, but I drink a lot of coffee. 10. Uso's son drinks raki (arrack). 11. Open the door! 12. This window does not open well. 13. What are you doing lying (down there), get up (and) go to work!

MEHÊN SALÊ THE CALENDAR MONTHS

| | | | |
|---------------------|----------|---------------------|-----------|
| Çileyê Paşîn | January | Tebax | August |
| Sibat | February | Îlon | September |
| Adar | March | Çiriya Pêşîn | October |
| Nîsan | April | Coşmeh | October |
| Gulan | May | Çiriya Paşîn | November |
| Hezîran | June | Mijdar | November |
| Tîrmeh | July | Çileyê Pêşîn | December |

There are more than 100 names for the calendar months, those listed above are the most common.* They are all **feminine**.

| | |
|--------------------------------|-------------------------------------|
| di Sibatê de | in February |
| di meha Gulanê de | in May |
| di Çileyê Paşîn de | in January |
| Îro çendê mehê ye? | What is the date? |
| Îro 3'ê mehê ye. | It is the 3rd. |
| Îro 10'ê mehê ye. | It is the 10th. |
| Îro 20'ê meha Adarê ye. | It is the 20th of March. |
| Îro 15'ê meha 12'an e. | It is the 15th of the 12th (month). |
| di 8'ê meha 9'an de | on the 8th of the 9th (month) |
| di 11'ê Îlonê de | on the 11th of September |


ROJÊN HEFTÊ THE DAYS OF THE WEEK

| | | | |
|------------------|----------|-------------------|-----------|
| Şemî | Saturday | Çarşem(b) | Wednesday |
| Yekşem(b) | Sunday | Pêncşem(b) | Thursday |
| Duşem(b) | Monday | Înî | Friday |
| Sêşem(b) | Tuesday | | |

They are all feminine.

| | |
|--|-------------------------|
| roja Yekşemê | (on) Sunday |
| Îro çi ye? | What day is it (today)? |
| Îro Înî ye. | It is Friday. |
| Hun roja Yekşemê çi dikin? | |
| Em diçin sînemayê. | |
| Tu rojên Înîyê çi dikî? | |
| Ez rojên Înîyê tiştêkî nakim. | |
| Ew rojên Yekşemê dereng ji xew radibin. | |

*) The Kurdish Institute in Istanbul has decided to use the names of the months used in South Kurdistan: **Rêbendan (January), Reşemî, Adar, Avrêl, Gulan, Pûşper, Tîrmeh, Gelawêj, Rezber, Kewçêr, Sermawez, Berfanbar.**



biharî in (the) spring
 payîzî in (the) autumn
 havînî in (the) summer
 zivistanî in (the) winter

Ez biharî diçim gund.

Ma hun zivistanî çi dikin?

Ma ew payîzî dixebitin?

Ma Silo diçe gund?

Ew havînî tê bajêr.

Em zivistanî kar nakin.

Erê, dixebitin.

Erê, havînî diçe.

**Bihar hat, rûmeta kincê zivistanê hilat.
 Dewê payîzê, bide ezîzê; dewê biharan, bide neyaran.
 Zarê xweş bihara dilan e.**

dew (m) watered down yoghurt
 dil (m) heart

neyar enemy
 zar (m) language

FERHENGOK

Almanî (f) German (lang.)
 avjenî (f) swimming
 bi avjenî lîstin, avjenî kirin vt to swim
 bawer kirin vi to believe
 berê ago, first; formerly
 betilandin (bibetilîne) vt to tire
 betilî tired
 betilîn (bibetile) vi to get tired
 bêrî (ya yekî) kirin vt to miss
 bijûnî (f) health
 (bi) ku de where to
 birk, berk (f) pool
 car (f) time (as in first time)
 cardin again
 carina(n) sometimes
 çend caran how many times;
 few times
 çima why
 çiqas how (much)
 çû, çûyî last, gone
 ders (f) lesson, studying
 derya (f) sea
 dest pê kirin vi to begin, to start
 ducar kirin vi to repeat
 duh, do(h) yesterday
 dûre later, then
 ewqas that much
 guhdarî kirin vt to listen
 henek (f) joke

henek kirin vt make (a) joke
 her tim always
 hevok (f) sentence
 hîn bûn vi to learn
 hîn kirin vt to teach
 Îngilîzî (f) English (lang.)
 jê hez kirin vt to love, to like
 ji ber ku because
 ji tune de at least
 kengî when
 ketin nav nivînan vi to go to bed
 kîjan, kîjîk which
 Kurdî (f) Kurdish (lang.)
 malbat (f) family
 meşîn (bimeşe) vi to walk
 metre (f) metre
 mêze kirin vt to look, to watch
 par last year
 pevre together
 peya on foot
 peya bûn vi to get off, to dismount
 peyvîk (f) word
 pêr the day before yesterday
 pirîcar often, usually
 piştî after
 por (m) hair (on the head)
 qedandin (biqedîne) vt to finish,
 to complete
 qedîn (biqede) vi to be finished,
 to be completed

qehirîn (biqehire) *vi* to get angry
rawestan (raweste) *vi* to stop
rê (f) way, road
rî (f) beard
santîm (f) centimetre
sekinîn (bisekine) *vi* to stop
seknok (f) bus-stop, stop
sipas thanks
sipas(i) xweş you are welcome,
 my pleasure
sipas kirin *vt* to thank

siwarbûn to get on, to mount
sînema (f) cinema
sûk (f) shopping centre, market
tim always
Tirkî (f) Turkish (lang.)
vir, vira here, this place
wanî so, like this
wir, wira there, that place
xêr (f) goodness, favour, alms
xwarinxane (f) restaurant
xwe oneself, own

Indirect objects (places, etc.) of verbs like **meşîn, revîn, çûn, hatin, etc.** are placed right after the verbs and in the oblique case. Therefore no preposition, such as 'to' in English which means in the direction of, is needed.

1. Ez êvarî ji vir dimeşim malê.
2. Ma tu direvî ku/kuderê?
3. Ew diçin malê.
4. Ma Soro jî tê bajêr?
5. Na, ew nayê.
6. Ma tu çima tê vir?
7. Em havînî diçin gundan.
8. Tu çima ewqas pir têyî gund?
9. Ji ber ku ez bêrîya we dikim.
10. Ew pirîcar bi otobozê diçin malê, lê carinan jî dimeşin.

1. In the evening I walk home from here. 2. Where are you running to? 3. They are going home. 4. Is Soro also coming to the city? 5. No, he is not coming. 6. Why are you coming here? 7. In summer we go to the villages. 8. Why do you come to the village so often? 9. Because I miss you (plural). 10. They often go home by bus, but sometimes they also walk.

zanîn is negated with the prefix **ni-** instead of **na-**.
Ma tu bi Îngîlîzî nizanî? Don't you speak English?
Na, ez nizanim. No, I don't..

hîn bûn (to learn) and **hîn kirin** (to teach) are normally used with the preposition **bi**:

Azad bi Almanî hîn dibe. Azad is learning German.
Ma hun bi çi hîn dibin? What are you learning?
Ez wî bi Kurdî hîn dikim. I am teaching him Kurdish.

The suffix **-î** can also be used, making **bi** unnecessary.

Ma ew hînî Kurdî dibin? Do they learn Kurdish?
Erê, ew hînî Kurdî dibin. Yes, they learn Kurdish.
Mamoste min hînî Îngîlîzî dike/The teacher is teaching me English.

kîjan (which) gets the appropriate oblique ending, when used as a pronoun.

1. **Ma tu pirtûkê dixwazî?**
Ma tu kîjan pirtûkê dixwazî?
Ma tu kîjanê dixwazî?
2. **Tu wî zilamî dibînî?**
Tu kîjan zilamî dibînî?
Tu kîjanî dibînî?
3. **Hun kovaran dixwînin?**
Hun kîjan kovaran dixwînin?
Hun kîjanan dixwînin?
4. **Di malê de**
Di kîjan malê de
Di kîjanê de?
5. **Di gund de**
Di kîjan gundî de
Di kîjanî de?

- | | |
|--|---|
| 1. Do you want the book? Which book do you want? Which (one) do you want? | 4. In the house In which house In which (one)? |
| 2. Do (can) you see that man? Which man do you see? Which (one) do you see? | 5. In the village In which village? In which (one)? |
| 3. Are you reading the magazines? Which magazines are you reading? Which (ones) are you reading? | |

There is only one form of the Present Tense in Kurdish. It is used for both Present Simple and Present Continuous, and may also be used for the Near Future, where context and adverbs help to distinguish between them. You will find different usages in the following sentences.

1. **Ez her tim seet di 9:00'an de taştê dixwim.**
2. **Ma hun firavînê seet di çendan de dixwin?**
3. **Em pirîcar firavînê naxwin, lê belê em her êvar seet di 7:00'an de şîvê dixwin.**
4. **Tu ji kîjan zimanî pir hez dikî?**
5. **Ez bi Tirkî baştir dizanim, lê ji Kurdî pirtir hez dikim.**
6. **Lê ez dizanim, tu ji Almanî hez dikî.**
7. **Ew piştî dersê peyvik û hevokan ducar dikin.**
8. **Ma hun şîvê li malê dixwin?**
9. **Belê, lê em carinan diçin xwarinxanê.**
10. **Mizgîn pir bi avjenî dilîze.**
11. **Li ku?**
12. **Pirîcar di birkê de, carinan jî di deryayê de.**
13. **Hun mehê çend caran wî dibînin?**
14. **Tenê carekê.**
15. **Dersa Kurdî seet di çendan de dest pê dike?**
16. **Dersa Kurdî seet di 6:30'an de dest pê dike, di 8:30'an de diqedê.**
17. **Ma bavê te pirtûkê kengî diqedîne?**
18. **Ranewestî, bixebitî!**

19. **Ma tu nabîni, em betilî ne.**
20. **Hun pir zû dibetilin.**
21. **Ew kengî direvin?**
22. **Ew bişev direvin.**
23. **Mamoste dipeyve, lê hin xwendekar guhdarî nakin.**
24. **Azad li mamosteyê guhdarî dike.**
25. **Ez pir bêrîya dê û bavê xwe dikim.**
26. **Hun seet di çendan de dikevin nav nivînan?**
27. **Em pirîcar seet di 12:00'an de dikevin nav nivînan.**
28. **Bişev nere, biro here!**
29. **Ew çi dixwazin?**
30. **Ew azadîyê dixwazin.**

1. I always have breakfast at 9:00. 2. At what time do you have lunch? 3. We usually don't have lunch, but we have dinner at 7:00 every evening. 4. Which language do you like very much? 5. I speak Turkish better, but I like Kurdish more. 6. But I know, you like German. 7. They repeat words and sentences after the class. 8. Do you have dinner at home? 9. Yes, but we go to the restaurant sometimes. 10. Mizgîn swims a lot. 11. Where? 12. Usually in the pool, but sometimes also in the sea. 13. How many times a month do you see him? 14. Only once. 15. What time does the Kurdish class start? 16. The Kurdish class starts at 6:30 (and) ends at 8:30. 17. When is your father going to finish the book? 18. Don't stop, work! 19. Don't (can't) you see, we are tired. 20. You get tired very quickly. 21. When do they run? 22. They run in the evening. 23. The teacher is speaking, but some students aren't listening. 24. Azad is listening to the teacher. 25. I miss my parents very much. 26. What time do you go to bed? 27. We usually go to bed at 12:00. 28. Don't go at night, go by day! 29. What do they want? 30. They want freedom.

The reflexive pronoun **xwe** (oneself, self) shows that the action of the verb is performed on its subject, in other words, when the subject is affected by the action. Unlike English, the same word is used for all the persons.

- | | |
|----------------------------|-----------------------------|
| Ez xwe dibînim. | I (can) see myself. |
| Tu xwe dibîni. | You (can) see yourself. |
| Ew ji xwe direve. | He is running from himself. |
| Ji xwe bipirsin. | Ask yourselves. |
| Ew xwe dibetilînin. | They tire themselves. |

xwe is also used in the possessive case, when the action is performed on something that belongs to the subject.

- a) Tu diçî mala min. You are going to my home.
 b) Ez diçim mala xwe. I am going to my home.
- a) Ew ji bavê te re dibêje. He is telling your father.
 b) Ew ji bavê xwe re dibêje. He is telling his father.
- a) Şervan pênûsa we dixwaze. Şervan wants your pen.
 b) Şervan pênûsa xwe dixwaze. Şervan wants his pen.
- a) Em navên we dinivîsin. We are writing your names.
 b) Em navên xwe dinivîsin. We write our names.
- a) Ma tu ya min dixwazî? Do you want mine?
 b) Ma tu ya xwe dixwazî? Do you want yours?
- a) Ez ên te naxwazim. I don't want (those of) yours.
 b) Ez ên xwe dixwazim. I want mine.

Zarokê bêdê navika xwe bi xwe jêdike.
Dînik ji dînikan û îmam ji meytan hez dike.
Gur ji roja mij hez dike.

bêdê motherless bi xwe by oneself gur wolf mij (m) mist, fog
 meyt (m) corpse dînik mad jêkirin to cut navik (f) umbilical cord




DÎYALOG 1

- Bibore, agirê te heye?
- Na, ez cixare nakişînim. Lê baştir e, tu jî nekişîne. Ma tu nizanî cixare ne baş e?
- Belê ez zanîm, lê cardin jî bi şev û roj dikişînim.
- Ji tune de pir nekişîne.
- Çi bikim, ez nikanîm bi xwe.


DÎYALOG 2

- Ş: Bawer, tu çawa yî?
 B: Baş im, sipas dikim.
 Ş: Ma tu bi qasî min dirêj î?
 B: Bi qasî min çî ye' Ma tu nizanî ez ji te dirêjtir im?
 Ş: Çima, tu çiqas dirêj î?
 B: Ez metreyek û heştê santîm im.
 Ş: Ez jî metreyek û heştê û du santîm im. Tu du santîman ji min kintir î.
 B: Tu ewqas ne dirêj î, ez ji te bawer nakim!
 Ş: Neqehire! Ez henekan dikim!



DÎYALOG 3

- Bibore, tu bi Îngîlîzî dizanî?
- Çenekî, xêr e?
- Ez dixwazim herim Minara Çarpê, lê ez nizanîm ez ê çawa herim.
- Li vê seknokê, li obozê siwar bibe. Li seknoka çaran peya bibe. Navê taxê bi Tirkî Balıkcılar Başı ye. Li wir bipirse.
- Gelek sipas.
- Sipasî xweş.



DÎYALOG 4

- Tu li ku dijî?
- Mala min li Îzmîrê ye. Lê ez pir tîm Îstembolê.
- Tu çima pir tîyî Îstembolê?
- Karê min wanî dixwaze.
- Tu mehê çend caran tî Îstembolê?
- Du caran. Û jî du mehan carekê jî diçim Diyarbekirê.
- Çima?
- Dê û bavê min li wira dijîn.
- Qey tu pir bêrîya wan dikî?
- Erê, pir.



HÎNDARÎ I I

A: Nivîsara jêrîn wergerînin Kurdî
Translate the following text into Kurdish.

Malbata Min - My family

4 people live in our home: My father, my mother, my sister and I. We wake up at 8:55 in the morning. Breakfast is at 9:15. We usually drink tea. My father always go to work at 9:30. My mother sometimes does the housework, and sometimes goes to the shopping centre. In the evening, my father comes home at 6:00 or 7:00. We have dinner (all) together. My father smokes a cigarette; he sometimes reads a book, and sometimes writes a letter to my uncle. My mother reads a newspaper. I study or talk and joke with my sister, Zela. We also often watch TV.

B: 7 hevokên çewt bibînin.
Find the 7 incorrect sentences.


1. Ez havînî pirîcar diçî gund.
2. Hun carinan tî bajêr.
3. Ew bi wê hez dike.
4. Hun di me dipirsîn.
5. Baş li xwe binêre!
6. Ev kur çî dixwaze?
7. Ew henekan jî me dikin.
8. Em peyvikan bi ducar dikin.
9. Hun me pir dibetilînin.
10. Ew kengî direvîn?
11. Bavê min jî ez pir diqehire.
12. Ez jî keça xwe pir hez dikim.
13. Delal zû dikeve nav nivînan.
14. Hun bi ku dilîzîn?
15. Ji tune de bavê xwe bibîne!

C: Cihên vala tije bikin.

1. Li seknok... sêyem peya bibe.
2. Em pir dixebit.....
3. Ev çend car e tu dipirs...?
4. Ew pir ... me dinêrin.
5. Em seet di 7:00-an de dest ... dersê dikin.
6. Ma hun kengî dersê diqedî...?
7. Tu salê ... caran diçî bajêr?
8. Tu bêrî... kê dikî?
9. Hozan çima direv... xwarinxanê?
10. Ma hun peyvikan ... lînûskê an ... kaxezekê dinivîsin?

JI ZARGOTINA KURDAN

Teyrê Welathez



Nêçirvanek rojekê diçe nêçîrê. Li kêleka çem rûdine, di avê de teyrêkî bedew dibîne. Teyr tîne malê. Jê re qefeseke baş çêdike û xwarinên herî xweş dide ber. Lê cardin jî, teyr her tim dibêje:


- Ax welat! Ax welat!

Nêçirvan teyr dibe, davêje çem. Teyr dibêje:

- O xweş welat! O xweş welat!

| | | |
|-------------------------------------|----------------------------------|---------------------------------------|
| anîn (bîne) vt to bring | nêçîr (f) hunt, hunting | welat (m) mother-land, country |
| avêtin (bavêje) vt to throw | nêçîrvan hunter | welathez patriotic |
| birin (bibe) vt to take (to) | rûniştin (rûne) vt to sit | zargotin (f) folklore |
| çêkirin (çêke) vt to make | teyr bird | |

Vî Mastî Hîn di Şirtîya Xwe de Devê Min Şewitandiye*



Mêrik dibe mêvanê malekê. Kevaniya malê şivê datîne ber mêvanê xwe; nan, penêr, to, mast... Xwedê çi kiribe qismet. Mêrik tasa mêst dikişîne ber xwe û pif dikê. Kevanî, metelmayî:

- Keko, tu çima pifî mêst dikî? Ma mast tucarî germ dibe ku tu sar bikî?

- Xwişkê, tu nizanî, vî mastî hîn di şirtîya xwe de devê min şewitandiye.

kevanî (f) housewife
danîn (dîne, deyne) vt to put/lay (down)
kek (f) elder brother
ku that
metelmayî tongue-tied, confused

pif kirin vt to blow
tas (f) bowl
tucarî never, ever
Xwedê çi kiribe qismet
 What ever available

(*) This yoghurt burnt my mouth, while it was still milk

Berê darê, darê dixemilîne.
 Hesp siwarê xwe nas dike.
 Qala guran dikan gur hazir in.
 Bi dilopên baranê behr tijî nabe.
 Birûyê min şeh dike, lê çavê min derdixe.
 Ez yekî dibêjim, tembûla min yekî dibêje.
 Meriv di agirê dostan de naşewite.
 Bi lezê meriv dereng dimîne.
 Bira ji hev cihê dibin, heval ji hev cihê nabin.
 Ewrê bi giregir baran jê nayê.
 Meriv bi pirsê diçe Qursê.
 Mêvanê bêwext ji kîsê xwe dixwe.
 Ne dixwe ne dide hevalan, genî dike û davêje.
 Dost qencîyê ji bîr nake, dijmin xerabîyê.
 Keda gê ga naxwe.
 Ji her ewrî baran nayê.

TIŞTANOK

Vedikim naçe,
 Girêdidim diçe,
 Ew çi ye?



| | |
|--|---|
| baran (f) rain | man (himîne) <i>vi</i> to stay, to remain |
| behr (f) sea | nas kirin <i>vi</i> to recognize, to know |
| ber (m) fruit | qal kirin <i>vi</i> to mention |
| birû (m) eyebrow | qencî (f) goodness, favour |
| cihê bûn <i>vi</i> to separate | siwar horseman, mounted |
| derxistin (derxîne) <i>vi</i> to take/bring out | sol (f) shoes |
| dijmin (m) enemy | şeh (m) comb |
| dilop (f) drop | şewitîn (bişewite) <i>vi</i> to be burnt |
| ewr (m) cloud | vekirin (veke) <i>vi</i> to open, to untie |
| ga (m) ox | wext (f) time |
| genî stinking | xemilandin (bixemilîne) <i>vi</i> to adorn, to deck out |
| girê dan (girê bide) <i>vi</i> to tie, to fasten | xerabî (f) badness |
| gîgir noise, thunder | |
| gur wolf | |
| ji hev from one another | |
| ked (f) labour | |
| kîs (m) bag | |
| lez (f) speed | |

RAWEYA BANEŞANÎ VOCATIVE CASE

The **vocative** is a special form of the noun used when addressing or calling a person or a thing. In English, the vocative is not common, it might be **Hey!**, **Hey you!**, **O!**, etc. In Kurdish, the vocative is very common. Names and nouns require an ending in the vocative case. The endings differ according to gender and plurality.

| | | |
|----------|--|-----------|
| -o | (yo after a vowel) | masculine |
| -ê | (yê after a vowel) | feminine |
| -ino, no | plural (i is mostly elided (left out) after a vowel, it is frequently not pronounced even after a consonant) | |

| | |
|-----------------|------------------|
| Xorto! | Hey/O young man! |
| Keçê! | Hey/O girl! |
| Keçino! | Hey/O girls! |
| Xortino! | Hey/O young men! |
| Xwişkê! | Hey/O sister! |
| Birayo | Hey/O brother! |
| Birano | Hey/O brothers! |


There are also interjections which might be used either as a particle to strengthen a vocative or without a noun.

| | |
|-----------|----------------------------|
| lê | Hey! (feminine) |
| lo | Hey! (masculine or plural) |

| | |
|--------------------|-----------------|
| Lê xwişkê! | Hey, sister! |
| Lo xorto! | Hey, young man! |
| Lo xortino! | Hey, young men! |

lê and **lo** are frequently used in folk songs, usually connoting sadness or joy.

gelî is used when addressing a crowd, or a large number of



people gathered together, such as spectators, audience, etc. (it cannot be used separately and the noun receives the oblique plural ending **-an**)

Gelî hevalan! (Dear) friends!

The vocative endings may also be added to names.

Azado! Hey, Azad!

Zelalê! Hey, Zela!

Evînê! Evin! Hey, Evin!

Lo Mizgîno! Mizgîn! Hey, Mizgîn!

Lê Delalê! Delal! Hey, Delal!

Putting proper names in the vocative has led to many names ending in **ê** or **o**.

Boys' names: Biro, Misto, Soro, Ūso, Heso, Beko

Girls' names: Gulê, Zînê, Fatê, Eyšê, Xecê, Berfê

Bêmalo; bêxaltî, bêxalo.

Bimalo; bixaltî, bixalo.

Çêlekê didoşe Xatê, to didin Fatê.

| | |
|------------------------------------|---|
| bê without | mal (m) property, possessions, goods |
| xaltî (f) aunt | xal (m) uncle bi with |
| doşin (bidoşe) (vt) to milk | çêlek (f) cow |

Baneşan, Xwezî, Nifir Interjections, Wishes, Curses

Aferîn! Well done!, Bravo!
Ax! Ah! Ouh! Ouch!
Ax li min! Poor me!
Ax li min ezo! Woe is me!
Bira! Really?
Bijî! Long live! Well done!
Biv!, biv e! Don't! (addressed to a child to warn against sth. hot)
De! Come on! (making stress on the imperative, encouragement)
De bimeşe lo! Come on, walk!!
Destê te neêşe! May your hand never hurt!
Erik!, Herik! How amazing!
Êvar baş/xweş! Good evening!
Her bijî! Long live! Well done!
Hey! Hey!
Hey lo! Hey lo lo!
Hey lê! Hey lê lê!
Heyf! What a pity!
Heyf e! It is a pity!
Heyfa te! What a pity for you!
Hustê te bişikê! May your neck be broken!
Malava! Bravo! Well done! Thanks!
Mala te ava! Thank you! May your home be prosperous!
Ya te jî! Yours too!
Malxerabo! May your home be ruined!

Ox! Oh!
Oxir be! (Oxira te/we a xêrê be!) Have a good journey! Good bye!
Pix! Bo! Boh!
Qafilqeda li wan keve! May calamity befall them!
Rêya te/we vekirîbe! Have a good journey! (May your road be open!)
Roj baş/xweş! Good day!
Roja te/we xweş! Good day! Have a good day!
Ya te/we jî! You too!
Sehet be! May you enjoy good health! (said to sb. who has just had a bath, haircut, shave, etc.)
Şev baş/xweş! Good night!
Şeva te/we xweş! Good night! Have a good night!
Ya te/we jî! You too!
Şeva te/we bimîne xweş! Have a good night! (When leaving)
Tew!, Tew tew! expressing liking and admiration, especially when sb. is singing.
Tif!, Tifi!, Tifû! Spit on you!
Wax! Alas! What a pity!
Wax li min! Woe is me!
Way! Oh! (expressing surprise)
Wey! Oh! (expressing surprise)
Xwedê ji te razî be! May God be pleased with you!
Xwedê te bihêle! God bless you!
Xwedêyo! Oh God!
Ya! O! Oh!

LÊKERÊN GERANDÎ - NEGERANDÎ TRANSITIVE - INTRANSITIVE VERBS

A **transitive verb** is a verb that is used with a direct object, such as **to break, to throw, to make, to cut**, etc.

An **intransitive verb** is a verb that does not require a direct object, such as **to go, to run, to walk, to sleep, to be**, etc.

Unlike English verbs, Kurdish verbs are either **transitive** or **intransitive**. It is very important to distinguish between transitive and intransitive verbs, as in the past tenses they use different pronouns as the subject. This is why Kurdish dictionaries and grammar books indicate if a verb is transitive or intransitive. In this book *vt* is used to indicate that a verb is transitive, while *vi* indicates that a verb is intransitive.

It would therefore be helpful to review the two groups of Kurdish pronouns (**simple/direct** and **oblique**), before looking at the past tenses.

1st Group (simple - in direct case)

| <u>Personal Pronouns</u> | <u>Demonstrative Pronouns</u> | <u>Nouns</u> |
|--------------------------|-------------------------------|---------------------------|
| Ez I | Ev This; These | No endings |
| Tu You | Ew That; Those | Azad, Zelal, Karker, etc. |
| Ew He/She/It | | |
| Em We | | |
| Hun You | | |
| Ew They | | |

2nd Group (oblique)

| <u>Personal Pronouns</u> | <u>Demonstrative Pronouns</u> | <u>Nouns</u> |
|--------------------------|-------------------------------|--------------------|
| Min I | Vi This (masc.) | Zelalê |
| Te You | Vê This (fem.) | Azad(î) |
| Wi He | Wî That (masc.) | Karkeran (workers) |
| Wê She | Wê That (fem.) | |
| Me We | Van These | |
| We You | Wan Those | |
| Wan They | | |

The subject of a **transitive verb** is in the oblique case in the past tenses.

The subject of an **intransitive verb** is in the direct case (simple) in all tenses.

Note that if the subject is in the oblique case, then the direct object should be in the direct case, and vice versa.

DEMA BORÎYA TÊDAYÎ SIMPLE PAST TENSE

A: Intransitive Verbs - Lêkerên Negerandî

As we said above, the subject of such verbs is in the direct case (simple), and they do not require a direct object.

The **past stem** is obtained by dropping the **-in** or **-n** of the infinitive.

The **past stem** of an intransitive verb is used for the third singular person (**ew**), and the appropriate **bûn**/to be suffix (**im, î, in**) is added for the rest.

| infinitive | past stem |
|----------------|-----------|
| <u>ketin</u> | ket |
| <u>çûn</u> | çû |
| <u>hatin</u> | hat |
| <u>revîn</u> | revî |
| <u>meşîn</u> | meşî |
| <u>bûn</u> | bû |
| <u>xebitîn</u> | xebitî |
| <u>qehirîn</u> | qehirî |
| <u>betilîn</u> | betilî |
| <u>qedîn</u> | qedî |

| | | | |
|------------------|----------------|------------------|----------------|
| <u>ketin</u> | to fall | <u>hatin</u> | to come |
| Ez ketim | I fell | Ez hatim | I came |
| Tu ketî | You fell | Tu hatî | You came |
| Ew ket | He/she/it fell | Ew hat | He/she/it came |
| Em ketin | We fell | Em hatin | We came |
| Hun ketin | You fell | Hun hatin | You came |
| Ew ketin | They fell | Ew hatin | They came |

-ne negates the verb.

| | |
|---------------------|-------------------|
| Ez neketim. | I did not fall. |
| Ew nehat. | He did not come. |
| Hun nehatin. | You did not come. |

As in the present tense, if the past stem ends in a vowel, the first vowel of **bûn** suffixes is dropped: **-im, î, in**. In some regions a **y** is added between the stem and the suffix: **yî**. However, even in those regions, **y** is not used for the stem ending in **î**.

| | | | |
|------------------|---------------|------------------|----------------|
| <u>revîn</u> | to run | <u>çûn</u> | to go |
| Ez revîm | I ran | Ez çûm | I went |
| Tu revî | You ran | Tu çû(yî) | You went |
| Ew revî | He/she/it ran | Ew çû | He/she/it went |
| Em revîn | We ran | Em çûn | We went |
| Hun revîn | You ran | Hun çûn | You went |
| Ew revîn | They ran | Ew çûn | They went |

| | | | |
|------------------------|------------------|-------------------------------|--------------------|
| <u>meşîn</u> (to walk) | | <u>qehirîn</u> (to get angry) | |
| Ez meşîm | Em meşîn | Ez qehirîm | Em qehirîn |
| Tu meşî | Hun meşîn | Tu qehirî | Hun qehirîn |
| Ew meşî | Ew meşîn | Ew qehirî | Ew qehirîn |

| | | | |
|---------------------------|----------------|-------------------------------|--------------------|
| <u>bûn</u> (to be/become) | | <u>betilîn</u> (to get tired) | |
| Ez bûm | Em bûn | Ez betilîm | Em betilîn |
| Tu bû(yî) | Hun bûn | Tu betilî | Hun betilîn |
| Ew bû | Ew bûn | Ew betilî | Ew betilîn |

| | | | |
|--------------------------|--------------------|-------------------------------|------------------|
| <u>xebitîn</u> (to work) | | <u>qedîn</u> (to be finished) | |
| Ez xebitîm | Em xebitîn | Ez qedîm | Em qedîn |
| Tu xebitî | Hun xebitîn | Tu qedî | Hun qedîn |
| Ew xebitî | Ew xebitîn | Ew qedî | Ew qedîn |

LÊKERÊN CÊWÎ

Intransitive Kurdish verbs of 2 syllables ending in **-în** have another form of infinitive ending in **-îyan**. In Kurdish we call them **lêkerên cêwî** (twin verbs). Because the past stem is obtained from the infinitive, their past conjugation differs. Such verbs include:

| | |
|------------------|--------------------|
| <u>qedîn</u> | <u>qedîyan</u> |
| Ez qedîm | Ez qedîyam |
| Tu qedî | Tu qedîya |
| Ew qedî | Ew qedîya |
| Em qedîn | Em qedîyan |
| Hun qedîn | Hun qedîyan |
| Ew qedîn | Ew qedîyan |

| | | | |
|--------------|----------------|--------------|----------------|
| <u>meşîn</u> | <u>meşîyan</u> | <u>revîn</u> | <u>revîyan</u> |
| Ez meşîm | Ez meşîyam | Ez revîm | Ez revîyam |
| Tu meşî | Tu meşîya | Tu revî | Tu revîya |
| Ew meşî | Ew meşîya | Ew revî | Ew revîya |
| Em meşîn | Em meşîyan | Em revîn | Em revîyan |
| Hun meşîn | Hun meşîyan | Hun revîn | Hun revîyan |
| Ew meşîn | Ew meşîyan | Ew revîn | Ew revîyan |

A compound verb with an intransitive verbal part is **intransitive**, and the one with a transitive verbal part is **transitive**.

1. Ez ji otobozê peya bûm.
2. Tu pir raket(i).
3. Ew hînî Kurdî bû.
4. Em li balafirê siwar bûn.
5. Azad bû mamoste.
6. Zelal xwendekar bû.
7. Ew duh li xwendegehê bûn.
8. Ew roja Sêşemê li kargehê bû.
9. Ma tu roja Çarşemê li ku bû.
10. Ez li gund bûm.
11. Ma hun kengî bûn mamoste?
12. Em par bûn mamoste.
13. Ma tu kîjan salê bû pîlot?
14. Ez du sal berê bûm pîlot.
15. Ew kengî li vir bûn?
16. Ew du seet berê li vir bûn.
17. Doh kî li malê bû?
18. Doh xweha min li malê bû.
19. Ma tu kengî çuyî malê?
20. Ez hefta çuyî çûm malê.
21. Hun kengî revîyan?
22. Em sibehîni revîyan.

23. Ew kengî hat malê?
24. Ew du meh berê hat malê.
25. Ma tu pir betilî?
26. Erê, ez pir betilîm.
27. Ma tu duh revîya?
28. Na, ez duh nerevîyam.
29. Pirtûk ji masê ket.
30. Ders 10 deqe berê qedîya.
31. 5 kes ji otobozê peya nebûn.
32. 10 kes li otobozê siwar bûn.
33. Şeva çuyî xewa min nehat.
34. Em duh pir dereng ketin nav nivînan.
35. Ma ew hefta çuyî hînî peyvikên nuh bûn?
36. Ew doh seet di 7:00'an de ji xew rabûn.

1. I got off the bus. 2. You slept a lot. 3. He learnt Kurdish. 4. We boarded the plane. 5. Azad became a teacher. 6. Zelal was a student. 7. They were in the school yesterday. 8. He was at the office on Tuesday. 9. Where were you on Wednesday? 10. I was in the village. 11. When did you become teachers? 12. We became teachers last year. 13. What year did you become a pilot. 14. I became a pilot two years ago. 15. When were they here? 16. They were here two hours ago. 17. Who was at home yesterday? 18. My sister was at home yesterday. 19. When did you go home? 20. I went home last week. 21. When did you run? 22. We ran in the morning. 23. When did he/she come home? 24. He/she came home two months ago. 25. Did you get very tired? 26. Yes, I got very tired. 27. Did you run yesterday? 28. No, I did not run yesterday. 29. The book fell off the table. 30. The lesson finished 10 minutes ago. 31. 5 people did not get off the bus. 32. 10 people got on the bus. 33. I could not sleep last night. 34. Yesterday we went to bed very late. 35. Did they learn the new words last week? 36. Yesterday they woke up at 7:00.

B: Transitive Verbs - Lêkerên Gerandî

Transitive verbs are those which require a direct object. In the past tenses their subjects are in **the oblique case**. This means that they use oblique pronouns and nouns with oblique endings as the subject. Because the subject is in the oblique, the object is in the **direct case (simple)**.

The past stem is used for all persons.

kirin (to do)

Min/te/wî/wê/me/we/wan kir. (I/you/he/she/it/we/you/they did.)

| | | | |
|----------------------------|-----------|---------------------------|-----------|
| gotin (to tell/say) | | nêrîn (to look) | |
| Min got. | Me got. | Min nêrî | Me nêrî |
| Te got. | We got. | Te nêrî | We nêrî |
| Wî/wê got. | Wan got. | Wî/wê nêrî | Wan nêrî |
| xwarin (to eat) | | xwastin* (to want) | |
| Min xwar | Me xwar | Min xwast | Me xwast |
| Te xwar | We xwar | Te xwast | We xwast |
| Wî/wê xwar | Wan xwar | Wî/wê xwast | Wan xwast |
| pirsîn (to ask) | | dîtin (to see) | |
| Min pirsî | Me pirsî | Min dît | Me dît |
| Te pirsî | We pirsî | Te dît | We dît |
| Wî/wê pirsî | Wan pirsî | Wî/wê dît | Wan dît |

Before attempting to do the sentences, it would be helpful to keep in mind that the object is in the direct case (simple), and the verb agrees with the object. That means that because we do not inflex the object, we add the appropriate ending to the verb where it is necessary. The verb therefore receives **-in** when the object is plural.

Min ew dît (I saw him/her/it). **Min ew dîtin** (I saw them).

1. Me pirtûk xwend.
2. Me pirtûk xwendin.
3. Wî sêvek xwar.
4. Wî 5 sêv xwarin.
5. Wan ew dît.
6. Wan ew dîtin.
7. Ma we ew nivîsîn?
8. Min mase kişand.
9. Min mase kişandin.

(*) xwastin is also spelled as xwestin, past stem: xwest.

10. Wê çi pirsî?
11. Wê çi pirsîn?
12. Me name nivîsî.
13. Me name nivîsin.
14. Ma wan hevok ducar kir?
15. Ma wan hevok ducar kirin?
16. Min ew hînî Kurdî kir.
17. Min ew hînî Kurdî kirin.

1. We read the book. 2. We read the books. 3. He ate an apple. 4. He ate 5 apples. 5. They saw him/her. 6. They saw them. 7. Did you write them? 8. I pulled the table. 9. I pulled the tables. 10. What did she ask? 11. What (things) did she ask? 12. We wrote the letter. 13. We wrote the letters. 14. Did they repeat the sentence? 15. Did they repeat the sentences? 16. I taught him Kurdish. 17. I taught them Kurdish.

All the verbs ending in **-andin** are transitive.

| | |
|-----------------------------------|---------------------------------|
| Wî xwendekar betiland. | He tired the student. |
| Wî xwendekar betiland <u>in</u> . | He tired the students. |
| Me ders qedand. | We finished the lesson (class). |
| Me ders qedand <u>in</u> . | We finished the lessons. |
| Wan mase kişand. | They pulled the table. |
| Wan mase kişand <u>in</u> . | They pulled the tables. |

A noun gets the appropriate oblique ending, when used as the subject. Nouns used as the object are in the direct case.

| | |
|-------------------------------------|------------------------------|
| Xezalê name xwend. | Xezal read the letter. |
| Azad(i) name nivîsî. | Azad read the letter. |
| Xwendekaran ew betiland <u>in</u> . | The students tired them. |
| Zelalê Azad dît. | Zelal saw Azad. |
| Hesen(i) Zelal dît. | Hesen saw Zelal. |
| Zaroyan sêv xwar <u>in</u> . | The children ate the apples. |
| Bijîşkê got. | The doctor (fem.) said. |
| Bijîşk(i) got. | The doctor (masc.) said. |
| Bijîşkan got. | The doctors said. |

The verb receives **-im**, when the object is **ez** (I/me).

| | |
|-----------------------|-------------|
| Te ez dî <u>tim</u> . | You saw me. |
| Wî ez dî <u>tim</u> . | He saw me. |

Normally the verb receives **î**, when the object is **tu** (you). However this rule is not applied in many regions. It is not applied at all to the past stem ending in **î**.

| | |
|-----------------------|---------------|
| Min tu dît(î). | I saw you. |
| Wan tu dît(î). | They saw you. |
| Wî tu nivîsî. | He wrote you. |

As always, prepositional objects are in the oblique case.

| | |
|------------------------------------|-------------------------------|
| Me ji wan pirsî. | We asked them. |
| Wan bi gogê lîst. | They played ball. |
| Wî ji wê hez kir. | He loved her. |
| Te li min mêze kir. | You watched me. |
| We li me nêrî | You looked at us. |
| Min li wan guhdarî kir. | I listened to them. |
| Zelalê bêrîya we kir. | Zelal missed you. |
| Azad dest bi dersê kir. | Azad started the lesson. |
| Karkeran dest bi kar kirin. | The workers started the work. |

1. **Min êvarî rojname xwend.**
2. **Wî îro seet di 8:00'an de taştê xwar.**
3. **Te ew kengî nivîsî?**
4. **Min ew duh nivîsî.**
5. **Ma we seet di 12:00'an de firavîn xwar?**
6. **Na, me seet di 12:00'an de firavîn nexwar.**
7. **Ma wan seet di çendan de şîv xwar?**
8. **Wan seet di 20:00'an de şîv xwar.**
9. **Dersê kengî dest pê kir?**
10. **30 deqe berê dest pê kir.**
11. **Mamoste kengî dest bi dersê kir?**
12. **Wî du deqe berê dest pê kir.**
13. **Wê hevok li lînûska xwe nivîsîn?**
14. **Belê, wê ew li lînûska xwe nivîsîn.**

1. I read the newspaper in the evening. 2. He had a breakfast at 8.00 today. 3. When did you write it? 4. I wrote it yesterday. 5. Did you have lunch at 12.00? 6. No, we didn't have lunch at 12.00. 7. What time did they have dinner. 8. They had dinner at 20.00. 9. What time did the class start? 10. It started 30 minutes ago. 11. What time did the teacher start the class. 12. He started it 2 minutes ago? 13. Did she write the sentences in her notebook? 14. Yes, she wrote them in her notebook.

FERHENGOK

| | |
|--|--|
| bang (f) call | nuha, niha now |
| boyax (f) paint | pê girtin vt to hold, to grab |
| çêkirin (çêke, çêbike) vt to make, to repair | selik (f) basket |
| dan (bide) vt to give | silab (f) greeting, hello |
| destûr (f) permission | sobe (f) stove |
| girtin (bigire) vt to close, to shut; to turn/switch off; to take, to receive; to catch | stendin (bistîne) vi to get, to receive |
| hewa (f) air, weather | şandin (bişîne) vt to send |
| hewadar airy | şuştin (bişo) vt to wash |
| hewadar kirin vt to air, ventilate | telefon (f) telephone |
| hêkerûn (f) omelette | toz (f) dust |
| hilkişîn (hilkişe) vi to climb up | tu any, none |
| îro today | vala empty |
| îşev tonight | vekirin (veke) vt to open; to turn/switch on |
| îsal this year | vê êvarê this evening |
| kelandin (bikelîne) vt to boil | vê sibê (vêşê) this morning |
| kelîn (bikele) vi to boil, to be boiled | vê heftê this week |
| kirê (f) rent | vê mehê this month |
| kirê kirin vi to rent | vêxistin (vêxe) vt to light |
| kur kirin vt to cut (hair), to shave | wê gavê then, (if) so |
| li cem with, in sb's presence | wêne (m) picture, painting, photo |
| man (bimîne) vi to stay, to remain | xistin (bixe) vt to put, to drop, to let fall |

The indirect object of **dan** (to give) follows the verb in the oblique case.

Min pêûsek da Şevînê. I gave a pen to Şevin.
Te ew da kê? To whom did you give it?
Min da wê. I gave to her.

da and wê/wî may be contracted to **dayê**.

Ma te pirtûk da wê? Did you give the book to her?
Erê, min dayê. Yes, I gave (it) to her.
Ma wî lîstûsk da Şevînê? Did he give the notebook to Şevin?
Erê, dayê. Yes, he gave (it) to her.
Te çi da Azad? What did you give to Azad?
Min dirav dayê. I gave him money.

The verb **telefon kirin** may be used as follows:

Min telefonî wî kir. I phoned him.
Min ji wî re telefon kir. I phoned him.

bang (call) and **kirin** form a compound verb: **bang kirin** (to call), **î** connects **bang** to the indirect object.

We bangî kê kir? Whom did you call?
Me bangî Azad kir. We called Azad.
Te çima bangî Xezalê kir? Why did you call Xezal?

In the spoken language, **bang** may be contracted to **ban** or **ba**; **-î** is not used in that case.

We ba kê kir? Who did you call?
Me ba Azad kir. We called Azad.

Dersê niv seet berê dest p



Me do di birkê de bi avjenî lîst.



Min şeva çuyî peyvikên Kurdî ducar kirin.



Ez bi Mizgîn re niv seetê meşîyam.



Em doh pir revîyan.

Ders 5 deqe berê qedîya.



Ew seet di 9:00'an de ket nav nivinan.

DÎYALOG 5



- Roj baş. Dilo li wir e?
- Roj baş, Xecê. Ma te dengê min nas nekir? Ez Birûsk im.
- Erê welleh, Birûsk. Min dengê te nas nekir? Tu çawa yî?
- Baş im, sipas dikim. Dilo jî nuha derket, çû mala xalê min.
- Tişt nabe. Ez şeva çûyî hatim

mala we, hun ne lê bûn. Hun li ku bûn?

- Rast e, em ne li malê bûn. Em bi xweha Sîno re çûn sînemayê.
- Filîm çawa bû?
- Pir xweş bû.
- Qey hun dereng hatin malê?
- Em seet di 12:30'an de hatin malê. Lê, min çend seetan pirtûk xwend. Ez dûre raketim. Dilo zû raket, ew vêsê jî zû rabû. Em îşev li malê ne, tu çima îşev nayê?
- Baş e. Ez seet di 8:00'an de li wir im. Gavê bi xweşî bimîne.
- Tu jî.



The past stem of **hebûn** (to have) is **hebû**, **hebûn** for plural objects.

- | | |
|-----------------------------------|------------------------------------|
| Pênûseke min hebû. | I had a pen |
| Wî sê kur hebûn. | He had three sons. |
| Ma diravê te hebû? | Did you have money? |
| Na min dirav tunebû. | No, I didn't have money. |
| Li malê 5 mirov hebûn. | There were 5 people at home. |
| Wê rojê goştê me tunebû. | That day, we didn't have any meat. |
| Yê me hebû, yê wan tunebû. | We had, they didn't have. |

şuştin (to wash) and **xwe** or **serê xwe** form a compound verb: **xwe şuştin** or **serê xwe şuştin** meaning **to take a bath, to wash oneself**.

- | | |
|-------------------------------|------------------------------|
| Min do xwe şuşt. | I took a bath yesterday. |
| Wê vêsê serê xwe şuşt. | She took a bath this morning |

sekinîn and **li benda** or **li hêvîya** form a compound verb: **li benda/hêvîya yekî/tiştêkî sekinîn** (to wait for sb/sth., to expect sb/sth.)


1. Tu li benda kê sekinî?
2. Ez li benda Azad sekinîm.
3. Ez niv seetê li hêvîya te sekinîm.
4. Ew li hêvîya Xezalê sekinî.

1. Whom did you wait for? 2. I waited for Azad. 3. I waited for you for half an hour. 4. He waited for Xezal.

1. Min vê sibê oda xwe hewadar kir.
2. Wan 5 deqe berê solên xwe paqij kirin.
3. Wî 3 deqe berê derî vekir.
4. Wan seetek berê pênûsên xwe tûj kirin.
5. Wê 10 deqe berê televîzyon vekir.
6. Me seetek berê radyo girt.

7. We çima derî girt?
8. Me vêsê sobe vênexist.
9. Wan kengî cixarên xwe vêxistin?
10. Wî niv seet berê elektrîk vêxist.
11. Me do hêk kelandin.
12. Wan êvarî hêkerûn çêkir.
13. Av 5 deqe berê kelîya.
14. Min îşev rîya xwe kur kir.
15. Ma wî hefta çûyî porê xwe kur kir?
16. Duh Elî û Mizgîn hilkişîyan ser darê.
17. Wê roja Îniyê telefonî bavê xwe kir.
18. Me duh êvarî bangî bijîşk kir.
19. Te kengî derî girt?
20. Min nuha derî girt.
21. Wan radyo du deqe berê girt.
22. Leşkeran hefta çûyî Serbest girt.
23. Min pê girt, wî jî şuşt.
24. Baş bi wî bigire.
25. Wî li van wêneyan nêrî.
26. Em şeva çûyî ji sînemayê meşîyan malê.
27. Wan duh xwe şuştin.
28. Min ew nivîs bi tîpnevîsê nivîsî.
29. Me vê sibê mamoste dît; silab da me.
30. Min ew pirtûk hefta çûyî da wan.
31. Ez duh bi Xezalê re peyivîm.
32. Min nameya te du hefte berê stend.

1. I aired my room this morning. 2. They cleaned their shoes 5 minutes ago. 3. He opened the door 3 minutes ago. 4. They sharpened their pens one hour ago. 5. She turned on the TV 10 minutes ago. 6. We turned off the radio one hour ago. 7. Why did you shut the door? 8. We didn't light the stove this morning. 9. When did they light their cigarettes? 10. He turned on the light half an hour ago. 11. We boiled eggs yesterday. 12. They made omelette in the evening. 13. The water boiled 5 minutes ago. 14. I had a shave tonight. 15. Did he have a haircut last week? 16. Yesterday Elî and Mizgîn climbed the top of the tree. 17. She phoned her father on Friday. 18. We called the doctor yesterday evening. 19. When did you shut the door? 20. I have just shut the door. 21. They turned off the radio 2 minutes ago. 22. The soldiers caught Serbest last week. 23. I held it and he washed. 24. Hold him tight. 25. He looked at these paintings. 26. We walked home from the cinema last night. 27. They had a bath yesterday. 28. I wrote that text with the typewriter. 29. We saw the teacher this morning; he said "Hello" (He greeted us). 30. I gave that book to them last week. 31. I talked to Xezal yesterday. 32. I received your letter two weeks ago.





Min bi pitikê gîrt,
wê jî ew şuşt.



Me seet di 12:00'an de solên
xwe boyax kirin.



Bavê min seetek berê hat.



Em doh êvarî
çûn mala Rojînê.




Ew 5 deqan li seknokê sekinîn.

Wê hefta çûyî porê
xwe kur kir.



DÎYALOG 6



- Aram, xêr e, çî te heye? Tu do nehat kar.
- Ez nexweş bûm.
- Te bangî tixtor kir?
- Na, ez çûm cem wî.
- Tu nuha baş î?
- Erê, lê ez doh gişa rojê di nav nivînan de mam.
- Tu îro jî naçî kar?
- Na, min telefon kir û destûr xwest.
- Derbashûyî be!
- Gelek sipas! Roj baş!
- Roj baş!

DÎYALOG 7



- Sibeh xweş, Xelîl, tu kengî ji gund hat?
- Ez du hefte berê hatim.
- Dê û bavê te çawa bûn?
- Baş bûn. Silab kirin.
- Wekî din çi li gund hebû?
- Tiştêkî nuh tunebû.
- Tu li ku dimînî?
- Ez li otelekê dimînim.
- Ma te ji xwe re xanîyek kirê nekîr?
- Na, min tu xanîyê kirê nedît.
- Wê gavê tu mêvanê min î. Bimeşe!

HÎNDARÎ 12

1) Fill in the gaps using the words in brackets in the Simple Past Tense and translate the sentences into English afterwards.

- a) doh otoboz ajot. (I)
- b) Ma te vêsê agir? (to light)
- c) şeva çûyî şîv nexwar. (he)
- d) Hefta çûyî, me di birkê de bi avjenî (to swim)
- e) Meha çûyî, baran pir (to rain)
- f) Min ji wî (to believe)
- g) Te ez pir (to tire)
- h) Îro ez pir (to get tired)
- i) Tu seetek berê bi ku de? (to go)
- j) Bi rastî min ne....., bavê min (to see)
- k) Ma te kincê xwe kengî (to wash)
- l) Me hêkerûn (to make)
- m) Ma mamoste çi li depreş? (to write)
- n) Wan nîv seet berê (to start)
- o) Ma wî ji te pir? (to like)
- p) We çend hêk? (to boil)
- r) Ma ew ji ku? (to fall)
- s) Kî mala we? (to come)

2) Translate the following sentences into Kurdish Hevokên jêrîn wergerînin Kurdî.

- a) I painted the door yesterday morning.
- b) We went to cinema last night.
- c) Were you at home this morning?
- d) No, I was not at home this morning.
- e) Did you take a bath yesterday?


- f) No, we didn't have a bath yesterday. We had a bath this morning.
 g) When did you wash the glasses?
 h) I washed them half an hour ago.
 i) To whom did Zelal talk?
 j) She talked to her mother.
 k) To whom did you give my book?
 l) I gave your book to Evin.
 m) Did you boil the water properly?
 n) Did you have a shave this morning?
 o) Did you empty the basket?
 p) No, they did.
 r) Did they stay at home yesterday?
 s) No, they went to the market, but I stayed at home.

**3) Ji peyvikan hevokan çêkin (Dema Borîya Têdayî).
 Make sentences using the words (Simple Past Tense).**

MÎNAK: ez, çûn, mal: Ez çûm malê.

- a) ew, sekinîn, seknok:
 b) hun, hatin, gund:
 c) we, vêsê, rî, kur kirin:
 d) wî, do, rî, kur kirin:
 e) tu, revîn, îro, pir:
 f) ez, hefta çûyî, betilîn, pir:
 g) kî, xwendegêh, çûn:
 h) wan, nivîsîn, name, pênc, şeva çûyî:
 i) wê, min, silab dan:
 j) kê, xwendin, pirtûk:
 k) min, bang kirin, Xezal:
 l) ders, dest pê kirin, seet, nîv, berê:
 m) te, pê girtin, çi:
 n) we, kê, nêrîn, li:
 o) wan, nivîsîn, çi:

4) Dîyaloga jêrîn wergerînin Îngilîzî.



- Roj baş!
- Roj baş! Tu çi dixwazî? Zû bibêje, karê min heye.
- Xêr e, çî te heye? Tu ewqas zû diçî ku?
- Nuha, te ji bo vê bangî min kir?
- Na, na. Neqehire! Ez do çûm Îstembolê.
- Ji min re çî?
- Min li wira birayê te dît.
- Zû bipeyive! Ez dereng mam.
- Destûr bide, ez dipeyivim. Birayê te got ...
- Got çî?
- Silab kir.
- Ewqas?
- Erê, ewqas.
- Careke din silaban ji min re nîne!

JI ZARGOTINA KURDAN

Qazî

Rojekê gundîyekî çar pezên xwe ji bo firotinê birin bajêr. Di rê de, zilamek lê rast hat, got:

- Roj baş! Tu diçî ku?
- Ez pezên xwe ji bo firotinê dibim bajêr.
- Ez dikirim. Lê pere bi min re tune. Ez li bajêr didim te.

Çûn gîhaştin bajêr. Lê zilêm perê gundî nedayê. Got:

- Ev pezên min in. Perê çî? Tu derewan dikî.

Çûn cem Qazî. Qazî ji gundî re got:

Şhadên te hene?

- Na.
- Wexta ku we bazar kir, kî li cem we hebû?
- Kesek tunebû.
- Li dora we çî hebû?
- Ji xêndî zinarekî tiştêk tunebû.
- Here, wî zinarî bîne!

Gundî dikira biçûya. Zilamê din kenîya. Qazî got:

- Tu çima dikenî?
- Ma tu nabînî çiqas bêheş e?
- Ma zinar ji cihê xwe radibe û tê bajêr?
- Wê gavê gundî rast dibêje.
- Ji bêheşî pezên xwe dane te.
- Perê wî bidê!

bêheş fool, stupid
bêheşî (f) foolishness
dikira biçûya he was about to go
ji xêndî except
lê rast hatin vi meet
by chance
qazî judge
şhad witness
zinar rocks



Se Hemû Se Ne



Yekî li deştê seyêk dît, rahişt kevirekî mezin li serê se xist û di cîh de kuşt. Hevalê wî got:

- Ma tu ji Xwedê natirsî? Te ev seyê bêguneh kuşt?
- Tu nizanî, par li zozên seyêkî ez girtim, ez bi zorê jê xelas bûm.
- Malxerab, seyê zozanan li ku seyê deştan li ku?
- Na, se hemû se ne.

deşt (f) plain
bêguneh innocent
bi zorê hardly
kuştin (bikuje) vt to kill
malxerab May your home be ruined
se,seg dog
zozan (f) high plateau, mountain pasture

**Bi kevçî kom kir,
bi heskê belav kir.**

belav kirin vt to distribute hesk (f) ladle
kom kirin vt to collect, to save

FERHENGOK

ajotin (bajo) vt to drive

bes enough

çun ava vi (sun) to set

der (f) place

diz thief

ev ... e/in for

êdî, îdî any more, no more

gavê for now, for the time being,

so far, as yet

gerin (bigere) vi to walk around,
to roam around

hevdu, hevûdu one another

hilatin (hilê) vi (sun, moon, etc.)
to rise

hiştin (bihêle) vt to leave, to
let, to allow

hîn, hîna, hêj as yet, so far

jê ... vir de since

ji ber vê yekê this is why, for

this reason

ji kengî de how long (since
when)

komel (f) association

nas acquaintance; familiar

nas kirin vt to know, to
recognize

qet ever, never

rûniştin (rûne) vi to sit

sîwan (m) umbrella

vemirandin (vemirîne) vt
(a fire) to put out, to extin-
guish, to switch off

vemirîn (vemire) *Ing* (a fire,
a light) to go out, to die down,
to fade

xwar down, downwards;
crooked, curved

zûde, zûve for a long time (past)

DEMA BORÎYA DÛDAR PRESENT PERFECT TENSE

Dema Borîya Dûdar/Present Perfect Tense refers to a past action or event the effects of which are still felt at the present time, or when there are no clear indications about the time that the action took place.

A: Intransitive Verbs

The appropriate **bûn** (to be) ending used after a vowel (**me, yî, ye, ne**) is added to the **past stem**.

BÛN

| after a consonant | after a vowel |
|-----------------------|------------------------|
| Ez karker im. | Ez mamoste me. |
| Tu karker î. | Tu mamoste yî. |
| Ew karker e. | Ew mamoste ye. |
| Em karker in. | Em mamoste ne. |
| Hun karker in. | Hun mamoste ne. |
| Ew karker in. | Ew mamoste ne. |

The ending agrees with the subject.

When the past stem ends in a consonant the letter **i** is used for sound agreement: **-ime, -iyî, -iye, -ine.**

Ez çûme (I have gone)

Tu çûyî*

Ew çûye

Em çûne

Hun çûne

Ew çûne

Ez hatime (I have come)

Tu hatiyî*

Ew hatiye

Em hatine

Hun hatine

Ew hatine

Hilatin (hilê) is a compound verb. It includes the preverbal **hil** (up) and **hatin** (to come). The letter **h** has been dropped in the course of time.

Roj hiltê. The sun is rising/rises.

Roj hilat. The sun rose.

Roj hilatiye. The sun has risen.

(*) In some regions the second singular person receives **-iye** instead of **-iyî**. Emir Celadet Bedirxan too preferred **-iye**; however it does not agree with the subject and is not as common as **-iyî**.

Roj diçe ava The sun is setting/sets.

Roj çû ava The sun set.

Roj çûye ava The sun has set.

The words **rojhat** (east) and **rojawa** (west) are formed from those verbs. **rojawa** is often contracted to **roawa** (as **roj** to **ro**) in the spoken language.

rûniştin is made up of the preverbial **rû-** and **niştin**. Therefore **di-** and **na-** are placed after **rû** in the present tense.

Ez rûniştim. I sat.

Ez rûniştîme. I have sat.

Ew rûdine. He is sitting/sits.

Em rûnanin. We are not sitting/don't sit.

Dema Borîya Dûdar may also be used for the present perfect continuous (progressive) tense.

1. **Ez hînî Îngîlîzî bûme.**
2. **Ev sê roj in, ez neçûme wir.**
3. **Ez li wan deran pir gerîyame.**
4. **Em ji Îlonê vir de nemeşîyane.**
5. **Ji Adarê vir de baran nebarîyaye.**
6. **Binêre! Hozan ketiye xwar!**
7. **Em hîna neçûne bajêr.**
8. **Ma Mizgîn çûye gund?**
9. **Gavê neçûye.**
10. **Dê û bavê te hatin?**
11. **Gavê nehatine.**
12. **Ji doh vir de ez ders nexebitîme.**
13. **Ma roj hilatiye?**
14. **Erê, deh deqe berê hilat.**

15. **Kî hatine?**

16. **Elî û Azad hatine, lê belê Zînê û Berfê hêj nehatine.**

17. **Hun ji kengî de li vir rûniştine?**

18. **Ev du seet in, em rûniştine.**

19. **Şerzan bûye mamoste, lê belê em hîna nebûne.**

20. **Ma, tu çima li vir mayî?**

21. **Ez li bende xwişka xwe me.**

22. **Derî ji kengî de vebûye?**

23. **Ma Silo raketiye?**

24. **Na, hîna raneketiye.**

25. **Ma zaro ji xew rabûne?**

26. **Erê, rabûne.**

1. I have learnt English. 2. I haven't been (gone) there for 3 days. 3. I have walked around those places a lot. 4. We haven't walked since September. 5. It hasn't rained since March. 6. Look! Hozan has fallen down. 7. We haven't gone to the city yet. 8. Has Mizgîn gone to the village? 9. He hasn't gone yet. 10. Did your parents come? 11. They haven't come yet. 12. I haven't studied since yesterday. 13. Has the sun risen? 14. Yes, it rose 10 minutes ago. 15. Who have come? 16. Elî and Azad have come, but Zînê and Berfê haven't come yet. 17. How long (since when) have you been sitting here? 18. We have been sitting (here) for two hours. 19. Şerzan has become a teacher, but we haven't yet. 20. Why have you stayed here? 21. I am waiting for my sister. 22. How long (since when) has the door been open? 23. Has Silo slept? 24. No, he hasn't slept yet. 25. Have the children woken up? 26. Yes, they have woken up.

B: Transitive Verbs

past stem + -ye for all persons. **-ye** is replaced by **-iye** when the past stem ends in a consonant.

Min nivîsîye. (I have written.)

Min kiriye. (I have done.)

Te nivîsîye.

Te kiriye.

Wî/wê nivîsîye.

Wî/wê kiriye.

Me nivîsîye.

Me kiriye.

We nivîsîye.

We kiriye.

Wan nivîsîye.

Wan kiriye.

HEBÛN

Min hebûye (I have had)
Te hebûye
Wî/wê hebûye

Me hebûye
We hebûye
Wan hebûye

The verb agrees with the direct object, therefore **-ye** is replaced with the plural ending **-ne**, **-iye** with **-ine**, when the object is plural.

| | |
|-----------------------------|-----------------------------|
| Min name nivîsiye. | I have written the letter. |
| Min name nivîsîne. | I have written the letters. |
| We ew dîtîye. | You have seen him/her. |
| Ma we ew nedîtine? | Haven't you seen them? |
| Min hêkek kelandiye. | I have boiled an egg. |
| Min 5 hêk kelandîne. | I have boiled 5 eggs. |

When the direct object is **ez** the ending is **-me**, **-yî** for **tu**.

Wî ez dîtîme.
Me tu dîtîyî.

The prefixes **bi-**, **di-**, **na-** and **ne-** lose their vowels, when they are used with verbs beginning with a vowel, such as **ajotin** (to drive), **axaftin** (to speak), etc.

| | | |
|------------------|-----------------|----------------------------------|
| Biajo! | Bajo! | Drive! |
| Ez diajom | Ez dajom | I am driving/drive . |
| Ew naajo | Ew najo | He is not driving/doesn't drive. |

zûde (zûve) is the contraction of **ji zû de (ji zû ve)** and means for a long time past. **ve** and **de** are spelled as **va** and **da** in some regions.

| | |
|--------------------------------------|-------------------------------------|
| Ez ji zû ve (zûve) li vir im. | I have been here for a long time. |
| Ma tu ji zû de (zûde) hatiyî? | Have you been here for a long time? |
| Wî ji zû ve ez nedîtîme. | He hasn't seen me for a long time. |

1. **Ma we firavîn xwariye?**
2. **Na, me hîn nexwariye.**
3. **Ma wan hîna dest bi kar nekirine?**
4. **Na, hîna dest pê nekirine.**
5. **Ma derî vekirî maye?**
6. **Erê, zarokan ew vekirî hiştiye.**
7. **Wan ji zû ve derî vekirine.**
8. **Ma we pace girtine?**
9. **Na, me hîna negirtine.**
10. **Ma we taştê xwariye?**
11. **Te qet teqsi ajotiye?**
12. **Na, min qet neajotiye.**
13. **Wan Xezal li bajêr dîtîye.**
14. **Ma we sobe vexistiye?**
15. **Na, me hîna vênexistiye.**
16. **Ma agirê Newrozê vemirîye?**
17. **Na, ew qet venamire?**
18. **Zaroyan sobe vemirandine.**
19. **Te ji kengî de rîya xwe kur nekiriye?**
20. **Ev çar meh in, min rîya xwe kur nekiriye.**
21. **Ev pênc roj in, min xwe neşuştîye.**
22. **Ev çar sal in, me kurê xwe nedîtîye.**
23. **Min name nivîsîne.**
24. **Te pirtûk dane kê?**
25. **Min ew dane Zelalê.**
26. **Ma we Îstembol dîtîye?**
27. **Na, me Îstembol nedîtîye, lê belê me gelek bajarên mezin dîtîne.**
28. **We radyo girtiye?**
29. **Belê, me radyo girtiye, lê me televîzyon vekirî hiştiye.**
30. **Ma av kelîyaye?**
31. **Belê, ji zû ve kelîyaye.**

1. Have you had lunch? 2. No, we haven't yet. 3. Haven't they started working yet? 4. No, they haven't started yet. 5. Has the door remained open? 6. Yes, the children have left it open. 7. They have opened the doors for a long time. 8. Have you closed the windows? 9. No, we haven't closed them yet. 10. Have you had breakfast? 11. Have you ever driven a car? 12. No, I have never driven (a car). 13. They have seen Xezal in the city. 14. Have you lit the stove? 15. No, we haven't lit it yet. 16. Has the fire of Newroz gone out? 17. No, it never goes out. 18. The children have put the stove out. 19. How long haven't you shaved? 20. I haven't had a shave for 4 months. 21. I haven't had a bath for 5 days. 22. We haven't seen our son for 4 years. 23. I have written the letters. 24. To whom have you given the books? 25. I have given them to Zelal. 26. Have you seen (been to) Istanbul? 27. No, we haven't been to Istanbul, but we have been to many large cities. 28. Have you turned off the radio? 29. Yes, we have turned off the radio, but we have left the TV on. 30. Has the water boiled? 31. Yes, it has been boiling for a long time.

Compare **Dema Borîya Têdayî** with **Dema Borîya Dûdar**, in the following sentences:

Ez doh çûm sînemayê.

Ev çar roj in ez neçûme sînemayê.

Tu şeva çûyî seet di çendan de raket(i)?

Ma tu qet raneketiya?

Ew îşev zû hat.

Ew hîna nehatiye.

Em vêsê bi wan re revîyan.

Em zûve nerevîyane.

Ma hun duh pir meşîyan?

Ma hun pir meşîyane?

Ew vêsê pir betilîn.

Ew pir betilîne.

Min hefta çûyî pirtûkên xwe li mala Berfînkê hiştin.

Min pirtûkên xwe li mala Berfînkê hiştine.

Te wê rojê çi kir?

Te çi kiriye?

Wî duh Azad li ber derî hişt./Kê Azad li ber derî hiştiye?

JI ZARGOTINA KURDAN

Axa û Xulam

Axa rojekê nexweş ket, bangî xulamê xwe kir, got:

- Here, ji tixtor re bibêje, Axayê min nexweş ketiye.

Bibêje, serê wî werimîye bûye

kundir, pozê wî werimîye bûye gêzer, çepilê wî werimîye bûye xiyar, zikê wî werimîye bûye zebes, lingê wî werimîye bûye av.

Xulam got:

- Axa, ez ê bi kurtî bibêjim, were Axayê min bûye bostan.

bostan (f) vegetable patch/garden

berdan (berde) *vt* to let go, to

leave, to give up

çepil (m) arm

Ez ê bi kurtî bibêjim. I will briefly say

gêzer (f) carrot

gor (f) grave

kundir (m) marrow, pumpkin

sond xwarin *vt* to swear

tixtor doctor

werimîn (biwerime) *vt* to swell

xiyar (m) cucumber

xulam servant

zebeş (m) water-melon



- Bavo min dizek girtiye!

- Berde!

- Ez berdidim, ew min bernade!

Bavê xwe kuştiye, bi gora wî sond dixwe.

HÎNDARÎ 13

A) Diyaloga jêrîn bixwînin û pirsan bersîv bikin.
Read the following dialogue and answer the questions.

- Rojda, ma tu zûve hatiyî vî welatî?
- Erê, ev du sal in.
- Tu qet çûyî Almanyayê?
- Na ez qet neçûme Almanyayê. Lê ez çûme Fransayê û min Parîs dîtîye.



1. Ev çend sal in Rojda hatiye vî welatî?
2. Ma Rojda Fransa dîtîye?
3. Rojda çend caran çûye Almanyayê?

B) Nivîsara jêrîn bixwînin û pirsan bersîv bikin.
Read the following text and answer the questions.

LONDON

Par ez û Bişar çûn Londonê. Hewa carinan pir germ, carinan jî pir sar bû. Baran pir bû. Em li muze, park û gelek derên din gerîyan. Me derên herî bi nav û deng wek Big Ben, Çemê Thames, Tower Bridge, Trafalgar Square, Parlamento, Buckingham Palace, hwd. giş dîtîn. Ez bi Îngîlîzî dizanim, lê Bişar nizane. Ew bi Almanî dizane; li şîrketeke Alman xebitîye; ji ber vê yekê, bi Almanan re pir peyivîye, ew baş nas kirine. Ew zane ew jî çi hez dikin û ji çi hez nakin. Ew tim jî min re dibêje: "Bawer, Îngîlistan ji te re xweş e, lê ji min re Almanya xweş e. Ji ber ku min ew baş nas kirine."

1. Kî kengî çûn Londonê?
2. Ma li Londonê baran hindik barîyaye?
3. Kê ji Londonê hez kir û kê jê hez nekir?
4. Kê Alman baş nas kirine?
5. Herdu hevalan kîjan derên bi nav û deng dîtîne?
6. Kî di şîrketeke Alman de xebitîye?
7. Ma Bişar dizane Alman ji çi hez dikin.

C) Translate *Dema Borîya Têdayî* into *Dema Borîya Duçar*.
Dema Borîya Têdayî wergerînin *Dema Borîya Dûdar*.

1. Ez neçûm gund.
2. Tu hat malê.
3. Ew zû raket.
4. Em pir revîyan.
5. Hun hêdî meşîyan.
6. Ew ji xew ranebûn.
7. Min taştê xwar.
8. Te otoboz ajot.
9. Wî em dîtîn.
10. Wê qehwe çênekir.
11. Me du pirtûk xwendin.
12. We li wan mêze kir.
13. Wan çay vexwarin.

D) Fill in the gaps.
Cihên vala tije bikin.

1. Ez hîna (to sleep)
2. Ma tu ji zû ve ne.....? (to walk)
3. Ew du seet berê (to come)
4. Em duh Mêrdînê. (to go)
5. Ma hun zûde? (to sit)
6. Ma ew du sal berê li kuderê? (to be)
7. Min do Serbest ne..... (to see)
8. Ma te hîna ew ne.....? (to see)
9. Ev çend sal in wî otoboz ne.....? (to drive)
10. Ev sê roj in wê tiştê ne..... (to eat)
11. Ew du deqîqe berê ... cem Mizgîn û Azad (to go)
12. Ma we qet hesp ne.....? (to see)
13. Ji Tebaxê vir de wan em ne..... (to see)

FERHENGOK

bapêş (f) cold, flu
bi bapêşê ketin vi to have a cold/flu
derxistin (derxe) vt to take out, to bring out
diran (m) tooth
êş (f) ache, pain
êşîn, êşîyan (biêşe) vi to hurt, to ache
guh (m) ear
herikîn (biherike) vi to flow
ling, nig (m) leg
nexweşî (f) illness

nexweşxane (f) hospital
pê (m) foot
serma (f) cold
serma girtin vt to have a cold
ser, serî (m) head
sorik measles
sorik derxistin to have measles
şikestî (bişikê) vi to break, to be broken
ta (f) fever, temperature
ta girtin lg to have a fever
zik (m) stomach, abdomen

çi yê or its contraction **çî** together with the verb **hebûn** is used in forming such expressions as **What's wrong with you? What's the matter with you?**, etc.

Çî wê heye?
Guhê wê diêşe.

What's wrong with her?
 She has an earache.

Çî te heye?
Ez bi bapêşê ketime.

What's the matter with you?
 I've had a flu.

Le Aram?
Wî sorik derxistiye.

And Aram?
 He has measles.

Nalînê ta girtiye.

Nalîn has (had) a fever.

Le bavê te çawa ye?
Ew baş e; tişteki wî tune ye.

And how is your father?
 He is fine; there is nothing wrong with him.

Bawer, pozê te çima ewqas diherike?!
 Bawer, why does your nose run so much?



Diranên wê diêşin.



Du roj berê lingê wê şikest.



Serê min diêşe.



Wê serma girtiye.



Zikê wî diêşe.

BILANÎ (DEMA NUHA) OPTATIVE MOOD (PRESENT)

Bilanî is the verbal form expressing desire, wishing, wanting, preference, etc.: eg. in Greek, not in English. It also forms the basis for the **subjunctive mood**, the **future tense**, and some other verbal forms which will be dealt with later.

Bilanî is formed by replacing **di-** of the present tense with **bi-**

| dîtin (bibîne) | |
|---------------------|---------------------|
| Dema Nuha | Bilanî |
| Ez <u>d</u> ibînim | Ez <u>b</u> ibînim |
| Tu <u>d</u> ibînî | Tu <u>b</u> ibînî |
| Ew <u>d</u> ibîne | Ew <u>b</u> ibîne |
| Em <u>d</u> ibînin | Em <u>b</u> ibînin |
| Hun <u>d</u> ibînin | Hun <u>b</u> ibînin |
| Ew <u>d</u> ibînin | Ew <u>b</u> ibînin |

It may also be formed by using the **imperative singular** based upon the third person (**ew**), replacing **e** with an appropriate **bûn ending for the rest: -im, -î, -in.**

dîtin (to see); **Bibîne!** (See!); **Ew bibîne** (Bilanî)

| | |
|--------------------------|---------------------------|
| Ez <u>b</u>ibînim | Em <u>b</u>ibînin |
| Tu <u>b</u>ibînî | Hun <u>b</u>ibînin |
| Ew <u>b</u>ibîne | Ew <u>b</u>ibînin |

Negation: **bi-** is replaced with **ne-**.

Ez nebînim, Tu nebînî, Ew nebîne

Note that the only difference between the negative of **bilanî** and **dema nuha** is **na-** and **ne-**.

As there is no equivalent English verbal form matching **Bilanî**, we have to use such expressions as **I'd rather, I want, Let me, I wish**, etc. when translating Kurdish sentences. The appropriate expression depends on the context.

The words **bila** or **ka** might be used to strengthen **bilanî**.

| | |
|---------------------------|-----------------------|
| Ka ez bipeyivim. | Let me speak. |
| Tu bipeyivî. | I want you to speak. |
| Bila ew bipeyive. | Let him speak. |
| Ka em bipeyivin. | Let's speak. |
| Hun bipeyivin. | I'd rather you speak. |
| Bila ew bipeyivin. | Let them speak. |

In translating these Kurdish sentences, I have tried to give the readers an idea about how to interpret **bilanî**. Note that as there is no equivalent English verbal form, it is important to interpret **bilanî** from the context.

The **third personal pronouns** may be dropped, when used with **bila**.

1. **Ji Azad re bibêje, bila (ew) wî bibîne.**
2. **Bila ew neçin kar.**
3. **Bila (ew) zû bimeşe.**
4. **Ka em herin sînemayê.**
5. **Ka em birevin.**

1. Tell Azad to see him. 2. Don't let them go to work/Tell them not to go to work//I don't want them to go to work. 3. Tell him/her to walk fast. 4. Let's go to cinema. 5. Let's run.

| Hatîn | | Werîn (were) |
|----------------|-------------------|-----------------|
| Regular (Bihê) | Contraction (bê) | |
| Ez bihêm | Ez bê m | Ez werim |
| Tu bihê | Tu bê (yî) | Tu werî |
| Ew bihê | Ew bê | Ew were |
| Em bihên | Em bê n | Em werin |
| Hun bihên | Hun bê n | Hun werin |
| Ew bihên | Ew bê n | Ew werin |

Çûn (biçe)

Ez biçim
Tu biçî
Ew biçe
Em biçin
Hun biçin
Ew biçin

Herîn (here)

Ez herim
Tu herî
Ew here
Em herin
Hun herin
Ew herin

Bûn (be)/to be

Ez bim
Tu bî
Ew be
Em bin
Hun bin
Ew bin

Bûn (bibe)/to become

Ez bibim
Tu bibî
Ew bibe
Em bibin
Hun bibin
Ew bibin

In some regions **bila** is spelled as **bira**.

- Bila ava sar be.** I'd like cold water.
Bila av sar bibe. I'd like the water become cold.
Bila kêreke tûj be. I'd like a sharp knife.
Bila ne piçûk bin. I don't want them small.
Bila mezin nebin. Don't let them grow.
Bila ne şêrîn be. I don't like it sweet.
Bila şêrîn nebe. Don't let it become sweet.
Bira hewa germ bibe, dûre here/Let it get warm, then go.

Bira baş be, bira dereng be.

Hebûn (hebe)

| to exist | | to have | |
|-------------|----------|----------|-----------|
| affirmative | negative | singular | plural |
| Ez hebim | tunebim | Min hebe | Min hebin |
| Tu hebî | tunebî | Te hebe | Te hebin |
| Ew hebe | tunebe | Wî hebe | Wî hebin |
| Em hebin | tunebin | Wê hebe | Wê hebin |
| Hun hebin | tunebin | Me hebe | Me hebin |
| Ew hebin | tunebin | We hebe | We hebin |
| | | Wan hebe | Wan hebin |

Çêkirin (çêke)

| | | |
|-----|-------|---------|
| Ez | çêkim | çênekim |
| Tu | çêkî | çênekî |
| Ew | çêke | çêneke |
| Em | çêkin | çênekin |
| Hun | çêkin | çênekin |
| Ew | çêkin | çênekin |

Rabûn (rabe)

| | | |
|-----|-------|---------|
| Ez | rabim | ranebim |
| Tu | rabî | ranebî |
| Ew | rabe | ranebe |
| Em | rabin | ranebin |
| Hun | rabin | ranebin |
| Ew | rabin | ranebin |

The compound verbs with a **preverbal** do not take **bi-**.

Other compound verbs take **bi-**.

Dest pê kirin (dest pê bike) Mêze kirin (mêze bike)

Ez dest pê bikim/nekim
 Tu dest pê bikî/nekî
 Ew dest pê bike/neke
 Em dest pê bikin/nekin
 Hun dest pê bikin/nekin
 Ew dest pê bikin/nekin

Ez mêze bikim/nekim
 Tu mêze bikî/nekî
 Ew mêze bike/neke
 Em mêze bikin/nekin
 Hun mêze bikin/nekin
 Ew mêze bikin/nekin

1. Seet bû dozdeh, ez êdî rakevim.
2. Dereng bû, ez biçim.
3. Baran dibare, ez sîwana xwe bibim.
4. Bila Azad zû were, bavê wî nexweş e.
5. Bila ew nên (neyên), em bes in.
6. Hun neçin, bila ew werin.
7. Tu dersa xwe çêkî ha!
8. Em êdî herin, bavê me nuha hatiye.
9. Bila zarokan nebetilînin.
10. Bira derî baş bigire, li vê taxê diz pir in.
11. Ka em telefonî wî bikin, bila îro were vir.
12. Bila Azad neçe, Ûso wî nas dike bila ew biçe.

1. It is (became) 12.00, I'd better sleep now. 2. It is (became) late, I'd better go. 3. It's raining, I'd better take my umbrella. 4. Tell Azad to come quickly, his father is sick. 5. Tell them not to come, there are enough of us. 6. You, don't go, let them come. 7. Make sure you do your homework! 8. Let's go now, our father (may) have come by now. 9. Tell them not to tire the children. 10. Tell him/her to shut the door properly, there are many thieves in this neighbourhood. 11. Let's phone and ask him to come here today. 12. I don't want Azad to go, Uso knows him, tell him to go.

Bila diz hebin, şevereş pir in.

Bila meriv mêr be, kelemê ber çavê neyar û dijminan be.

Derîyo, tu dar bî, serê min sitar bî.

Bila hindik be, bila rindik be.

Bira dilê meriv xweş be, bira balîfa meriv kevir be.

Ne dixwim gêlazan, ne didim hevrazan.

balîf (f) pillow
hevraz (m) upward slope
kelem (m) thorn
gêlaz (f) cherry

mêr brave man
neyar enemy
rindik nice, fine
sitar (f) shelter

dar wood, wooden
diz thief
şevereş, şevreş (f) dark night

JI ZARGOTINA KURDAN

Axa û Bexik



Berxekî axayekî hebû. Rojekê xwest ku berxik serjê bike.
Berxik: Ez naxwazim tu min serjê bikî, heta ku sala min diqede.

Axa: Baş e, ez te serjê nakim, heta ku sala te tijî bibe.

Salek qedîya. Axa:

- Berxik, tu çawa yî. Ma em salek din jî bisekinin?

- Na, na, bes e.

- Çima bes e? Dinya xweş e.

- Na, bes e. Min her çar demsal dîtin: havîn, payîz, zivistan û bihar. Ma tiştêkî din heye?

- Na, sala din jî, cardin her çar in.

- Wa ye tiştêkî din tune. Wê gavê min serjê bike.

FERHENGOK

| | |
|---|--|
| beyanî morning, tomorrow | hişyar bûn <i>vi</i> to wake up |
| birin (bibe) <i>vt</i> to take | hişyar kirin <i>vt</i> to wake(sb) up |
| biskekê, bistekê for a while | çakêt (m) jacket (of a suit) |
| biskeke din soon (after a while) | malîn (bimale) <i>vt</i> to sweep |
| çer ku as soon as | meha bê next month |
| dirav (m) money | sibe tomorrow |
| dirûnker tailor | sibehê, sibê in the morning |
| dusibe the day after tomorrow | sibehînî in the morning |
| gihaştin (bigihêje) <i>vi</i> to reach | |

DEMA PÊŞÎ - FUTURE TENSE

subject + ê (yê after a vowel) + bilanî.

| <u>Bilanî</u> | <u>Dema Pêşî</u> | |
|-------------------|---------------------|--------------------|
| Ez bixwim | Ez ê bixwim | I will eat |
| Tu bixwî | Tu yê bixwî | You will eat |
| Ew bixwe | Ew ê bixwe | He/she/it will eat |
| Em bixwin | Em ê bixwin | We will eat |
| Hun bixwin | Hun ê bixwin | You will eat |
| Ew bixwin | Ew ê bixwin | They will eat |

| | |
|------------------------|-----------------|
| Botan ê bixwe. | Botan will eat. |
| Silo yê bireve. | Silo will run. |

The only difference between **bilanî** and **dema pêşî** is the future indicator **ê**.

Tu and **ê** might be contracted to **tê** in the spoken language.

| | |
|------------------|----------------|
| Tê bixwî. | You will eat. |
| Tê werî. | You will come. |

ew ê might be contracted to **wê**.

| | |
|--------------------|-----------------------|
| Wê bixwe. | He/she/it will eat. |
| Wê bixwin. | They will eat. |
| Wê rakevin. | They will sleep. |
| Wê rakeve. | He/she/it will sleep. |

This contraction (**wê**) may also be used with a noun.

| | |
|----------------------------------|----------------------------|
| Azad wê bê. | Azad will come. |
| Mizgîn û Bawer wê bixwin. | Mizgîn and Bawer will eat. |

Although **ê** is considered as the contraction of **dê** by some grammarians, **dê** is not in common use. Some writers use a apostrophe to show that **d** has been omitted.

| | |
|--------------------------------------|---------------------|
| Azad dê (Azad'ê) rakeve. | Azad will sleep. |
| Şevîn dê (Şevîn'ê) wî bibîne. | Şevîn will see him. |

ne- is used for the negation.

Note that the negative of the **present tense** may sometimes be used instead.

| |
|---|
| Ma ew'ê bi me re were? |
| Na, ew'ê bi me re neyê (ew bi me re nayê). |
| Kî yê vexwe, kî yê venexwe? |
| Ez'ê vexwim, lê ew'ê venexwe (ew venaxwe). |

Hebûn

| | |
|---------------------------------|-------------------|
| Min ê hebe (I will have) | Me yê hebe |
| Te yê hebe | We yê hebe |
| Wî yê hebe | Wan ê hebe |

dê: min dê hebe, etc..

Di Îlonê de gelek diravê min ê hebe.
 Di Îlonê de min dê gelek dirav hebe.

| Bûn | | to be/become |
|-----------|--------|--------------------------|
| (be) | (bibe) | |
| Ez ê bim | bibim | I will be/become |
| Tu yê bî | bibî | You will be/become |
| Ew ê be | bibe | He/she/it will be/become |
| Em ê bin | binin | We will be/become |
| Hun ê bin | binin | You will be/become |
| Ew ê bin | binin | They will be/become |

1. Di 1997'an de ez ê mamoste bim.
2. Di 1997'an de ez ê bibim mamoste.
3. Nivro av ê germ be.
4. Nivro av ê germ bibe.
5. Pir nexwin, hun ê qelew bibin.
6. Wê seetê ez ê ne li vir bim.
7. Ji min re hinek av bîne, bila sar be.
8. Nuha nîne, bila sar bibe.
9. Ez ê sibe zû ji xew rabim.
10. Beyanî ew ê seet di 8:00'an de hişyar bibe.
11. Ew ê beyanî nameyekê binivîsin.
12. Em ê îşev zû rakevin.
13. Ew ê sibe Îngîlîzî bixebitin.
14. Hun ê roja Yekşemê oda min jî bimalin?
15. Na, em ê oda te nemalin (Em oda te namalin).
16. Ma tuyê deriyê xwe kengî boyax bikî? Pir gemarî bûye.
17. Balafir dê seet di 10:00'an de bê.
18. Meha bê, em ê bi balafirê biçin Parîsê.

19. Ma tê sibe bêyî mala me?
20. Na, ez ê dusibe werim.
21. Tu yê sibe seet di çendan de Hozan bibînî?
22. Ez ê wî seet di deh û nîvan de bibînim.
23. Wê kengî televizyonê veke?
24. Wê biskeke din veke.
25. Zozan wê kengî bigihêje vir?
26. Wê seeteke din bigihêje.
27. Ma otoboz'ê seet di çendan de bigihêje Mêrdînê?
28. Ew ê seet di 10:25'an de bigihêje.
29. Hun ê çima bimalin?
30. Ji ber ku, mêvan ê bîn.
31. Bavê min ê kengî telefonî me bike?
32. Ew ê meha bê telefon bike.
33. Ma ew ê ji te bawer bike?
34. Erê, wê ji min bawer bike.
35. Hun ê kengî û li ku bi avjenî bilîzin?
36. Em ê piştî nîro di birkê de bi avjenî bilîzin.
37. Tu yê pirtir bêriya kê bikî?
38. Bes bireve, tê bibetilî.
39. Kurê te yê bibe çi?
40. Ew ê bibe mamoste.
41. Ew ê çi çêkin?
42. Ew ê hêkerûn çêkin.
43. Ew ê çi bide min?
44. Ew ê hinek dirav bide te.
45. Hun ê kê bibînin?
46. Em ê gelek mirovan bibînin.
47. Dirûnker ê çakêtê min bidirû.
48. Tu yê ewqas fêkî ji kê re bibî?
49. Ez ê ji girtîyan re bibim.
50. Ew ê çi bikelînin?
51. Ew ê hêkan bikelînin.
52. Em ê li ku bimînin?
53. Em ê li otelekê bimînin.


1. I will be a teacher in 1997. 2. I will become a teacher in 1997. 3. The water will be hot at noon. 4. The water will become hot at noon. 5. Don't eat much, you will become fat. 6. I will not be there at that hour (time). 7. Bring me some water, let it be cold. 8. Don't bring (it) now, let it become cold. 9. Tomorrow I will wake up early. 10. Tomorrow he will wake up at 8:00. 11. They will write a letter in the morning. 12. We will sleep early tonight. 13. They will study English tomorrow. 14. Will you sweep my room too on Sunday? 15. No, we will not sweep your room (We are not sleeping your room). 16. When will you paint your door? It has become very dirty. 17. The plane will come (arrive) at 10:00. 18. We will go to Paris by air (plane) next month. 19. Will you come to our home tomorrow? 20. No, I will come the day after tomorrow. 21. At what time are you going to see Hozan tomorrow? 22. I will see him at 10:30. 23. When will he/she turn on the TV? 24. He/she will turn (it) on soon (after a while). 25. When will Zozan arrive here? 26. He will arrive one hour later. 27. What time will the bus arrive in Mêrdîn? 28. It will arrive at 10:25. 29. Why are you going to sweep? 30. Because, the guests will come (are coming). 31. When will my father phone us? 32. He will phone next month. 33. Will he/she believe you? 34. Yes, he/she will believe me. 35. When and where will you swim? 36. We will swim in the pool in the afternoon. 37. Whom will you miss more? 38. Don't run any more, you will get tired. 39. What will your son become? 40. He will become a teacher. 41. What will they make? 42. They will make an omelette. 43. What will he/she give me? 44. He/she will give you some money. 45. Who will you see? 46. We will see many people. 47. The tailor will sew my jacket. 48. To whom will you take so many fruits? 49. I will take (them) to the prisoners. 50. What are they going to boil? 51. They are going to boil eggs. 52. Where will we stay? 53. We will stay in a hotel.

ÇER KU - AS SOON AS

çer ku acts as a conjunction and forms a subordinate clause together with a verb in **bilanî** when it refers to future time.

1. Çer ku ez bigihêjim wir, ez ê ji te re telefon bikim.
2. Çer ku ez wî bibînim, ez ê jê re bibêjim.
3. Çer ku wan em dîtî, bangî me kirin.
4. Çer ku ew hat, me bi gogê lîst.
5. Çer ku tu gihaşt wir, birayê min bibîne.

1. As soon as I arrive there, I will phone you. 2. As soon as I see him, I will tell him. 3. As soon as they saw us, they called us. 4. We played ball, as soon as he came. 5. See (meet) my brother, as soon as you arrive (there).




JI ZARGOTINA KURDAN



Mêrik diçe malê, dibîne
ku kûçikê wî êrd dixwe.
Radihêle darekî ku li
kûçik bixe. Lê kûçik ber
bi wî tê û diwete. Mêrik
dibêje:

- Bavo, bavo! Tu çima
diwetî, min got ard
xav e, hinavê te yê
biêşe!



xav crude, coarse, raw
ewtin (biewte) *vi*
to bark
rahiştin (rahêle) *vr*
to lift
hinav internal organs

Kevaniya Bîrsar



Rojekê yek diçe malekê dibe mêvan. Kevaniya malê jê re
şorbê çêdike û datîne ber, lê kevçî ji bîr dike. Mêvan dibîne
ku kevanî fahm nake, dibêje:

- Xwişkê! Xwişkê! Ka ji kerema xwe re kêrê bîne!
- Mêvanê ezîz, ma tê kêrê çi bikî?
- Ez ê guhê xwe jêkim, bikim kevçî, şorbê pê bixwim.

bîrsar forgetful

şorbe (f) soup

ezîz dear

Ardû Ji Me Re Çi?



Li gundekî kalek û keça wî hebûn. Havînî gundî giş ji xwe re ardû berhev dikin; keç dibêje:

- Bavo! Em jî ji xwe re ardû berhev bikin.

- Keçê heta ku zivistan bê, ez ê bimirim. Tu ji xwe re berhev dikî, bike.

- Heta ku zivistan bê, ez ê jî mêr bikim. Îcar ardû ji min re çi?

Zivistan tê ne kalo dimire, ne jî keça wî mêr dike. Herdu jî di xanîyê sikûsar de dimînin.

ardû fuel
berhev kirin *vt* to collect

mêr kirin *vr* (a woman) to get married
sikûsar icy

HÎNDARÎ 14

A: Hevokên Jêrîn Wergerînin Kurdî.

1. He is eating an apple.
2. I am reading a newspaper.
3. Are you doing the exercises?
4. We are repeating the new words.
5. Where are you going?
6. They are watching TV.
7. We had breakfast at 7.00.
8. I taught Kurdish to Dara.
9. Did you learn Kurdish?
10. The sun rose.
11. Did you fall?
12. They boiled eggs.
13. What have you (plural) caught?
14. I haven't sewn it yet.
15. Since when has he not come here?
16. We haven't seen them for a long time.
17. Have you not started yet?
18. Have they got tired?
19. Let him go.
20. Don't open the windows, you will catch cold.
21. I will tell you many things.
22. Will she love you?
23. Hasan will rent a house.
24. They will stay here.
25. What will you write?
26. When will they finish this?

B: Hevokên jêrîn wergerînin Dema Pêşî.

1. Ez wî dibînim.
2. Ew derî vedike.
3. Em pir xebitîne.
4. Min ji xwe re vezeleyek kirîye.
5. Me sobe vêxist.
6. Wan televîzyon vekir.


7. Ma hun li otobozê siwar bûn?
8. Hun kengî peya bûn?
9. Wê çi şuşt?
10. Tu wan nas dikî?
11. Ez bûme teral.
12. Bila xwendekar biçin xwendegehê.
13. Wan çi xwastin?
14. We çi xwar?
15. Wî pir xwend.
16. Ma te ode malt?
17. Hun gihastin trêne?
18. Em biskekê peyivîn.
19. Ez bi zimanê xwe dipeyivim.
20. Ew bêrîya me dikin.

C: Cihên vala tijî bikin.


1. Ez bapêşê ketime.
2. Ez herim Diyarbekirê.
3. Kî yê te hez bike?
4. yê pir bibetilî.
5. bêrîya welatê xwe dikim.
6. Ma tixtor ê te binêre?
7. Wan li me guhdarî (Dema Borîya Têdayî)
8. pir henekan dikî.
9. Ew ê te re çi bibêje?
10. Hewa her diçe sar

D: 5 hevokên çewt bibînin.

1. Ez ê sibe xwe bişom.
2. Hun ê meha bê werin?
3. Ez ê çûm malê.
4. Ew ê guhdarî dike.
5. Em ê derî zû girin.
6. Tê rîya xwe kur bikî?
7. Ma hun ê pir bimeşin?
8. Azad dê sibehê li vir be.
9. Bila Mizgîn li vir mîne.
10. Kî yê ji mamoste re dibixwîne?



Ez dizanim otobozê bajom.



-Ma tu kanî lê siwar bibî?
-Erê, ez kanim.




Ew karin elektrîkê vêxin.



Seydo nikane bigihêje wan.



Em kanin zû birevin.
Lê, Seydo nikane.




Mirîşk dikane hêkan bike.



Berfînk zane bi avjenî bilîze.

Ew kane terextorê bajo.



-Hun çi dixwazin?
-Em dixwazin Azad bibînin.




Ew kane bifire.



Em dikarin wî bibînin,
lê ew nikare me bibîne.

Ew zane bi Kurdî binivîse.



Ew dixwazin bi wan re bilîzin.

FERHENGOK

azad free

azadî (f) freedom

beza fast

birçî hungry

birçî bûn vi to be/get hungry

kanîn (bikane) to be able to, can

karîn (bikare) to be able to, can

kenîn (bikene) vi to smile

kirîn (bikire) vt to buy

nezan ignorant, uneducated,
inexperienced

şer (m) war, battle, fight

şer kirin vi to fight

tajî greyhound

têr satisfied, full

têrbûn vi to be/get satisfied/full

Weleh by God

wisa like this, so, such

xuya apparent, visible, seen

xuya ye (ku) apparently

zanîn (bizane) vt to know

KANÎN

kanîn (bikane) means to be able to, can. The following verb must be in bilanî. Kanîn is also used without di- and it takes ni- instead of na- when negated. It also has the form karîn (bikare).

Ez (di)kanim (kanim)

Tu (di)kanî (kanî)

Ew (di)kane (kane)

Em/hun/ew (di)kanin (kanin)

Beq nikane cot bajo.

(cot ajotin vt to plough)

1. Ez kanim biçim wir.
2. Ma tu kanî seet di 6:30'an de hişyar bibî?
3. Erê, ez kanim. Lê tu nikanî ewqas zû hişyar bibî.
4. Ew kane min hişyar bike.
5. Em kanin wî ji vir derxin.
6. Ma hun kanin otobozan bajon?
7. Ew nikanin nuha rûnin.

8. Kes nikane vî agirî vemirîne.
9. Ez kanim wan nas bikim, lê ew nikanin min nas bikin.
10. Tu karî vê bibî malê?
11. Ūso pir jîr e; ew kane li her derê bilîze.
12. Ma hun kanin bigihêjin balafirê?
13. Belê, em kanin.
14. Bawer kane şevê pirtûkekê bixwîne; lê belê Azad nikane mehê pirtûkekê jî bixwîne.
15. Ew pir beza ne, kanin ji tajîyekî zûtir birevin.
16. Ez ji Gulê bezatir im, her tim ji wê zûtir dimeşim.
17. Ev mase pir giran e, em nikanin wê rakin.
18. Osman dibêje, em kanin vî xanîfî bikirin.
19. Tu kanî wan balafiran bibînî?
20. Na, ez nikanim; xuya ye çavên te pir baş in.
21. Mamosteya me kane bi Kurdî bixwîne û binivîse.

1. I can go there. 2. Can you wake up at 6:30? 3. Yes, I can. But you can't wake up so early. 4. He can wake me up. 5. We can take him out of here. 6. Can you drive buses? 7. They can't sit now. 8. Nobody can put this fire out. 9. I can recognize them, but they can't recognize me. 10. Can you take this home? 11. Ūso is very skillful, he can play anywhere. 12. Can you catch the plane? 13. Yes, we can. 14. Bawer can read a book in a night, but Azad can't even read a book in a month. 15. They are very fast, they can run faster than a greyhound. 16. I am faster than Gulê, I always walk faster than her. 17. This table is very heavy, we can't lift it. 18. Osman says, we can buy this house. 19. Can you see those planes? 20. No, I can't, it seems that your eyes are very good. 21. Our teacher can read and write in Kurdish.

The verb following **xwastin** (to want, to ask) must also be in **bilanî**.

1. Ez dixwazim herim welatê xwe.
2. Kî naxwaze bibe dewlemend?
3. Tu dixwazî bi xwe re çî bibî?
4. Ew dixwaze bavê xwe bibîne.
5. Em dixwazin li vê derê rûnin.
6. Ma hun naxwazin li Londonê bimînin?

7. Na, em naxwazin lê bimînin; em dixwazin herin.
8. Em dixwazin wî li vir bihêlin.

1. I want to go to my country. 2. Who does not want to become rich? 3. What do you want to take with you? 4. He/she wants to see his/her father. 5. We want to sit here. 6. Don't you want to stay in London? 7. No, we don't want to stay, we want to go. 8. We want to leave him here.

ZANÎN - TO KNOW

Zanîn (to know (how)) is also used in conjunction with **bilanî**, and like **kanîn**, it is negated with **ni-** and the prefix **di-** is often dropped.

| | |
|--------------|---------------|
| Ez (di)zanim | Em (di)zanin |
| Tu (di)zanî | Hun (di)zanin |
| Ew (di)zane | Ew (di)zanin |

1. Ez navê wî dizanim.
2. Ez zanim biçim malê.
3. Ma tu zanî balafiran bajo?
4. Na, ez nizanî balafiran bajom.
5. Ew zane bi avjenî bilîze.
6. Ew bi avjenî dizane.
7. Em nizanin bi bîlardo bilîzin.
8. Ma hun bi bîlardo dizanin?
9. Ew baş zane bi tîpnivîsê binivîse.
10. Ez gelek peyvikên Kurdî dizanim.
11. Ew pir nezan e; nizane elektrîkê jî vemirîne.
12. Ma tu nizanî li bajarên mezin bigerî?
13. Na weleh, ne zanim û ne jî karim.

Dilê şivên bixwaze, mast jî nêrî çêdike.
Xwastin rûreşîyek e, nedan du rûreşî ye.
şivan shepherd rûreşî (f) disgrace nêrî (m) he-goat

1. I know his name. 2. I know how to go home. 3. Do you know how to fly planes. 4. No, I don't know how to fly planes. 5. He/she knows how to swim? 6. He/she knows how to swim. 7. We don't know how to play billiards. 8. Do you know how to play billiards? 9. He knows how to type very well (He can type very well). 10. I know many Kurdish words. 11. He is very ignorant, he doesn't even know how to switch off the lights. 12. Don't you know how to walk around big cities? 13. No, by God, I neither know nor can.

HÎNDARÎ 15


A: 5 Hevokên Çewt Bibînin.

1. Ez rêya nexweşxanê dizanim.
2. Ez zanim diçim nexweşxanê.
3. Ez karim te dibim xwendegehê.
4. Em kanin hevdu bibînin.
5. Ew bi çi dizane?
6. Tu zanî birevî, lê tu nizanî şer bikî.
7. Hun karin me bibîne.
8. Ew kanin rojekê birçî bimînin.
9. Ma ew zanin bixwîne?
10. Ew kane di sê rojan de biwere.

B: Cihên Vala Tîjî Bikin.

1. Ez karim xwendegehê. (to go)
2. Ma tu bixwîni? (can)
3. Ew dixwaze hêdî (to walk)
4. Em naxwazin dereke me (to hurt)
5. Ma hun şer bikin? (to know)
6. Ew nizanin tiştên erzan (to buy)
7. Ez li vira bikenim. (to want - negative)
8. Ma kî naxwaze her tim? (to smile)
9. Ma tu vê? (to know)
10. Kî çi dixwaze bila bixwaze, ez dixwazim li welatê xwe (to live)

DÎYALOG 8



- Ma tu yê sibe biçî derekê?
- Erê, ez ê herim Îstembolê.
- Qasî ku ez dizanim, tu meha çuyî jî çû Îzmîrê.
- Erê, rast e. Ez du caran çûm.
- Tu çawa kanî ewqas bigerî?
- Karê min wisa dixwaze. Ez pir diçim bajaran.
- Tu bi balafirê yan bi trêne diçî?
- Ez jî balafirê hez dikim; lê belê kanim bi trêne jî biçim.

JI ZARGOTINA KURDAN



Derew derew e, Çi Ceh Çi Genim e

Rojekê yekî dewlefi xwast buxtanekê têxe hustuyê cîranê xwe. Çû cem qazî, got:

- Cîranê min ji çalê du bar genim dizîye.
- Şehadê te kî ye?
- Şehadê min xulamê min e.

Gazî xulam kirin. Qazî got:

- Te çi dîtiye?
- Filankes du bar ceh ji çala axayê min dizî. Min bi çavên xwe dît.
- Kuro, axayê te dibêje genim, tu dibêjî ceh.
- Qazî, derew derew e, çi ceh çi genim e.

buxtan (f) slander
bar (m) load
çal (f) pit, well

derew (f) lie
dewlefi rich
hustu (m) neck

gazî kirin *vt* to call
xulam servant

Bûk û Stûn



Rojekê xwesîyê ji bûka xwe re got:

- Qîzê, qîzê, rabe, hinek ard ji têrê derxe, bîne!

Têr li paš stûnê bû. Bûk rabû, çû destekî xwe ji aliyekî stûnê bir, yê din jî ji aliyê din bir; stûn ket navbeyna her du destan. Kulma xwe tijî ard kir. Dît ku nikane destên xwe ji stûnê xelas bike. Ne bîr bir ku ard vala bike û destê xwe bikişîne, ne jî wanî dikarî destên xwe bikişîne. Xwesû rabû çû bangî gundîyan kir.

- Werin destên bûka min ji stûnê dernakevin!

Gundî hatin, aqil avêtin ser aqilan, gotin:

- Ka em destên wê bibirin!

Birek anîn danîn ser destê wê. Bûkê ji nişka ve destê xwe revand. Ard rijîya erdê û destên wê ji stûnê xelas bûn.

ard (m) flour
aqil avêtin ser aqilan to think over
carefully
birin (bibe) *vt* to take
birin (bibire) *vt* to cut
birek (f) saw

bîr birin *vt* to think of
bûk (f) bride, daughter-in-law
kulm (f) a handful
revandin (birevine) *vt* to let (sb/
sth) escape

stûn (f) column
ûr (f) sack
xelas bûn *vi* to become free
xelas kirin *vt* to free, to liberate
xwesî, xwesû (f) mother-in-law

Xort û Rîsipî



Rojekê civat kom bûye û dipeyive. Rîsipîyekî got:

- Gelo merivek kane çend nanan bixwe?

Xortekî got:

- Apo, ez kanim di carekê de pazdeh nanan bixwim.

Rîsipî:

- Lawo min ji merivan pirsî, ne ji dewaran.

rîsipî (m) elder in a community, grey-bearded

civat (f) meeting, gathering, society

dewar cattle

xort (m) young man

FERHENGOK

anîn (bîne) vt to bring

bîr (f) memory; well

der (f) place

deng (m) sound, voice

dev jê berdan vt to give up

di/der heqê ... de about

dikim nakim I try hard, I do my best

fermo Please! Come in! Help yourself!

ger (f) tour, outing; travel

gerok traveller

her every

hûr little, tiny

hûr kirin to break into small pieces, to chop to pieces; (money) to change

ji kerema xwe (re) please

ji nişka ve suddenly

ji xêndî, ji xeynî except

ji xwe besides; anyway

kes person

lê gerîn vi to look for

lê xistin vt to beat, to hit; to play (an instrument)

lîre (m) lira

pakêt (f) packet

pêxwas vagrant, tramp

rêwî passenger, traveller

rêwîti (f) travel, journey

şil wet

terikandin (biterikîne) vt

to leave, to abandon; to give up

tişt (m) thing

tu any, none

tucarî ever, never

wenda lost, missing

wenda bûn vi to be lost, to disappear

wenda kirin vt to lose

wê gavê then

zuha dry

anîn (bîne) is the contraction of hanîn (bihîne). bih- is contracted to b- in both bilanî and the imperative.

Bila bîne (bihîne).

Bila bînin (bihînin).

Ez bînim (bihînim).

In such contractions, **di(h)-** is usually contracted to **t-**.

Ez tînim (dihînim)/I am bringing(bring). **Em tînin.**

Tu tînî. **Hun tînin.**

Ew tîne. **Ew tînin.**

The indirect objects of **anîn** (to bring to) and **birin** (to take to) are written after them.

Pirtûkê bîne vir/Bring the book here.

Ma te kî anîye gund/Whom have you brought to the village?

Kurên me birin bajar/They took our sons to the cities.

Ew şîr tîne sûkê/He/she brings milk to the market.

We ew birin ku/Where did you take them?

bîr (memory) is used in making certain compound verbs.

ji bîr kirin to forget

ji bîr(a yekî) birin to cause (sb.) to forget (sth.)

bi bîr anîn to remember

hatin bîra yekî to remember

anîn bîra yekî to remind

Note that **yekî** is the oblique of **yek** (somebody). It indicates that the nouns/pronouns used instead must be in the **oblique**.

1. **Ez tiştan zû ji bîr dikim.**

2. **Ma te navê min ji bîr kiriye?**

3. **Bibore, min ji bîr kir, lê belê nuha cardin hat bîra min.**

4. **Ez her tim tiştinan ji bîr dikim, lê ew tîne bîra min.**

5. **Ev mirov tiştan pir ji bîr dike; ji bîra min jî dibe.**

6. **Wî ev anî bîra min.**

1. I forget things quickly (easily). 2. Have you forgotten my name? 3. Sorry, I forgot, but now I (have) remembered (again). 4. I always forget some things, but he/she reminds me. 5. This person often forgets things; he also causes me to forget. 6. He reminded me of this.

CÎNAVÊN NEBINAVKIRÎ INDEFINITE PRONOUNS

herkes everybody

kesek somebody

tukes anybody

hertişt everything

tişte something

tutişt anything

herder everywhere

derek somewhere

tuder anywhere

Note that **kes** and **tişt** are masculine, and **der** is feminine.

Oblique: kesî, tukesî, tişteki, hertiştî, derekê, herderê, etc.

1. **Herkes hatiye.**

2. **Ez herkesî dibînim.**

3. **Ev welat ji herkesî re ye.**

4. **Tukes nehat.**

5. **Ma te ji tukesî re got?**

6. **Nehat bîra tukesî.**

7. **Tukesê min tune.**

8. **Hertişt ji bîra min çû.**

9. **Ez ê hertiştî bînim bîra xwe.**

10. **Hertiştê wan heye.**

11. **Min tutişt nedît.**

12. **Wî tutişt neanî bîra min.**

13. **Tutiştê te tune.**

14. **Tukes tutiştî nizane.**

15. **Ew ji min re tutiştî nabêje.**

16. **Herder gemarî ye.**

17. **Ez li herderê lê gerîyam.**

18. **Ew li herderê hene.**

19. **Ez diçim herderê.**

20. Min ew li tuderê nedît.

21. Tuderê vî welatî ne xweş e.

22. Tuder ji welatê min ne xweştir e.

1. Everybody has come. 2. I (can) see everybody. 3. This country is for everybody. 4. Nobody has come. 5. Did you tell anybody? 6. Nobody remembered. 7. I have got nobody. 8. I forgot everything. 9. I will recall everything. 10. They have everything. 11. I didn't see anything. 12. He didn't remind me of anything. 13. You have nothing. 14. Nobody knows anything. 15. He doesn't tell me anything. 16. Everywhere is dirty. 17. I looked for it everywhere. 18. They are everywhere. 19. I go everywhere. 20. I did not see it anywhere. 21. Nowhere is nice in this country. 22. Nowhere is nicer than my country.

Kesek, tiştek and derek are also used to express such pronouns as **somebody/anybody, something/anything** and **somewhere/anywhere**.

1. Min kesek nedît.

2. Kesek li malê tunebû.

3. Ji kesekî re nebêje.

4. Kesekî bangî me nekir.

5. Ma kesekî wan tuneye?

6. Tiştek nabe.

7. Min tiştek ji bîr kiriye, lê belê ez nizamim çi ye.

8. Ew ji tiştekî hez nake.

9. Ji min re tiştekî bibêje ez biçim.

10. Ma tiştekî wan jî tuneye.

11. Rabe, em biçin derekê.

12. Ma em ê biçin kuderê? Herder girtî ye.

13. Tu kanî me bibî dereke din?

1. I didn't see anybody. 2. Nobody was at home. 3. Don't tell anybody. 4. Nobody called us. 5. Haven't they got anybody? 6. Nothing will happen (also Never mind). 7. I have forgotten something, but I don't know what it is. 8. He doesn't like anything. 9. Tell me something and I'll go. 10. Don't they have anything? 11. Get up, let's go somewhere. 12. Where will we go? Everywhere is closed. 13. Can you take us somewhere else?

Kes, der and tişt can also be used alone.

1. Ma kes hatiye?

2. Na, hîna kes nehatiye?

3. Ez naxwazim tu vî tiştî ji kesî re bibêje.

4. Ma kesî diravê te hûr nekir?

5. Dera herî baş ev e.

6. Li vê derê tişt tune.

7. Ev tişt ji gişan xerabtir e.

1. Has anybody come? 2. No, nobody has come yet. 3. I don't want you to tell this (thing) to anybody. 4. Didn't anybody change your money? 5. The best place is this. 6. There is nothing here. 7. This thing is worse of all.

1. Di heqê rêwîtiya xwe de ji me re tiştekî bibêje.

2. Min cixare terikandiye, lê belê tiştekî pir dijwar

3. Di vê pakêtê de tiştekî giran heye.

4. Azad gerok e, li her derê digere.

5. Evdo kesekî pir xurek e. Tucarî têr nabe.

6. Ji vê derê tiştek xuya nabe, em biçin dereke din

7. Ji xêndî yekî, rêwîyên otobozê giş mamoste ne.

8. Min tiştek wenda kiriye, ez li tuderê nabînim.

9. Mizgîn li çi digere? Ma tiştekî wî wenda bûye?

10. Ew her tim tiştekî xwe wenda dike.

11. Ev çi deng e? Ma hinek li derî dixin?


1. Tell us something about your journey. 2. I have given up smoking, but it is something very difficult. 3. There is something heavy in this packet. 4. Azad a traveller; he travels everywhere. 5. Evdo is very gluttonous. He is never satisfied? 6. Nothing is (can be) seen from here, let's go somewhere else. 7. the passengers in the bus are teachers except one. 8. I have lost something can't find it anywhere. 9. What is Mizgîn looking for? Has he lost something? He always loses something (of his). 11. What is that sound? Is somebody knocking at the door?

HÎNDARÎ 16

Dîyalogên Jêrîn Wergerînin Tirkî.


Translate the following dialogues into Kurdish.

- I -



- Tu li çi digerî? Ma te tiştek wenda kiriye?
- Belê, min tiştek wenda kiriye. Ji xêndî bin xaliçê, min li her derê odê nêrî. Lê min nedît.
- Carinan meriv tiştinan li derinan ji bîr dike û li herderê li wan digere, cardin jî nabîne. Lê çend roj diborin, ji nişka ve tê bîra meriv.
- Ez dikim nakim nayê bîra min.

- II -



- Di pakêta min de çar cixare mane. Di ya te de tu cixare maye?
- Na, lê bes e. Dudu ji te re dudu ji min re.
- Na, ez pir dikişînim. Ez ê pakêteke nû bikirim.
- Dev jê berde. Ji xwe perê me yê hûr jî tune. Kes ji me re vî perî hûr nake.
- Bisekine, ez ji vê dikanê bipirsim.
- Hun dikanin ji kerema xwe vî perî hûr bikin.
- Belê, fermo. Diravê min ê hûr pir e.
- Gelek sipas. Wê gavê, pakêtek cixare jî dixwazim.
- Êdî bimeşe. Te cixare jî kirî. Tiştek nema.
- Tu wan mirovan dibînî?
- Pêxwasên serxweş in. Zû em ji vir biçin.

FERHENGOK

amojin (f) paternal uncle's wife
ap (f) paternal uncle
avêtin (bavêje) vt to throw
balkêş interesting
baş kirin vt to improve; to cure
çîrok (f) story
dan ser hev vt to save up
dawî (f) end
dikan (f) shop
diyarî (f) gift, present
firotin (bifiroşe) vt to sell
gewrî (f) throat; strait
hêvî (f) hope
hêvî kirin vt to hope
hîdrojen (f) hydrogen
ji bo, ji bona for
ku that
kevir (m) stone
masî (f) fish
met, metik (f) paternal aunt
mezin bûn lng to grow (up), to become bigger/larger
nexweş ketin vi to become ill

oqsîjen (f) oxygen
peyde (pêde) kirin vt to obtain, to find
pêwîst necessary
pirtûkfiroş bookseller
pisîk cat
qerax (f) edge, side
qozî (f) corner
qunc, quncik (f) corner
rûnişte (f) bench
şêx (m) head of a group of dervishes, sheikh
şikandin (bişikêne) vt to break
tengav (f) strait
wêne (m) picture, drawing, photo
xal (m) maternal uncle
xalojin (f) maternal uncle's wife
xaltîk (f) maternal aunt
xerab bad
xizmet (f) service
zem(ayekî) kirin vt to backbite, to speak ill of sb.

INFINITIVES AS NOUNS

Kurdish infinitives may also be used as nouns. All such nouns are feminine and take feminine endings. The infinitives of compound verbs made up of two or more words are written as one single unit, when used as nouns.

1. **Ez bi Kurdî hîn bûm.**
Hînbûna zimanekî ne hêsan e.
2. **Tu pir zema mirovan dikî.**
Ez ji zemkirinê hez nakim.
3. **Ma te ji xwe re xanîyek peyde kir?**
Na, peydekirina xanîyekî ne hêsan e (xanî peydekirin ne hêsan e).
4. **Xweha min nexweş ket.** Me bir cem şêx. **Wî got,** "Ez ê wê baş bikim.", lê belê hîn jî baş nebûye.
5. **Ma tu ji şêx çî başkirinê hêvî dikî?** Hêvîkirin baş e, lê belê ne ji şêxan.
6. **Zanîna nexweşîyê nêvîyê başkirinê ye.**
7. **Axa tim dixwaze meriv xizmeta wî bike; ew ji xizmetkirinê hez nake.**
8. **Tu pir dirav didî ser hev, ma tu yê tişte** dikî? **Erê, ez dixwazim erebeyekê bikirim, lê ez dizanim kirîna ereban ne hêsan e.**
9. **Zû nivîsîn baş e, lê rast nivîsîn pêwîst e.**
10. **Ma tu bi xwendin û nivîsîna Kurdî dizanî?**
Na ez tenê bi Kurdî dipeyivim.
11. **Terikandina cixarê pir dijwar bû.**

1. I learnt Kurdish. Learning a language is not easy. 2. You speak ill of people a lot. I don't like backbiting. 3. Have you found a house for yourself? No, finding a house is not easy. 4. My sister became ill, we took her to the sheikh. He said, "I will cure her.", but she hasn't recovered yet. 5. What cure are you expecting from the sheikh? Hoping is fine, but not from sheikhs. 6. Knowing the illness is half the cure. 7. Agha always wants someone to serve him; he doesn't like serving

(sb.). **8.** You are saving up a lot, are you going to buy something? Yes I want to buy a car, but I know buying cars is not easy. **9.** Writing fast is fine, but writing correctly is necessary. **10.** Can you write and read in Kurdish? (Do you know the writing and the reading of Kurdish?) No, I (can) only speak Kurdish. **11.** It was very difficult to give up smoking. (Giving up smoking was very difficult.)

The elements of the infinitive of a compound verb can be separated by a word used between them.

1. **Xizmeta axê kirin ne xweş e.**
2. **Zema mirovan kirin ne baş e.**
3. **Hînî Kurdî bûn pêwîst e.**
4. **Bi Kurdî hînbûn pêwîst e.**
5. **Lêxistina mirovan ne karê me ye.**
6. **Li mirovan xistin ne karê me ye.**
7. **Li tişteki gerîn ne xweş e.**
8. **Ji bo peydekirina tişteki lêgerîn pêwîst e.**

1. Serving the Agha is not nice. 2. Speaking ill of people is not good. 3. Learning Kurdish is necessary. 4. Learning Kurdish is necessary. 5. Beating people is not our job. 6. Beating people is not our job. 7. Looking for something is not nice. 8. One needs to look for something in order to obtain it.

Linking nouns to prepositional phrases

It is the same as in English except that in Kurdish the noun must take the appropriate connective ending.

Zilam li kêleka masê ye/The man is beside the table.

Zilamê li kêleka masê/The man beside the table.

Pirtûk li qozîya masê ye/The book is on the corner of the table.

Pirtûka li qozîya masê/The book on the corner of the table

Pirtûka li qozîya masê baş e/The book on the corner of the table is good.

Zilam li ber derî ye/The man is in front of the door.

Zilamê li ber derî/The man in front of the door

Zilamê li ber derî Reşat e./The man in front of the door is Reşat.

Wêne li dîwêr in/The paintings are on the wall.

Wêneyên li dîwêr/The paintings on the wall

Wêneyên li dîwêr rengin in/The paintings on the wall are coloured.

1. **Pirtûka di çentê wî de pir balkêş e.**
2. **Jina li kuçê amojina min e.**
3. **Zilamê di erebê de apê min e.**
4. **Pisîka li ser rûnişteki ya min e.**
5. **Masîyên di masîdankê de pir xweşik in.**
6. **Te masîyên di masîdankê de çi kirin?**
7. **Zilamê li paş me çi got?**
8. **Jinên di birkê de bi avjenî dilîzin.**
9. **Heba di sarkerê de pir baş e.**
10. **Solên di quncika odê de yên me ne.**

1. The book in his bag is very interesting. 2. The woman in the street is my aunt. 3. The man in the car is my uncle. 4. The cat on the bench is mine. 5. The fish in the aquarium are very nice. 6. What did you do with the fish in the aquarium? 7. What did the man behind us say? 8. The women in the pool are swimming. 9. The tablet in the fridge is very good. 10. The shoes in the corner of the room are ours.

KU - THAT

Kurdish **ku** equates the English conjunctions such as **that, who, whom, whose, which, where,** etc.

Wî ji min re çîrokek got/He told me a story.

Çîrok pir balkêş bû/The story was very interesting.

Çîroka ku wî ji min re got/The story that he told me

Çîroka ku wî ji min re got pir balkêş bû/The story that he told me was very interesting.

Te radyoyek firot min/You sold me a radio.

Radyoya ku te firot min /The radio which you sold me

Radyo ne baş bû/The radio was not good.
Radyoya ku te firot min ne baş bû/The radio which you sold me was not good.

1. Nameya ku wê nivîsî ya herî balkêş e.
2. Pênûsa ku min wenda kir diyariya bavê min bû.
3. Ava ku em vedixwin ji oqsîjen û hîdrojenê çêdibe.
4. Kevirê ku kur avêt pace şikand.
5. Jina ku bi xalê min re dipeyive xalojina min e.
6. Jina ku Mizgîn dirav jê stend meta wî ye.
7. Ji tengava ku em lê gerîyan re dibêjin Gewrîya Îstembolê.
8. Zilamên ku li qeraxa deryayê bi gogê dilîzin Kurd in.
9. Do li cem pirtûkfiroşekî min pirtûka ku te got, "pêde nabe" dît.
10. Pirtûka ku te digot pêde nabe min do li cem pirtûkfiroşekî dît.
11. Jina ku zema te dike xaltîka Eysanê ye.
12. Pisîka ku tu dibêjî her tim tê mala me.
13. Min wênayên ku te kişandin şandin ji apê xwe re.
14. Bajarê ku ez lê mezin bûm li qeraxa deryayê ye.
15. Tiştên ku ji me re ne pêwîst e bavêjin.
16. Otela ku bavê min lê ma ya yekî pir dewlemend bû.
17. Nameya ku Azad ji min re anî ji apê min hatiye.
18. Keça ku tu lê digerî seetek berê çû.

1. The letter which she wrote is the most interesting one. 2. The pen that I lost was my father's present. 3. The water which we drink is made of oxygen and hydrogen. 4. The stone that the child threw broke the window. 5. The woman who is talking with my uncle is my aunt. 6. The woman from whom Mizgîn took money is his aunt. 7. The strait where we toured is called the Bosphorus. 8. The men playing ball at the seaside are Kurdish. 9. Yesterday, I saw the book that you said, "it is not available", in a bookshop. 10. Yesterday, I saw the book that you said, "it is not available", in a bookshop. 11. The woman speaking ill of you is Eysan's aunt. 12. The cat that you mention always comes to our home. 13. I sent the photos that you took to my uncle. 14. The city where I grew up is at the seaside. 15. Throw away the things that we don't need. 16. The hotel where my father stayed belonged to a very rich person. 17. The letter that Azad brought me is (has come) from my uncle. 18. The girl for whom you are looking went (left) an hour ago.

**Dilê ku xem tê de be,
bi heft derfan şa nabe.**

**Kesê ku ji yekê fahm nake,
ji sedî jî fahm nake.**

derf (f) drum
fahm kirin vt to understand

şa happy
xem (f) sadness

TIŞTANOK

**Ew kî ye
Ku mehê carekê kal dibe,
Dimire,
Û dîsa tê dinyê?**

FERHENGOK

alî (m) side
alîkar assistant, aide, helper
alîkarî (f) help, assistance
alî kirin vt to help
alîkarî kirin vt to help
Amed Diyarbakir
an na if not, or not
axir(ê) fortunately, it's good that
bakur (m) north
başûr (m) south
Bijî! Well done, Long Live!
bi şûn de/ve back, backwards
borî (f) pipe
çep left
çiçek (f) flower
dan, dahn (m) shift, session
danîn (deyne, dîne) lg to put (down), to lay down, to set down
daxistin (daxe) vt to bring down, to take down
daketin (dakeve) vi to come down, to go down
derketin (derkeve) vi to go out, to come out, to get out
derxistin (derxe) lg to take out, to bring out
di nav ... de among
diransaz, diranker dentist
dom kirin vt to continue, to last
fermo please, help yourself
girtî prisoner
girtîgeh (f) prison
hêşînahî (f) greenness, greenery
hêl (f) side

ji dêvla/dewsa instead (of)
ji pêyan on foot, standing up
kelem (m) cabbage
kilîd (f) lock
li derve out, outside
lobî bean(s)
mifte (f) key
nexşe (f) map
nûçe (f) news
polik pea(s)
qal (f) subject, topic
qal(a tiştêkî) kirin vt to mention, to talk about
qufil (f) padlock
rast right (direction)
rêber guide
rayê/rê dan vt to show
Ruha Urfa (A Kurdish city)
serdan (f) visit
serdanvan visitor
sewze vegetable
şanî (yekî) dan/kirin vt to show
tevde together
tê re through
wa ye there, there it is
werê so
xas (f) cos, lettuce
xewlî (f) towel
xox (f) peach
zîvirandin (bizîvirîne) vt to turn (sth)
zîvirîn (bizîvire) vi to turn (back), to return

NOUN PHRASE AS MODIFIER

Nouns may be modified by noun phrases. This involves more than one connective ending. In this case, only the last word is in the oblique case, that is if the last word is a noun.

rengê pênuşê the colour of the pen
pênuşa keçê the pen of the girl
rengê pênuşa keçê the colour of the pen of the girl
rengê pênuşa keça Zelalê
 the colour of the pen of the daughter of Zelal

Note that the nouns are **in the oblique case (penûşê, keçê, Zelalê)**, when used as the last word.

The last word can also be an adjective or an oblique pronoun.

rengê pênuşa dirêj the colour of the long pen
rengê pênuşa wî the colour of his pen
dengê awa kanîyê the sound of the water of the fountain

A possessive and an adjective modifying the same noun

The possessive (possessor) is written after the head noun, then in order to connect the second modifier to the head noun, the ending of that head noun is repeated.

keça min a dirêj my tall daughter
kurê min ê nexweş my sick son
karkerên min ên baş my good workers
xwendekarekî min î Kurd a Kurdish student of mine
xwendekareke min e Kurd a Kurdish student of mine

Note that the endings take **y** after a vowel.

| | |
|------------------------------|-----------------------------|
| mamosteyê wî yê kin | his short teacher (masc.) |
| mamosteya wî ya kin | his short teacher (fem.) |
| mamosteyên wî yên kin | his short teachers (plural) |

1. **Xwendekarên me yên ku te do dîtin pîr jîr in.**
2. **Pênûsa min a ku bavê min ji min re kirî şîr e.**
3. **Apê wî yê mamoste nehat.**
4. **Mamosteyekî min î Kurd heye.**
5. **Min ew da keçeke te ye xwendekar.**

1. Our students whom you saw yesterday are very hard-working. 2. My pen which my father bought for me is blue. 3. His uncle who is a teacher didn't come. 4. I have a Kurdish teacher. 5. I gave it to a daughter of yours who is a student.

ketin (to fall) and **xistin** (to cause sb/sth to fall, to drop) change their meanings, when used before an oblique noun (a place, a container, etc.).

| | |
|------------------------------|------------------------------|
| ketin derekê/tîşteki | to enter, to come/go in/into |
| xistin derekê/tîşteki | to put in/into, to insert |

Diz di pacê re ket odê/The thief entered the room through the window.

Me pirtûkên xwe xistin çentan/We put our books into the bags.

tê re (through), is the contraction of **di wê re**.

Av di borîyê re diherike. The water is flowing through the pipe.

Ew tê re naçe. It doesn't (can't) go through it.

1. **Jina Azad ji nişka ve ket odê.**
2. **Diz ketiye malê.**
3. **Ma hun kengî ketin hundir?**
4. **Mar ketine xaniyan.**
5. **Ev zebeş pîr mezin e, nakeve sarkerê.**
6. **Li welatê me derya tune, em dikevin birkan; lê ez**

dizanim hun her tim dikevin deryayê.

7. **Min gişa pirtûkan xistin çente.**

8. **Te çi xist sarkerê?**

9. **Destê xwe nexer bêrika xwe.**

1. Azad's wife suddenly entered the room. 2. (A) thief has entered the house (The house has been robbed). 3. When did you go in? 4. Snakes have entered the houses. 5. This water-melon is very large, it doesn't go (fit) into the fridge. 6. There is no sea in our country, we swim in pools; but I know you always swim in the sea. 7. I put all of the books into the bag. 8. What did you put into the fridge? 9. Don't put your hand into your pocket.

ketin and **xistin** may also be used with **tê**: **têketin**, **têxistin**.

Note that **tê** is the contraction of **di wê/wî**.

1. **Têkeve xênî, leşker tîn.**

2. **Di malê keve, leşker tîn.**

3. **Vê pênûsê têxe bêrika xwe, bila ji te re be.**

4. **Germ e, ka em têkevin deryayê.**

5. **Ez ê zebeş têxim sarkerê, bila sar bibe.**

6. **Ji kerema xwe, van têxe çenteyekî.**

7. **Ew ê gişa girtîyan di girtîgehê xin.**

8. **Ew ê gişa girtîyan têxin girtîgehê.**

1. Go inside the house, the soldiers are coming. 2. Go inside the house, the soldiers are coming. 3. Put this pen into your pocket, I'd like you to have it. 4. It's hot, let's swim in the sea. 5. I am going to put the water-melon into the fridge, so that it becomes cold. 6. Please put these into a bag. 7. They will put all prisoners in the prison. 8. They will put all prisoners in the prison.

ketin and **xistin** are also used with preverbals; **derketin** (to go/come out), **derxistin** (to take/bring out), **daketin** (to come/go/climb down), **daxistin** (to take/bring down), etc.

1. **Serdanvan ji girtîgehê derketin.**

2. **Me pênûsên xwe derxistin, lê belê me tîşteki nenivîst.**

3. **Ma tu yê kengî ji wê darê dakevî?**

4. **Ji kerema xwe wî ji darê daxe, ew ê bikeve xwar.**

5. **Ez vêsê çûm girtîgehê ji bo serdana kurê xwe, lê belê**

em pir zû derxistin, ez baş bi wî re nepeyvîm.

6. Miftê têxe kilidê.

7. Ev qufil ne baş e, ez nikanim miftê têximê.

1. The visitors got out of the prison. 2. We took our pens out, but we didn't write anything. 3. When are you going to climb down that tree? 4. Please bring him down the tree, he'll fall down. 5. I went to the prison to visit my son this morning, but they took us out very soon, I didn't speak to him properly. 6. Put the key into the lock. 7. This padlock is not good, I can't put the key into it.

rast (right) and çep (left) are usually used with hêl and alî (side, direction).

1. Xanîyê me li hêla rastê ye.

2. Bizîvire alîyê rastê.

3. Min mifte ber bi hêla çepê ve du caran zîvirand, derî vebû.

4. Li alîyê çepê du xanî û li alîyê rastê jî çend dar hebûn.

1. Our house is on the left. 2. Turn right. 3. I turned the key left twice, (and) the door opened. 4. There were two houses on the left and few trees on the right.

alî (side) also helps to form words meaning help, helper, to help, etc.

1. Alî min bike, ev kar pir dijwar e.

2. Ma ev keç alîkara te ye?

3. Ez vê alîkarîyê* ji bîr nakim.

4. Ma kurên te jî alîkarîya te nakin?

1. Help me, this work is very hard. 2. Is this girl your assistant? 3. I won't forget this help. 4. Are your sons not helping you either?

ji pêyan is usually pronounced as jîpya or şîpya in the spoken language.

Em pir ji pêyan sekinîn/We stood up for a long time.


Jîpya bisekinin/Stand up.

Ma em ê heta kengî şîpya bin/How long are we going to stand up?

(*) alîkarî is spelled as arîkarî in some regions.

HÎNDARÎ 17

A: Baş bixwînin, dûre pirsan bersîv bikin.



Azad ji sûkê tê. Di destê wî de çenteyekî tijî heye. Xuya ye wî gelek tişt kirîne.




Nuha derî vekiriye, ber bi sarkerê ve diçe.



Hat ber derîyê mala xwe; mifte ji hêrîka xwe derxist, xist kilidê tê de carekê zîvirand.

Lîber sarkerê sekinî, çente danî erdê û hêdî hêdî vala kir. Xox, xas, kelem, polik, lobî û gelek sewze û hêşnahîyên din hebûn; giş xistin sarkerê.





Îcar ew ê destên xwe bişo.

Destên xwe şuştine, li metbexê rûniştîye. Hat bîra wî ku mast û penîr nekirîne. Lê êdî dereng bû. Di dilê xwe de got, "Careke din ez ê bikirim".

Nuha ew û jina xwe, Zînê, tevde firavîne dixwin.

- Te rojname xwendîye.

Çi nûçe hene?

- Tiştêki pir balkêş tune. Lê te ev wêne dîtîye? Ev xaniyê di nav daran de çiqas xweş e!


- Erê wele.

- Ma tu çûyî cem diransaz?

- Na ez neçûm. Ji xwe ez naxwazim herim. Ew ê diranê min bikişîne.

- Ji ber vê yekê jê re dibêjin dirankêş jî. Ma tu naxwazî êşa diranê te bisekine?

- Belê, ez çî bikim, ez ê piştî firavîne herim diranê xwe rê wî bidim. Lê ka em qala tiştêkî din bikin. Ez êdî naxwazim qala diranan bikim.



1. Azad ji ku tê?
2. Di destê Azad de çi heye?
3. Azad mifte çend caran zîvirand?
4. Azad mifte di ku de zîvirand?
5. Ma Azad mast û penîr kirîne?
6. Di çentê Azad de çi hebûn?
7. Azad li ku rûnişt?
8. Azad û Zînê pevra çi kir?
9. Ma Azad dixwaze qala diranan bike?
10. Di rojnamê de tu nûçeyên balkêş hene?

B: Bixwînin û Pirsan Bersîv Bikin.

XWENDEGEH

Em biskê qala xwendegehê bikin. Xwendekar ji Duşemê heta Îniyê hero tî xwendegehê. Roja Şemî û Yekşemê nayên; ew roj betlane ne. Ders sibehîni seet di nehan de dest pê dikin û di dozdeh û nîvan de diqedin. Firavîn di navbeyna dozdeh û nîv û dudan de ye. Hin xwendekar ji bo firavîne diherin malê hin jî li xwendegehê dixwin. Dahnê nîro seet di dudan de dest pê dike û heta seet çaran dom dike. Xwendekar pîrîcar li malê hîndarîyan çêdikin. Ka em li fêrgehekê binêrin:

Mamoste: Ev nexşeyê welatê me ye. Ev Bakur û ev jî Başûrê welatê me ye. Min do ji we re navên çend bajarên gotin û şanî we dan, ma tî bîra we?


Xwendekar (giş bi hev re): Erê mamoste!

M: Em ê Amedê bibînin. Şevîn were vir.

Ş: Fermo mamoste!

M: Ka Amed li ku ye?

Ş: Va ye.



M: Baş e. Nuha Ruhayê şanî me bide.

Ş: Va ye.

M: Bijî Şevîn, te pê derxist. Tu kanî rûnî. Îcar bira Bawer Wanê rê me bide.

B: Va ye, mamoste.

M: Entab?

B: Va ye.

M: Ev nebû. Te bi yekê derxist, bi yekê dernexist. Careke din baş guhdarî bike. Ez dizanim tu kurekî zîrekî, lê belê tu baş guhdarî nakî. Em ê hîndariyekê çêkin. Pênûsên xwe derxin û navên çar bajarên cîranên hev binivîsin.

Xwendekarek: Pênûsa min wenda bûye.

M: Axirê tu xwe wenda nakî. Yekê ji berkêşka min derxe. Hesen!!!

H: Fermo mamoste!

M: Ma te karê xwe qedandiye?

H: Bîbore mamoste min hîna neqedandiye.

M: Ji dêvla peyivînê li karê xwe binêre, an na ez nahêlim tu seet di çaran de biçî malê.

1. Mamoste ji kê re dibêje, "Tu kurekî zîrekî?"

2. Xwendekar kîjan rojan naçin xwendegehê? Çima?

3. Firavîn kengî ye?

4. Mamoste çi şanî xwendekaran dide?

5. Ma Şevînê bi pirsên mamoste derxistin?

6. Hesen çi dike?

7. Xwendekar'ê navên çi binivîsin?

8. Xwendekarekê çi ye xwe wenda kiriye?

DIVÊTÎN

The infinitive of **divêtin** also has the forms **vîn** and **vên**. It has two usages: **must**, **ought to** and **to need**. The present conjugation is **divê** or **divêt** for all persons.

1) must

A: **divê** + **bilanî**

Divê ez biçim.

I must go.

Divê tu ji malê dernekevî.

You mustn't leave home.

Divê ew bizîvire hêla rastê.

He/she must turn right.

Ma divê em alî wan bikin?

Must we help them?

Divê hun wê şanî me bidin.

You must show it to us.

Divê rêber di pêşîya me de bimeşe/The guide must walk in front of us.

B: oblique pronoun + divê + bilanî (not in common use)

Min divê ez destên xwe zuha bikim/I must dry my hands.

Te divê tu pirtûkan rayê me bidî/You must show us the books.

Wî divê ew alîkarîya me bike/She must help us.

We divê hun qufileke nuh bikin/You must buy a new padlock.

Wan divê ew tevde werin/They must come together.

2) to need, to be necessary

oblique pronoun + noun + divê

Min mifteyek divê.

I need a key.

Te çi divê? Ji min re bibêje.

What do you need? Tell me.

Wî hinek hêşînahî divê.

He needs some greenery.

Wê mamosteyekî baş divê.

She needs a good teacher.

Ma me tiştêk divê?

Do we need something?

We xanî divê.

You need a house.

Wan bijîşk divê.

They need a doctor.

It is negated with **na-**.

Min tiştêk navê.

I don't need anything.

Te navê tu biçî malê.

You don't need to go home.

Wî hevalên wek te navê.

He doesn't need friends like you.


Bilanî may be negated too.

Divê em dereng nemînin/We mustn't be late.

Divê hun wan ji hundîr dernexin/You must not take them out.

Divê tu bi min re wanî nepeyivî/You must not speak to me like that.

Divê ew nezîvire alîyê rastê/He/she must not turn right.




Wê hevalek divê.



Divê ew bireve, dereng maye.




Divê tu cixare nekişîni.





Divê ez destên xwe bişom.

Divê ew bizîvire hêla rastê.



Wan mifte divê.



Wan dirav divê.





Divê ez rakevim.

Birûsk sîwan divê, lê belê Xelo navê.



Divê ew êgir vemirîne.

Wî mifte navê.



Otoboz sekîniye, wî rev navê.




HEKANÎ CONDITIONAL

The conditional is simply one of the following words (all meaning **if**) plus **bilanî**: **hek**, **heke**, **ku**, **heger**, **eger**, **ger**.


Note that together with **jî** it means **even if**.

1. Hek tu sîwana xwe bi xwe re nebî, tu yê şil bibî.
2. Heke ez te nebînim, ez ê ji bavê te re bibêjim.
3. Ku ew neyê, ez jî narim.
4. Heger em bizîvirin hêla rastê, em ê têkevin rêya xwendegehê.
5. Heke hun ji malê derkevin, ji kerema xwe, pakêtek cixare bikin.
6. Heger ew bi şûn ve werin, ez ê ji wan re bibêjim.
7. Hek perê wî hebe jî, ew nade te.
8. Hek em birevin jî, em ê dereng bimînin.
9. Hek tu telefon bikî jî, ew bi te re napeyive.
10. Hek em şivê zû bixwin, em kanin biçin sînemayê.
11. Hek tu ji darê danekevî, ez ê ji bavê te re bibêjim.

1. If you don't take your umbrella with you, you will become wet.
2. If I don't see you, I will tell your father.
3. If he/she doesn't come, I don't/won't go either.
4. If we turn right, we will take (enter) the road to the school.
5. If you go out, please buy a packet of cigarettes.
6. If they come back, I will tell them..
7. Even if he has got money, he won't (doesn't) give it to you.
8. Even if we run, we will be late.
9. Even if you phone, he won't (doesn't) talk to you.
10. If we have an early dinner, we can go to cinema.
11. If you don't climb down the tree, I will tell your father.



Çiyayê Sêsalî



Rojekê du heval di rê de diçin. Yek wê derê nas dike, yê din nas nake. Çiyayekî mezin dibînin. Yê ku wan deran nas nake dipirse:

- Navê vî çiyayî çi ye?
- Navê vî çiyayî Sêsalî ye.
- Errik! Xwedê emir nedê! Hek sêsalî ewqas bilind be, ew ê çarsalî çiqas bilind bibe?

emir (m) age

Errik! How amazing!

Ez Ne Ji Vî Gundî Me



Şevêkê rêwîyek di gundekî re derbas dibe, dinêre, du merivên kêmaqil li hêvê dinêrin û qareqara wan e. Yek dibêje,

- Hêv e!

Yê din dibêje:

- Roj e!

Dawîyê li hev dixin. Çav li rêwî dikevin, disekinin, dibêjin:

- Ev mêrik ne dîn e. Em ê ji wî bipirsin.

- Bira, em ketine şer. Ez dibêjim, "Ev hêv e". Ew jî dibêje, "Na, roj e". Divê tu bibêjî çi ye.

Rêwî difikire, hek bibêje roj e, ev ê li wî xe, hek bibêje hêv e, yê din ê li wî xe. Difikire, difikire û dibêje:

- Gelî birayan, ez ne ji vî gundî me, ez nizamim.

Herdu dîn jî ker dibin û dibêjin:

- Hek wanî ye, di rêya xwe de here, tu ji me dîntir î.

derbas bûn *vi* to pass (by)
dawîyê at last, in the end
kêmaqil fool

dîn mad
ker deaf; silent
qareqar (f) bitter cry

rêwî traveller
li hev xistin *vi* to fight
çav lê ketin *vi* to realize

Kurê Feqîr

Yekî ji hevalê xwe re got:

- Kurekî min heye.

Hevalê wî got:

- Xwedê ji te re bihêle.

Got:

- Tu nizanî çiqas feqîr e.

Hevêl got:

- Xwedê bihêle.

Got:

- Hek tu çêran jê re bikî, bersîva te nade.

Hevêl got:

- Xwedê ji te re bihêle.

Got:

- Hek tu lê xî, destê xwe ranake.

Hevêl got:

- Xwedê bihêle.

Got:


- Kuro, mêş xwe datînin ser enîya wî, mêşan naqewirîne.

Hevêl got:

- Xwedê ji te re nehêle!!

çêr (f) swearword, cuss
çêr kirin vt to swear
feqîr poor; quiet

qewirandin (biqewirîne) vt to drive/send (sb) away
xwe danîn ser vt to perch on
Xwedê bihêle My God save him (God bless him)



FERHENGOK

aciz bored, annoyed

agahdar kirin vt to inform

azib bachelor, single

berdan (berde) vt to leave, to let go; to divorce

beşdar bûn vi to participate, to attend

bi ser ketin vi to succeed, to be successful

bi xew ve çûn vi to fall asleep

çayxane (f) teahouse, cafe

dev lê kirin vt to bite

dîn mad

emr, emir (m) age

êrîş (f) attack

êrîş kirin vt to attack

helîn (bihele) vi to melt (down)

kej blond, fair-haired

kuştin (bikuje) vt to kill

kuxik (f) cough

kuxîn (bikuxe) lng to cough

kûçik dog

li gor, li gora according to

li pê/pey following, after

meriv person, human being; relative

mirin (bimire) vi to die

nezewicî unmarried

pev çûn vi to argue, to quarrel

qeşa (f) ice

soz (f) promise

tirsîn (bitirse) vi to fear, to be scared/afraid

tî thirsty

vekitandin (vekitîne) vt to explain

veşartin (veşêre) vt to hide

westiyan (biweste) vi to be/get tired


zane wise, learned

zewac (f) marriage

zewicî married

zewicîn (bizewice) vi to get married, to marry

HÎNDARÎ 18



A: Dîyaloga jêrîn wergerînin Îngîlîzî

- Azad! Azad! Xêr e? Tu çima ewqas direvî? Ma hinek li pê te ne?
- Ma tu wî kûçikî nabînî? Tu jî bireve, ew ê dev li te bike.
- Ka raweste, raweste! Divê tu ji kûçikan nerevî.
- Tu çi dibêjî? Le hek dev li min bike?
- Na, na, netirse! Kûçikên bajaran ên bixwedî zû zû êrîşî meriv nakin. Hek tu li wan nexî, ew tiştêkî bi te nakin.
- Ma tu dîn î? Kûçik kûçik e, çi bixwedî çi bêxwedî. Hek meriv nas nekin, dev li meriv dikin.

B: Pirsên jêrîn bersîv bikin.

1. Azad ji çi direve?
2. Ma kûçikên bajaran ên bixwedî zû zû êrîşî meriv dikin?
3. Azad ji hevalê xwe bawer dike an na?
4. Li gora Azad, hek kûçik meriv nas nekin, çi bi meriv dikin?

C: Dîyaloga jêrîn wergerînin Îngîlîzî.

- Xezal, ez aciz im, nizamim ez çî bikim.
- Pir hêsan e, Silo. Hek tu birçî bî, biçe xwarinxanê. Hek tu tî bî, biçe çayxanê. Hek tu westiyayî, biçe malê. Hek te heval divên, biçe komelê.
- Û hek tu çenekî din jî bipeyivî, ez ê bimirim.
- Na, na. Hek tu bimirî, em nikarin te veşêrin. Divê tu nemirî. Te mirin navê.
- Min henekên te jî navên.

D: 9 ji hevokên jêrîn çewt in. Bibînin.

1. Min divê ez zû dimeşim. 2. Te pênûs navê. 3. Divê tu ji kûçikan nerevî. 4. Wî zewac nevê. 5. Hek ew jî beşdar bibî, ez ê bêm. 6. Wê zewac navê. 7. Divê tu min agah bikî. 8. Hek tu vê ji min re vekitîne, ew ê pir baş bibe. 9. Hek tu naxwazî kûçik êrîşî te dikin, li wan nexe. 10. Hek tu vê ji ez re veşêrî, ez ê dirav bidim te. 11. Ku ew zewicî bin, ew kanin bêm. 12. Hek hun nezewicî bin, hun nikanin bêm. 13. Divê kesên azib jî tên. 14. Hek te soz dabî, divê tu bikî. 15. Divê keça kej jî were. 16. Hek ew ne li gora min be, ez ê wê bi şûn ve bînim. 17. Hek tu serma bigirî, tu yê bikuxî. 18. Hek ew bizewice, ew ê bi ser kevî. 19. Hek hun pev biçin, bavê we yê biqehire. 20. Min vekitandin nevê. 21. Azad bi xew ve çûye, divê tu wî hişyar dikî. 22. Me hevalên zane divê. 23. Heke hun qeşayê germ bikin, ew ê bihele, bibe av.

DEMA BORİYA BERDEST PAST CONTINUOUS TENSE

Dema Borîya Berdest is formed by simply adding **di-** to Dema Borîya Têdayî (Simple Past).

| ÇÛN | | | |
|--------------------|----------------------|---------------------|------------------------------|
| Dema Borîya Têdayî | | Dema Borîya Berdest | |
| Ez çûm | I went | Ez diçûm | I was going |
| Tu çû(yî) | You went | Tu diçû(yî) | You were going |
| Ew çû | He/she/it went | Ew diçû | He/she/it was going |
| Em çûn | We went | Em diçûn | We were going |
| Hun çûn | You went | Hun diçûn | You were going |
| Ew çûn | They went | Ew diçûn | They were going |
| DÎTÎN | | | |
| Dema Borîya Têdayî | | Dema Borîya Berdest | |
| Min dît | I saw | Min didît | I was seeing |
| Te dît | You saw | Te didît | You were seeing |
| Wî dît | He saw | Wî didît | He was seeing |
| Wê dît | She saw | Wê didît | She was seeing |
| Me dît | We saw | Me didît | We were seeing |
| We dît | You saw | We didît | You were seeing |
| Wan dît | They saw | Wan didît | They were seeing |
| BÛN | | | |
| Dema Borîya Têdayî | | Dema Borîya Berdest | |
| Ez bûm | I became/was | Ez dibûm | I was becoming/being |
| Tu bû(yî) | You became/were | Tu dibû(yî) | You were becoming/being |
| Ew bû | He/she/it became/was | Ew dibû | He/she/it was becoming/being |
| Em bûn | We became/were | Em dibûn | We were becoming/being |
| Hun bûn | You became/were | Hun dibûn | You were becoming/being |
| Ew bûn | They became/were | Ew dibûn | They were becoming/being |

ne- negates the past continuous tense:

| | |
|------------------------|--------------------------|
| Ez nediçûm | I wasn't going |
| Min nedixwar | I wasn't eating |
| Wan nedidît | They weren't seeing |
| We nedipirsî | You weren't asking |
| Em nedihatin | We weren't coming |
| Hun ranediketin | You weren't sleeping |
| Ew nedimeşîyan | They weren't walking |
| Ew nediket | He/she/it wasn't falling |

As in the **Simple Past** transitive verbs agree with the direct objects.

| | |
|--------------------------|-------------------------|
| Me ew nedidît. | We weren't seeing him. |
| Me ew nedidîtin. | We weren't seeing them. |
| Wan em nedidîtin. | They weren't seeing us. |



Min ew didîtin, lê belê wan ez nedidîtim.

FERHENGOK

aborî (f) economy
ango that is, I mean
baldar careful
bi baldarî carefully
berê formerly; first, ago
berî before
betlane (f) holiday
bêr (f) shovel, spade, oar
bihîştin (bibihîze) vt to hear
bilêt (f) ticket
biryar (f) decision
biryar dan vt to decide
biryar stendin/girtin vt to decide
bi vî awayî like this, in this way
bîr (f) well
bûyer (f) incident, event
cilşo (f) washing machine
cûda different
çer ku as soon as
çewt wrong
çewtî (f) mistake, error
dema ku when
derbas bûn vi to pass
deyn (m) debt, loan
deyndar indebted, debtor
deyn dan vt to lend
deyn kirin vt to borrow
deyn stendin vt to borrow
dibe ku may, might, may be
dil (m) heart
firax, firaq (f) dishes
galegal, galgal (f) conversation, word
gava ku when, since
gelo I wonder (question word)
giring important

giya, gîha (f) grass
heftanî (f) weekly, weekly wage, etc.
heta (ku) until, unless; up to, as far as
hew any more, no more
hişk hard, dry
kartol (f) potato
kolan (bikole) vt to dig
lêker (f) verb
mehî (f) salary (monthly)
nema no more
nerm soft
pañin (bipêje) vt to cook
piştî after
qewimîn (biqewime) vi to happen
rahiştin (rahêle) vt to lift, to pick up
rastî (f) truth, reality
rewş (f) situation, condition
rojanî (f) daily (wage, etc.)
ronî (f,adj) light
ronahî, ronayî (f) light
salanî (f) yearly (salary, etc.)
şîn hatin vi (plants) grow, sprout
temen (m) age
têgihastin (têbigihêje) vi to understand
vegerîn (vegere) vi to return, to come back
wexta ku when, while
xelet wrong
xeletî (f) mistake, error
xwîn, xûn (f) blood

berê has three usages:

1) first

Berê min biryar da, dûre Mizgîn.

Ez ê berê herim Mêrdînê û ji wir jî herim Nisêbînê.

Berê min çewtî kir, dûre te.

Karsazê wan berê mehanîya wan da, dûre ew jî kar derxistin.

First I decided, then Mizgîn./I'll first go to Mêrdîn and from there I'll go to Nisêbîn./

First I made a mistake, then you./Their boss first paid their wages, then sacked them.

2) ago

Ez 2 seet berê çûm wir. I went there two hours ago.

Bavê min nîv seet berê hat. My father came half an hour ago.

3) formerly: When used in the Past Continuous Tense, it meets English **used to**

Min berê cixare dikişand, lê ez nuha nakişînim.

Wî berê baş dibihîst, nuha baş nabihîze.

Wê berê xwarin dipat, nuha ew napêje, mêrê wê dipêje.

I used to smoke, but now I don't./He used to hear well (have a good hearing), now he doesn't hear well./She used to cook, now she doesn't, her husband cooks.

nema and **hew** (any more, no more) contributes to this usage. Note that they negate the verb.

1. Me berê pir deyn dikir, lê belê em nema dikin.

2. Berê apê me hero dihat serdana me, lê belê hew tê.

3. Berê li vira gîha şîn dihat, nuha hew şîn tê.

4. Berê me pir xeletî dikirin, em nema dikin.

5. Berê wan kinc bi destan dişuştin, ew nema bi destan dişon, nuha cilşo hene.

1. We used to borrow a lot, but we don't do it any more. 2. Our uncle used to visit us ever day, but he doesn't come any more. 3. Grass used to grow here,

now it doesn't grow any more. 4. We used to make many mistakes, we don't make them any more. 5. They used to wash clothes by hand, they don't wash by hand any more, now there are washing-machines.

êdî, îdî do the same, but they don't negate the verbs.

Berê her tim jinan firax dişuştin, êdî mêr jî dişon.
Berê min ji galegala wî pir hez dikir, îdî jê hez nakim.

Formerly women always washed the dishes, now men too wash (them).
I used to like his conversation, (but) I don't like it any more.

êdî may be used together with **nema** or **hew** to make a stronger emphasis.

1. **Wî berê pirçar kartol dixwar, lê belê êdî nema dixwe.**
2. **Em berê mehê carekê diçûn betlanê, lê em îdî hew diçin.**
3. **Berê emrê mirovan ji nuha kintir bû.**
4. **Berê wan bi baldarî li mamoste guhdarî dikir, lê belê ji ber ku ew êdî tiştên balkêş nabêje, hew lê guhdarî dikin.**
5. **Berê me heta êvarî bi kaxezan dilîst.**
6. **Berê karmend roja Şemîyê heta nîro dixebitîn, nuha wê rojê qet naxebitin.**
7. **Berê em ji malê heta xwendegehê dimeşîyan, lê belê em îdî nameşin, em bi otobozan diçin.**

1. He used to eat potato(es) often, but he doesn't eat (them) any more. 2. We used to go on a holiday once a month, but we don't any more. 3. Formerly people did not live as long as they do now. 4. They used to listen to the teacher carefully, but because he doesn't say interesting things (any more), they don't listen to him any more. 5. We used to play cards until evening. 6. Workers used to work till midday on Saturdays, now they don't work at all that day. 7. We used to walk from home up to the school, but we don't walk any more, we go by bus.

berî means before.

1. **Ev bûyer berî wê bûyerê qewimî.**
2. **Berê ev bûyer qewimî.**

3. Berê Azad dihat, dûre jî xwişka wî.

4. Azad berî xwişka xwe dihat.

5. Bawer berî min biryar stend.

6. Me ev bîr berî wê bîrê kola.

1. This incident happened before that incident. 2. This incident happened first. 3. First Azad came, and then his sister. 4. Azad was coming before his sister. 5. Bawer decided before me. 6. We dug this well before that well.

deyn (loan, debt) helps to form a few compound verbs.

1. **Çiqas deynê te li min e?**
2. **Ez bi çiqasî deyndarê te me?**
3. **Tu kanî hinek pere bi deyn bidî min?**
4. **Wî hinek pere ji wan deyn kir.**
5. **Me ev dirav ji wan deyn kiriye.**

1. How much do I owe you? 2. How much do I owe you? 3. Can you lend me some money? 4. He borrowed some money from them. 5. We have borrowed this money from them.

gava ku, dema ku and **wexta ku** (when, since) are used in clauses.


1. **Gava ku berf dibare, rê tèn girtin.**
2. **Wexta ku bavê min hat, min taştê dixwar.**
3. **Gava ku we galgal dikir, min kartol patin.**
4. **Gava ku min ew dît, wî pirtûkek dixwend.**
5. **Wexta ku me xeletî dikir, em bi ser nediketin.**
6. **Dema ku bavê wî mamoste bû, ew hero bi bavê xwe re dihat xwendegehê.**
7. **Berê gava ku me nan li erdê didît, me ew radikir û vedişart.**
8. **Berê gava ku me hîndarî çewt çêdikirin, mamoste li me dixist.**
9. **Gava ku em ji malê derketin,baran dibarîya, lê îdî**

nabare.

10. Gava ku min pirtûk dixwend, wî name dinivîsî.

11. Wexta ku me bi bêrê erd dikola, we çi dikir?

1. When it snows, the traffic stops. 2. When my father came, I was eating breakfast. 3. I cooked potatoes, while you were conversing. 4. When I saw him, he was reading a book. 5. When we made mistakes, we didn't succeed. 6. He used to come to school with his father every day, when his father was a teacher. 7. Formerly when we saw bread on the ground, we picked it up and hid it. 8. Formerly when we did the exercises wrong, the teacher would beat us. 9. When we left home, it was raining, but it is not raining any more. 10. While I was reading the book, he was writing a letter. 11. What were you doing while we were digging the ground with the spade.



berî ku (before) and piştî ku (after) can be used in clauses while the verb is in **bilanî** or past tense.

1. Berî ku ez wî bibînim, min ji kurê wî re got.
2. Berî ku hun biçin, me bibînin.
3. Berî ku ew bîn, em derketin.
4. Berî ku tu biçî xwendegehê, ji me re hinek kartol bikire.
5. Berî ku dinya ronî bibe, em ji malê derketin.
6. Berî ku ew bipirse, ez ê jê re bibêjim.

1. I told his son, before I saw him. 2. See us before you go. 3. Before they came, we went out. 4. Buy us some potatoes before you go to school. 5. We left home before it got light. 6. Before he asks, I will tell him.

1. Piştî ku min ew dît, ez vegeyîyam.

2. Piştî ku hun çûn sînemayê, me li televîzyonê mêze kir.

3. Piştî ku we ronahî dît, êrîş bikin.

4. Piştî ku mêvan hatin, zarok raketin.

5. Piştî ku galegala me qedîya, me bi kaxezan lîst.

6. Piştî ku bavê min çenekî nerm bû, me bi gogê lîst.

1. I returned, after I saw him. 2. After you went to cinema, we watched TV. 3. Attack, after you see the light. 4. The children slept after the guests came. 5. We played cards, after our conversation ended. 6. We played ball after my father was softened up (a little).



DIBE KU

dibe ku (may, maybe) is used with the verb in **bilanî**.

1. Bila îro xwarina me pir be, dibe ku mêvan bîn.
2. Dersa xwe zû biqedîne, dibe ku elektrîk vemire.
3. Ez dixwazim biçim çayxanê, dibe ku Serbest li wir be.
4. Sîwana xwe bibe, dibe ku baran bibare.
5. Ez dixwazim tu biçî, dibe ku ew neçe.

1. We'd better have much meal today, we may have guests. 2. Finish your studying early, the lights may go out (there may be a power cut). 3. I want to go to the cafe, Serbest may be there. 4. Take your umbrella, it may rain. 5. I want you to go, he may not go.

HÎNDARÎ 19

A: Hevokên jêrîn wergerînin Kurdî.

1. When I heard your voice, I was washing dishes.
2. What were you doing, when Serbest came home?
3. I used to smoke, I don't smoke any more.
4. Formerly the human life (age) was shorter.
5. Formerly Saturday was not a holiday.
6. I used to make many mistakes, I don't (make) any more.
7. While you were cooking potatoes, I was listening to the news carefully.
8. My mother always used to come home before my father.
9. Very interesting incidents were happening in our village.
10. While you were playing ball, they were doing the exercises.

B: Cihên vala tijî bikin.

1. Ez berê zû ji xew radibûm, lê niha ez zû ranabim. (any more)
2. Ma hun berê li ku? (to work)
3. Gava ku tu radiket, min pirtûk (to read)
4. Ma hun berê li ku? (to live)
5. Ma heftanîya te pir bû? (formerly)
6. Kî dihat? (first)
7. Ma hun wan dihatin? (before)
8. Piştî min biryar da, ez ji malê derketim.
9. Berî ku em ji wan re tiştêkî, wan ji me pirsî. (to say)
10. Çer ku min ew, ez revîyam. (to see)
11. Çer ku ew dihatin, me çay (to make)

C: 5 hevokên çewt bibînin.

1. Ez berê we revîyam.
2. Hun berî wan hatin.
3. Berê ev nerm bû, nuha hişk bûye.
4. Gava ku min dengê we bihîst, ez bi telefonê dipeyivîm.
5. Çer ku min tu dît, ez direvim.
6. Piştî ku min şiv xwar, ez çûm mala wan.
7. Berî ku hun werin, ez ê wan bibînim.
8. Berî ku hun derkevin, çayekê bivexwin.
9. Berê ez pir direvîyam, lê ez hew narevim.
10. Berê ez pir dimeşim, lê ez hew dimeşim.

Jûjî li têtjikê xwe dinêrî û

digot:

"Ez bi qurbana pûrtika
xwe ya hevirmîş bim."



jûjî hedgehog
hevirmîş silk

têtjik (m) spine
Ez bi qurbana ... bim

pûrtî (f) hair

(It's so wonderful) I feel like dying for it

JI ZARGOTINA KURDAN

Nimêja Mele



Şivanek çû bajêr, dît ku mele li ser minarê bang dide. Ji yekî pirsî:

- Ev çi dibêje?
- Bangî nimêjê dîke.
- Nimêj çi ye?
- Nimêj nimêj e.
- Tu bi Xwedê kî, zirara pez tê de heye?
- Na, zirara pez tê de tune.
- De bila bang bide, qasî ku dilê wî dixwaze.

bang dan *vt* call to prayer

minare (f) minaret

nimêj (f) (Islam) ritual of worship centred in prayer

mele (m) Muslim preacher

Tu bi Xwedê kî For God's sake

zirar (f) damage, harm

Xwende



Gundiyek li yekî xwende digerîya. Li efendiyekî rast hat û jê pirsî:

- Tu dizanî bixwînî?
- Ma çawa nizanîm?

Gundî kaxezek dayê. Efendî kaxez vekir û dest bi xwendinê kir. Piştî pirsîyarîyan, hal û xatir...

- Efendî tu şaş î. Tiştê ku di destê te de ye, senede ye, ne mektûb e.
- Te çire ji berê de negot? Te bigota, min xelet nedixwend.

çire why kaxez (f) (sheet of) paper

senede (m) promisory note şaş wrong

xelet wrong

pirsîyarî (f) inquiring (after)

Te bigota If you had said (so)

xwende educated

DEMA BORÎYA ÇÎROKÎ PAST PERFECT TENSE

Past Perfect indicates an event, a state or an action which took place before a specific time (When you phoned, he **had gone**).

past stem + **bûn** (simple past)

Ez çûbûm. I had gone.

BÛN (Dema Borîya Têdayî): Ez bûm/Tu bû(yî)/Ew bû/Em bûn/Hun bûn/Ew bûn

i is used as a **buffer** letter between the **past stems ending in a consonant** and **bûn**: **Ez hatibûm**

bûn agrees with the object of **transitive** verbs:

| | |
|---------------------------|-------------------------|
| Min ew anîbû. | I had brought it. |
| Te ew anîbûn. | You had brought them. |
| Wî pirtûkek anîbû. | He had brought a book. |
| Me nan anîbû. | We had brought bread. |
| We sêv anîbûn. | You had brought apples. |
| Wan ew anîbûn. | They had brought them |
| Min ew dîtibû. | I had seen him/her/it. |
| Te ew dîtibûn. | You had seen them. |
| Wî em dîtibûn. | He had seen us. |
| Me tu dîtibû. | We had seen you. |
| We kûçik dîtibû. | You had seen the dog. |
| Wan ez dîtibûm. | They had seen me. |

Bûn agrees with the subject of **intransitive** verbs:

Ez çûbûm (I had gone)/**Tu çûbû(yî)**/Ew çûbû/Em çûbûn/

Hun çûbûn/Ew çûbûn.

Ez ketibûm/Tu ketibû(yî)/Ew ketibû/Em ketibûn/Hun ketibûn/Ew ketibûn.

Ez bûbûm (I had become/been)/Tu bûbû(yî)/Ew bûbû/Em bûbûn/Hun bûbûn/Ew bûbûn

Gava ku ew çûbû malê, wî ji dêya xwe re negotibû.

Çer ku ji bajêr hatibû, çûbû serdana birayê xwe.

Wexta ku ew hatibû gund, kes bi wî re nepeyivîbû.

Min wê rojê ew nedîtibû.

Di ser mirina wî re şes meh derbas bûbû.

Ma te navê wî ji min re gotibû?

Roja ku berf barîyabû hewa pir sar bûbû.

Nanê wan hişk bûbû, lê di avê de nerm kiribûn.

Em têngihaştibûn.

Ma we ji wî nepirsîbû?

Gava ku ez gihastim wir, wan şiv xwaribû.

Wexta ku wî hun dîtin, ew revîyabû.

Wan giş çewt çêkiribûn.

Ma we çi kiribû?

Hewa pir sar bûbû, giş nexweş ketibûn.

Min kêra xwe tûj kiribû.

Mêvanên min berî min hatibûn.


Baran pir jê hez kiribû.

**Agir girtibû mala yekî,
yê din ser û pê li ber dikizirand.**

ser û pê head and trotters kizirandin (bikizirîne) vt to singe

JI ZARGOTINA KURDAN

Bav û Kur




Merivek kal bûbû, ji kar ketibû. Ne baş dibû, ne jî dimir. Rojekê kurê wî jê aciz bûbû. Ew kir selikekê û bir danî ser çiyayekî ku gur wî bixwin. Wexta ku kur zîvirî ku here malê, kalo got:

- Lawo, te ez anîme, ev karê te ye. Lê selika xwe ji bîr neke, bi xwe re bibe.
- Ma ez ê selikê çî bikim?
- Wexta ku tu kal bû, kurê te jî yê te bi vê selikê bîne vir.

gur wolf
ji kar ketin *vi* to retire

selik (f) basket

Dilê Bav



Rojeke zivistanê, berfli erdê, zilamek derketibû derve, berfa ber derî paqij dikir. Bavê wî çiqas jê re got, “Kurê min were hundir, sar e, tu yê nexweş bikevî.” Kur bi ya bavê xwe nekir, nehat hundir. Bav dît ku nabe, çû neviyê xwe yê di pêçekê de anî danî ser berfê. Kur dît, çû rahişt pitik û got:

- Bavo, tu çî dikî? Ew ê serma bigire.
- Lawo, tu dibînî, kurê te ye, dilê te dişewite. Ne tu jî kurê min î? Dilê min jî ji bo te dişewite.

bi ya yekî kirin *vi* to listen
dil(ê yekî) şewitîn *vi* to feel pity for

nevî grandchild
pêçek (f) swaddling-clothes

HÎNDARÎ 20



Hefta çûyî Bawer û Zînê çûn sînemayê. Bawer berî Zînê çûbû, bilêt kiribûn û li benda Zînê sekinîbû. Piştî ku Zînê hat, pevra ketin hundir. Filim dest pê kiribû, lê gelek mirov hîna rûnenîştibûn. Li cihên xwe digerîyan. Bawer û Zînê cihên xwe dîtî, lê belê hinek lê rûnenîştibûn. Bawer ew rakirin. Mirovê pêşîya Bawer rûnenîştibû. Ji ber vê yekê Bawer baş nedidît. Bawer jê re got:

- Ji kerema xwe, rûne, binêre filim dest pê kiriye.

Mirov rûnişt û Bawer bi baldarî li filim mêze kir. Piştî ku filim qedîya, bi kêfxweşî çûn malê; şeveke xweş derbas kiribûn.

A: Pirsên jêrîn bersîv bikin.

1. Bawer û kî çûn sînemayê?
2. Kî li benda kê sekinîbû?
3. Ma gava ku ew ketin hundir filim dest pê kiribû?
4. Bawer çima baş nedidît?
5. Şeveke çawa derbas kiribûn?

B: Hevokên jêrîn wergerînin Kurdî.

1. When you came, he had gone.
2. He had finished, while you were having a bath.
3. When my father came, I had slept.
4. When I returned, the lesson (class) had finished.
5. When they went, the window had been broken.
6. When you woke up, I had had breakfast.
7. As soon as we had gone there, he had run.
8. They had started work, as soon as the sun set.

C: 5 hevokên çewt bibînin.

1. Gava ku ew hat, me nebihîstibû.
2. Xwendekarên min nehatibû.
3. Min sêv xwaribûm.
4. Ma we ew dîtibûn?
5. Wî ez dîtibû.
6. Ez li gelek bajaran gerîyabû.
7. Kê ji wî re gotibû?
8. Em venegerîyabû.
9. Hun pir meşîyabûn.
10. Rêwîtiya wan baş derbas bûbû.

D: Lêkerên jêrîn wergerînin Dema Borîya Çirokî

1. Rojekê Dara nameyek sitend.
2. Name ji hevalê wî, Dijwar, dihat.
3. Roja din Dara çû gundê Dijwar.
4. Min ji wî pir hez kir.
5. Em ji malê pir zû derketin.
6. Wan xwe dişuştin.
7. Bûyereke pir girîng qewimî.
8. We bangî wî dikir.
9. Ez ji te re dibêjim.
10. Hun pir meşîyan.

FERHENGOK

bale stupid, fool
berbaran (f) umbrella
berf (f) snow
bê hemdî accidentally, unwillingly
bêhiş fool, stupid
bi destê by
biha, buha expensive
bi hemd on purpose, willingly
biriqîn (bibiriqe) *vi* to shine
biriqandin (bibiriqîne) *vt* to shine (sth)
biyanî foreigner, stranger
bûyer (f) event, incident
ceribandin (biceribîne) *vt* to try
ceza (f) punishment, penalty, fine
çêrandin (biçêrîne) *vt* to graze, to pasture
çêrîn (biçêre) *vi* to graze
çirîn (biçire) *vt* to be torn
çirandin (biçirîne) *vt* to tear
dan pê *vt* to follow
daristan (f) forest
derbas bûn *vi* to pass
derbas kirin *vt* to pass (sth), have (sb/sth) passed
devançe (f) pistol
erzan cheap
ewr (m) cloud
êşandin (biêşîne) *vt* to hurt
gustîlk (f) ring
helandin (bihelîne) *vt* to melt
helîn, helîyan (bihele) *vi* to be melted, to melt
ji aliyê... (ve) by

kitkit (f) detail
lampe (f) lamp
lewra this is why, therefore
meşandin (bimeşîne) *vt* to walk
mêrg (f) meadow, pasture
mirandin (bimirîne) *vt* to kill
nîvê şevê midnight
nîvişk butter
parastin (biparêze) *vt* to defend
qeşa (f) ice
qetandin (biqetîne) *vt* to break off, to tear off
qetîn (biqete) *vi* to be broken/ torn off
rast kirin *vt* to correct
revandin (birevîne) *lg* to kidnap, to help or let (sb/sth) to escape/go away, to elope (with)
rûniştandin (rûniştîne) *vt* to seat, to sit (sb) down
selete (f) salad
şemîtandin (bişemîtîne) *vt* to slide, to skid, to cause (sb/sth) to slip
şemîtîn (bişemite) *vi* to slide, to skid, to slip
şeqar (f) pistol, revolver
şewitandin (bişewitîne) *vt* to burn (sth)
şewitîn (bişewite) *vi* to burn
şikeft (f) cave
ta (m) thread
tahl, tehl bitter
tîlî (f) finger
tîrsandin (bitîrsîne) *vt* to scare

tîrsîn (bitîirse) *vi* to be scared/afraid, to fear
tîrş sour
tiving (f) gun, rifle
tîp bi tîp letter by letter

tûj (pepper) hot, chilli
wêran ruined, devastated
zewicandin (bizewicîne) *vt* to marry (sb), to marry off
zordar tyrannical, cruel

VERBS ENDING IN -ANDIN

There are only a few simple transitive verbs in Kurdish:

intransitive

hatin to come
bûn to be/become
ketin to fall
çûn to go
man to stay/remain

transitive

anîn to bring
kirin to do
xistin to cause (sb) to fall
birin to take to
hiştin to leave, to let, to allow

The remaining Kurdish transitive verbs are formed with **-andin**. Any intransitive verb can have a transitive form, by simply replacing **-in** or **-în** with **-andin**.

| | |
|----------------|-------------------|
| revîn | revandin |
| qetîn | qetandin |
| helîn | helandin |
| şewitîn | şewitandin |
| zewicîn | zewicandin |
| êşîn | êşandin |
| tîrsîn | tîrsandin |
| şemîtîn | şemîtandin |
| çêrîn | çêrandin |

-andin does not affect the meaning when applied to transitive verbs:

nivîsîn/nivîsandin to write

Ez nameyekê dinivîsim. I am writing a letter.

Ez nameyekê dinivîsînim. I am writing a letter.

1. Mizgîn vêsê hat mala me.
2. Serbest vêsê mizgîn anî mala me.
3. Selete tirş bûye.
4. Te selete tirş kiriye.
5. Bajarên Kurdistanê wêran bûne.
6. Saddam bajarên Kurdistanê wêran kirine.
7. Bawer diçe ku?
8. Tu Bawer dibî ku?
9. Şeşar ji destê wî ket.
10. Wî çima şeşar ji destê xwe xist?
11. Gustîlk ji tilîya wê ket.
12. Wê gustîlk ji tilîya xwe xist.
13. Bila pantorê te neçire!
14. Pantorê xwe neçirîne!
15. Tivinga Silo dibiriqî.
16. Silo tivinga xwe dibiriqand.
17. Divê ev pirtûk neçire.
18. Divê tu vê pirtûkê neçirînî.
19. Ev ta naqete.
20. Kes nikane vî tayî biqetîne.
21. Ma çi şewitiye?
22. Ma te çi şewitandiyê?
23. Ez dixwazim bizinên min di mêrgê de biçêrin.
24. Ez dixwazim hun bizinên min di mêrgê de biçêrin.
25. Havînî berfa ber şikeftê dihele.
26. Havînî roj berfa ber şikeftê dihelîne.
27. Ew zîlamê biyanî ji kûçikên gund pir ditirse.
28. Kûçikên gund wî zîlamê biyanî pir ditirsînin.
29. Kurê min îdî kane bizewice.
30. Ez îdî kanim kurê xwe bizewicînim.
31. Ew çewtî çawa rast bûye?
32. Kê ew çewtî rast kiriye?
33. Ez dixwazim vê tivingê biceribînim, lê ez ditirsim ku gundîyan bitirsînim.

Qeşa dihele.



Ew qeşayê dihelîne.



Kaxez dişewite.



Ew kaxezê dişewitîne.



Gulçînê serê wê êşand.



Serê wê diêşe.

1. Mizgîn came to our home this morning. 2. Serbest brought Mizgîn to our home this morning. 3. The salad has become sour. 4. You have soured the salad. 5. The cities of Kurdistan have been devastated. 6. Saddam has devastated the cities of Kurdistan. 7. Where is Bawer going? 8. Where are you taking Bawer to? 9. The gun dropped from his hand. 10. Why did he drop the gun from his hand? 11. The ring fell off her finger. 12. She dropped the ring off her finger. 13. Don't let your trousers tear! 14. Don't tear your trousers! 15. Silo's rifle was shining. 16. Silo was shining his rifle. 17. This book must not be torn. 18. You mustn't tear this book. 19. This thread doesn't break. 20. Nobody can break this thread. 21. What has burnt? 22. What have you burnt? 23. I want my goats to graze in the pasture. 24. I want you to graze my goats in the pasture. 25. The snow in front of the cave melts in summer. 26. The sun melts the snow in front of the cave in summer. 27. That strange man is very scared of the dogs in the village. 28. The dogs in the village scare that strange man very much. 29. My son can now get married. 30. I can now marry off my son. 31. How has that mistake been corrected? 32. Who has corrected that mistake? 33. I want to try this rifle, but I am afraid of scaring the villagers.

DAN KIRIN - CAUSATIVE

Dan (bide) also acts as an auxiliary verb used to form such causatives as **to have sth done, to get (sb/sth) to do sth, to make (sb/sth) do sth** and **to cause (sb/sth) to do sth**.

dan + infinitive* (of a transitive verb)

| | |
|--------------|----------------|
| dan kirin | dan nivîsîn |
| dan xwarin | dan xistin |
| dan anîn | dan şuştin |
| dan dirûtin | dan firotin |
| dan maltin | dan meşandin |
| dan kişandin | dan zîvirandin |

Note that the infinitive always remains the same.

Min name da nivîsîn. I had the letter written.

*) In some regions ê is added to the infinitive: **dan firotinê, dan şuştinê, etc.**

Ez namê didim nivîsîn. I am having the letter written.
Ez ê namê bidim nivîsîn. I will have the letter written.
Min name dida nivîsîn. I was having the letter written.
Min name nedabû nivîsîn. I hadn't had the letter written.
Min name daye nivîsîn. I have had the letter written.
Ez nikanim wê bidim nivîsîn. I can't have it written.

bi introduces the indirect object (the one who is made do sth).

1. **Min name bi Lezgîn da nivîsîn.**
2. **Ma te ode bi kê da maltin?**
3. **Wan bi me hinek hêk dan kelandin.**
4. **Ew ê çakêtên xwe bi dirûnkerekî pir baş bidin dirûtin.**
5. **Wan derî û pacên me bi polîsan dan şikandin.**
6. **Ma hun kincên xwe bi kê didin şuştin?**
7. **Me xaniyê xwe bi wî dabû firotin.**
8. **Ma ew ê çî bi me bidin xwarin?**
9. **Em tiştêkî bi wan nadin kirin.**
10. **Hun çima tiştên xwe bi wan nadin anîn?**
11. **Wê malbatê kûçikê xwe bi wê dida meşandin.**
12. **Karker dimeşîyan Enqerê, lê wan ew bi polîsan dan zîvirandin.**
13. **Ma hun çima her sibeh sobê bi min didin vêxistin?**
14. **Ma te elektrîk daye vemirandin?**
15. **Wan ew keç bi Silo nedabû revandin, bi yekî din dabû revandin.**
16. **Wan ew keç ne bi Silo lê bi yekî din dabû revandin.**
17. **Em ê vî karî bi wan bidin qedandin.**
18. **Tu yê solên xwe bi kê bidî biriqandin?**
19. **Em îsal dixwazin xênî bi wan nedin boyax kirin.**
20. **Em îsal naxwazin xênî bi wan bidin boyax kirin.**
21. **Wê ez bi xwişka min dam hişyar kirin.**
22. **Em kanin kêra xwe bi wan bidin tûj kirin.**

23. Ez zanim ez ê çawa bi wî bidim rast kirin.
 24. Tu çima tivinga xwe bi wî dide paqij kirin?
 25. Te ev xwarin pir tûj daye çêkirin.
 26. Ez ê wê nameyê tîp bi tîp bi wî bidim nivîsandin.
 27. Wî em di daristanan de dan meşandin.

1. I made Lezgin write the letter. 2. Whom did you make sweep the room? 3. They made us boil some eggs. 4. They will make a very good tailor sew their jackets. 5. They made the police break our doors and windows. 6. Who do you get to wash your clothes? 7. We had got him to sell our house. 8. What will they make us eat? 9. We are not going to get them to do anything. 10. Why don't you get them to bring your things? 11. That family was making her walk their dog. 12. The workers were walking to Ankara, but they made the police turn them back. 13. Why do you make me light the stove every morning? 14. Have you had the lights switched off? 15. They hadn't had Silo kidnap that girl, they had made somebody else kidnap her. 16. Not Silo but somebody else had they got to kidnap that girl. 17. We will get them to finish this work. 18. Who will you get to shine your shoes? 19. We don't want to make them paint the house this year. 20. We don't want to make them paint the house this year. 21. She got my sister to wake me up. 22. We can get them to sharpen our knives. 23. I know how to get him to correct (it). 24. Why do you get him to clean your rifle? 25. You have had this meal made too hot. 26. I will make him write that letter letter by letter. 27. He made us walk in forests.

RAWEYA TEBATÎ - PASSIVE

The passive form of a verb is used when the subject is affected by the action of the verb, as in: **The window was broken.** "was broken" is in the passive.

hatin + infinitive* of a transitive verb.

Note that many Kurdish intransitive verbs are passive in English: **çirîn** (to be torn/ripped), **rijîn** (to be poured/spilled), **qetîn** (to be broken off), etc.

şuştin to wash

hatin şuştin to be washed

avêtin to throw

hatin avêtin to be thrown

*) In some regions ê is added to the infinitive; (**hatin şuştinê**, **hatin kirinê**)

xwarin to eat

hatin xwarin to be eaten/eatable

vexwarin to drink

hatin vexwarin to be drunk/drinkable

kişandin to pull/draw

hatin kişandin to be pulled/drawn

dirûtin to sew

hatin dirûtin to be sewn

Note that the infinitive never changes.

Ev av tê vexwarin.

This water is drinkable.

Goştê keran nayê xwarin.

Donkey meat is not eaten.

Ma ev derî hatiye şikandin?

Has this door been broken?

Kî yê bê kuştin?

Who will be killed??

Because of the importance of **hatin** in the passive, it would be helpful to review its conjugation in all tenses.

| Fermanî | Nuha | Borîya Têdayî | Borîya Dûdar |
|---------------|----------------|--------------------|--------------|
| Bê/were | Ez têm/nayêm | Ez hatim | Ez hatime |
| Bên/werin | Tu tê(yî)/nayê | Tu hat(î) | Tu hatiyî |
| Nê/Neyê! | Ew têt/nayê | Ew hat | Ew hatiye |
| Nên/Neyên! | Em têt/nayên | Em hatin | Em hatine |
| | Hun têt/nayên | Hun hatin | Hun hatine |
| | Ew têt/nayên | Ew hatin | Ew hatine |
| Borîya Çîrokî | Borîya Berdest | Bilanî | |
| | | hatin | werin |
| Ez hatibûm | Ez dihatim | Ez bêm/neyêm,nêm | werim |
| Tu hatibû(yî) | Tu dihat(î) | Tu bê(yî)/neyê, nê | werî |
| Ew hatibû | Ew dihat | Ew bê/neyê,nê | were |
| Em hatibûn | Em dihatin | Em bêt/neyên,nên | werin |
| Hun hatibûn | Hun dihatin | Hun bêt/neyên,nên | werin |
| Ew hatibûn | Ew dihatin | Ew bêt /neyên,nên | werin |

ji aliyê or ji aliyê...ve means by when used with the passive.

1. Hîndarî ji aliyê mamoste hatin çêkirin.
2. Azad bi destê polîsekî hat kuştin.
3. Ma ev ta yê bê qetandin?
4. Çi tîn şuştin û çî nayên şuştin, ji min re bibêjin.
5. Ev çakêtê te bi destê kê hatiye dirûtin?
6. Ma berkêşk hatiye kişandin?
7. Sola te kevn bûye, nayê biriqandin.
8. Ma tu nizanî ku ev nayê kelandin?
9. Agir nedihat vemirandin.
10. Elektrîka me hatibû vexistin.
11. Netirse, kêra te jî yê bê tûj kirin.
12. Xaniyê we bi destê kê hat boyax kirin?
13. Ew çewtî ji aliyê min hatibû rast kirin.
14. Bi te re nayê listin.
15. Ez dixwazim oda min bê maltin.
16. Ma dengê me tê bihîstin?
17. Ma hun ji aliyê kê hatin hişyar kirin?
18. Bajarên me ji aliyê zordanan ve hatine wêran kirin.
19. Ev bûyer zû nayên bihîstin.
20. Ew ji aliyê hevalekî xwe ve bê hemdî hatibû kuştin.
21. Piştî ku hat kuştin çî bû?
22. Gustîlkên wan ê bîn kirin.
23. Şikeft ji aliyê rêberekî ve hatibû dîtin.
24. Bilêtên otobozê hatine biha kirin.
25. Bilêtên otobozan biha bûne.
26. Ma gund ji aliyê kê ve tîn parastin?
27. Hun ê pir bîn tirsandin.
28. Ew pir hatine ceribandin.
29. Qeşa bi germê tê helandin.
30. Ev kaxez pir zû tê çirandin.
31. Ev kaxez pir zû diçire.
32. Nivîşk û penîr ji şîr tîn çêkirin.
33. Diz di şikeftê de ji aliyê polîsan hat girtin.
34. Pênûsa min hatiye dizîn.

35. Ew bûyer di rojnameyekê de hatibû nivîsîn.
36. Divê ew bê ceza kirin.
37. Divê lampeya sor neyê derbas kirin.
38. Divê piştî nivê şevê derî neyê vekirin.
39. Divê kitkit bîn terikandin.

1. The exercises were done by the teacher. 2. Azad was killed by a policeman. 3. Will this thread be broken off. 4. What are (to be) washed and what are not (to be) washed, tell me. 5. By whom has this jacket of yours been sewn? 6. Has the drawer been drawn? 7. Your shoes have become old (worn out), they aren't (cannot be) shone. 8. Don't you know that this is not (cannot be) boiled? 9. The fire wasn't being extinguished. 10. Our lights had been switched on. 11. Don't worry, your knife will also be sharpened. 12. By whom was your house painted? 13. That mistake had been corrected by me. 14. One can't play with you. 15. I want my room to be swept. 16. Is our voice heard? 17. By whom were you woken up? 18. Our cities have been devastated by tyrants. 19. These incidents are not heard about quickly. 20. He had accidentally been killed by a friend of his. 21. What happened after he was killed? 22. Their rings will be bought. 23. The cave had been seen by a guide. 24. The bus tickets have increased in price. 25. The bus tickets have increased in price. 26. By whom are the villages being defended? 27. You will be very scared. 28. They have been tried many times. 29. Ice is melted by heat. 30. This paper is torn very quickly. 31. This paper is torn very quickly. 32. Butter and cheese are made of milk. 33. The thief was caught in a cave by the police. 34. My pen has been stolen. 35. That incident had been written in a newspaper. 36. He/she must be punished. 37. The red light must not be passed (crossed). 38. The door must not be opened after midnight. 39. The details must be left.

Compare the transitive and intransitive verbs with **causative** and **passive**:

- Siyamed mir.
Silo Siyamed kuşt.
Axa Siyamed bi Silo da kuştin.
Siyamed bi destê Silo hat kuştin.
Qeşa dihele.
Ez qeşayê dihelînim.
Ew qeşayê bi min dide helandin.
Qeşa ji aliyê min tê helandin.
Ker ê biçêre.
Mizgîn ê kerê biçêrîne.
Bavê Mizgîn ê kerê bi Mizgîn bide çêrandin.
Ker bi destê Mizgîn tê çêrandin.

Ta qetîyaye.
Wî ta qetandiye.
Wê ta bi wî daye qetandin.
Ta ji alîyê wî ve hatiye qetandin.

Ma xanî şewitî?
Kê xanî şewitand?
Kê xanî bi kê da şewitandin?
Xanî bi destê kê hat şewitandin?

Sola wî nebiriqîbû.
Wî sola xwe nebiriqandibû.
Wî sola xwe nedabû biriqandin.
Sola wî nehatibû biriqandin.

Ez dixwazim qeşa bihele.
Ez dixwazim qeşayê bihelînim.
Ez dixwazim qeşayê bidim helandin.
Ez dixwazim qeşa bê helandin.

Dibe ku ew bişemite.
Dibe ku hinek wî bişemitînin.
Dibe ku hinek wî bidin şemitandin.
Dibe ku ew ji alîyê hinekan ve bê şemitandin.

HÎNDARÎ 21

A: Dîyalogê bixwînî û pirsan bersîv bikin.

- Bawer! Tu çima sîwana xwe nabî?
- Ez ê sîwanê çî bikim?
- Ma tu nabî ewr heye? Dibe ku baran bibare. Meriv bi sîwanê xwe ji baranê diparêze. Lewra jê re berbaran jî tê gotin.
- Erê, erê. Ewqas ders bes e.

1. Ji sîwanê re çî tê gotin?
2. Çima wisa tê gotin?
3. Bawer çî xwe nabe?

B: Dîyalogê bixwînî û pirsan bersîv bikin.

- Zelal, te nûçe bihîstiye?
- Na, xêr e?
- Mizgîn di girtîgehê de ye. Şeva çû ji alîyê polîs hat girtin.
- Çima? Çi kiriye?
- Piştî nivê şevê seet di yek û çaryekê de pir zû seyare ajotiye.
- Xweşik bi kitkîtan bibêje. Pirîcar seyare zû tê ajo-tin, lê meriv nakeve girtîgehê. Cezayên din hene.
- Ez ji te re bi kitkit bibêjim. Wî berê lampeya sor derbas kiriye; dûre li polîs nesekinîye; wan niv seetê daye pê wî; dûre ew hatiye girtin. Lê pir serxweş bûye û xwestiye ku li polîsan bixe.
- Ewqas tişt jî ji bo girtîgehê bes e. Malbata wî hatiye agahdar kirin?
- Belê hinekan ew dane agahdar kirin.
- Werê Mizgîn nuha di girtîgehê de girtî ye. Divê em biçin serdana wî.

1. Mizgîn ji alîyê kê ve hatiye girtin?
2. Mizgîn kengî pir zû seyare ajotiye?
3. Mizgîn kîjan lampe derbas kiriye.
4. Kê daye pê kê.
5. Kî hatiye girtin?
6. Mizgîn xwestiye li kê bixe.
7. Hinekan kî daye agahdar kirin?

C: Hevokên jêrîn wergerînin Kurdî.

1. Ice is melted in the heat. 2. The heat melts the ice. 3. Ice is melted quickly. 4. This sentence has been corrected. 5. The umbrella protects one from the rain. 6. They were caught in the forest. 7. Have you had the dog walked? 8. Can you have your house burnt? 9. Is this thread broken off? 10. Can you break this

thread off? **11.** Can you have this thread broken off? **12.** We don't have our house painted. **13.** Is this water drinkable? **14.** This knife can't (isn't) be sharpened. **15.** These lamps aren't (can't be) lit. **16.** The fire wasn't being extinguished. **17.** This work can't be (isn't) finished. **18.** This story is often told. **19.** This book is read a lot. **20.** They are (can be) seen from here very well.

D: 10 hevokên çewt bibînin.

1. Seet di 8:00'an de min bide hişyar kirin.
2. Ez ê çakêtê xwe bidim paqij kirin.
3. Ma tu yê kincên xwe bidî dişuştin?
4. Ma wan xaniyê xwe anî şuştin?
5. Wî name didan nivîsandin.
6. Ez ê ji xwe re pantorekî bidim bidirûtin.
7. Nameya te nayê xwendin.
8. Ev agir nayê vemirîn.
9. Ew av nedihat vexwarin.
10. Gund nehatibû dîtin.
11. Ji wan nedihat bawer kirin.
12. Kêra min hat tûj kiribûn.
13. Min ode didabû maltin.
14. Ez ê wan bidim hişyar kirin.
15. Ew nikanin xênî bidin boyax kirin.
16. Dengê wî nayê nebihîstin.
17. Deriyê me nayê vekirin.
18. Ew kevir giran bû, nedihat bavêtin.
19. Li wê derê nayê nemeşandin.
20. Çewtîyên wî dihatin nerast kirin.

E: Cihên vala tijî bikin.

1. Çay pir germ e, na... vexwarin.
2. Mizgîn pir dûr bû, nedî... dîtin.
3. Te oda xwe kengî maltin?
4. Ez elektrîkê wî didim vemirandin.
5. Ew xwarinê min dide çêkirin.
6. Ma silo bi kê hat kuştin?
7. Ma ew ji kê hatibû paqij kirin?
8. Ma li wê derê bi avjenî nayê?
9. Wan ew bi da nivîsîn?
10. Bajarê me ji wî gundî di... dîtin.

FERHENGOK

- | | |
|---|--|
| baranî (m) raincoat | kêf, keyf (f) pleasure |
| berxwedan (f) resistance | kêfxweş glad, happy, pleased |
| bi hewa ketin <i>vi</i> to take off | li ber xwe dan <i>vi</i> to resist |
| bi ser ketin <i>vi</i> to be successful, to succeed, to accomplish | lîstîk (f) play, game |
| bi xew de çûn <i>vi</i> to fall asleep | nobedar watchman, sentry |
| çav (m) eye | nobet (f) watch (of a sentry) |
| çavfireh generous | nobet girtin <i>vt</i> to stand guard, to watch |
| çavteng miserly, stingy, selfish | pevçûn (f) argument |
| da ku so that | pev çûn <i>vi</i> to argue |
| dil (m) heart | rû (m) face |
| dilşa(d) happy | rû dan <i>vt</i> to indulge |
| fîrîn (bifîre) <i>vi</i> to fly | sedem, sebeb (f) reason |
| firoşer seller | serf kirin <i>vt</i> to spend |
| gir (m) hill | serîhildan (f) uprising, rebellion |
| girav (f) island | ser(î)hildan <i>vt</i> to rebel, to rise up |
| her weha at the same time, nevertheless | serketî successful |
| heya up to, until | serketîjn (f) success |
| heya ku until, as long as | serfiraz successful, victorious |
| hêdî slow | tanq (f) tank |
| hêja valuable, precious, worthy; dear (when addressing) | teqez definitely, certainly |
| kar (f) profit, gain | teva ku, tevî ku although |
| | têkoşîn (f) struggle |
| | têl (f) wire |
| | top (f) cannon |
| | xwezî, xwezîka I wish, If only |

BILANÎ: DEMA BORÎYA TÊDAYÎ

I. Transitive Verbs:

bi + Dema Borîya Têdayî + a

| <u>Simple Past</u> | | <u>Bilanî: Simple Past</u> |
|--------------------|--------------|----------------------------|
| Ez hatim | HATIN | Ez <u>bihatima</u> |
| Tu hat(î) | | Tu <u>bihata(yî)</u> |
| Ew hat | | Ew <u>bihata</u> |
| Em hatin | | Em <u>bihatina</u> |
| Hun hatin | | Hun <u>bihatina</u> |
| Ew hatin | | Ew <u>bihatina</u> |

- After a vowel a is replaced with ya.
- If the simple past is already ends in an a, the second a is either omitted or added with y (ya).
- bi- is replaced with ne- in the negative.

| | | |
|-------------|--------------|-----------------------|
| Ez revîyam | REVÎN | Ez <u>birevîyama</u> |
| Tu revîya | | Tu <u>birevîya</u> |
| Ew revîya | | Ew <u>birevîya</u> |
| Em revîyan | | Em <u>birevîyana</u> |
| Hun revîyan | | Hun <u>birevîyana</u> |
| Ew revîyan | | Ew <u>birevîyana</u> |

| | | |
|-----------|------------|----------------------|
| Ez çûm | ÇÛN | Ez <u>biçûma</u> |
| Tu çû(yî) | | Tu <u>biçûya(yî)</u> |
| Ew çû | | Ew <u>biçûya</u> |
| Em çûn | | Em <u>biçûna</u> |
| Hun çûn | | Hun <u>biçûna</u> |
| Ew çûn | | Ew <u>biçûna</u> |

Verbs ending in **-in** may have a sound variation, **i** may changed into **a**.

| | |
|--------------|--------------|
| Ez bihatîma | Ez bihatama |
| Hun bihatîna | Hun bihatana |

In some regions, **-û** changes into **-iwa**. This variation is not common however.

| | |
|---------------|--------------|
| Ez biçiwama | Em biçiwana |
| Tu biçiwa(yî) | Hun biçiwana |
| Ew biçiwa | Ew biçiwana |

BÛN

| <u>to be</u> | <u>to become</u> |
|--------------|----------------------|
| Ez bûma | Ez <u>bibûma</u> |
| Tu bûya(yî) | Tu <u>bibûya(yî)</u> |
| Ew bûya | Ew <u>bibûya</u> |
| Em bûna | Em <u>bibûna</u> |
| Hun bûna | Hun <u>bibûna</u> |
| Ew bûna | Ew <u>bibûna</u> |

Hek hewa sar bûya, em nediketin avê.

Hek hewa sar bibûya, em ê neketina avê.

If it was cold, we wouldn't swim. If it became cold, we wouldn't have swum.

Various pronunciations of **bûn** in bilanî exist in the spoken language:

| | |
|-------------|---------------|
| Ez biwama | Ez bibiwama |
| Tu biwa(yî) | Tu bibiwa(yî) |
| Ew biwa | Ew bibiwa |
| Em biwana | Em bibiwana |
| Hun biwana | Hun bibiwana |
| Ew biwana | Ew bibiwana |

| | |
|-----------|-------------|
| Ez bama | Ez bibama |
| Tu ba(yî) | Tu biba(yî) |
| Ew ba | Ew biba |
| Em bana | Em bibana |
| Hun bana | Hun bibana |
| Ew bana | Ew bibana |

1. Xwezîka ez biçûma.
2. Xwezî ez mamoste bûma.
3. Xwezî ew ne li vir bûya.
4. Bila ew nehatina.
5. Bila em dewlemend bûna, bila xanîyê me tunebûya.
6. Bila hewa germ bibûya, bila bi toz bûya.
7. Bila li welatê me azadî hebûya, bila em xizan bûna.
8. Bila baran bibarîya, bila em şil bibûna.

1. If only I went. 2. I wish I were a teacher. 3. I wish he were not here. 4. I wish they didn't come (They shouldn't have come). 5. I wish we were rich, even if we didn't have a house. 6. I wish it would become warm, even if it were dusty (I would consent to it). 7. I wish there were freedom in our country, even if we were poor (I would consent to it). 8. I wish it were raining, even if we were to get wet (I would consent to it).

FUTURE IN THE PAST

The future indicator *ê* or *dê* together with **simple past of bilanî** forms the future in the past to describe the consequence of an imagined event; a hypothetical action or event, etc., such as **would** in English.

1. Hek ew ne li wira bûya, em ê biçûna.
2. Hek baran nebarîya, em ê bihatina.
3. Hekez bibûma sermîyandar, ez ê nuha dewlemend bûma.
4. Hek tu sermîyandar bûya, tu yê dewlemend bûya.
5. Hek hun heta malê bimeşîyana, hun ê pir bibetilîna.
6. Hek em zû raketina, em ê zû rabûna.
7. Hek roj neçûya ava, em ê hîn jî bimeşîyana.

8. Hek tu ewqas nepeyivîya, ew ê aciz nebûna.
9. Çer ku ew bihatina em ê biçûna.
10. Çer ku balafir bi hewa biketa, ez ê vegeşîyama.

1. If he weren't there, we would go. 2. If it weren't raining, we would come. 3. If I became a capitalist, I would be rich now. 4. If you were a capitalist, you would be rich. 5. If you walked home, you would get very tired. 6. If we went to sleep early, we would get up early. 7. If the sun didn't set, we would still be walking. 8. If you didn't talk that much, they wouldn't get bored. 9. We would go, as soon as they come. 10. I would return, as soon as the plane took off.

2: Transitive Verbs:

The structure is the same as intransitive verbs:

bi + dema borîya têdayî + a

DÎTIN

singular object

Min ew bidîta
 Te ew bidîta
 Wî ew bidîta
 Wê ew bidîta
 Me ew bidîta
 We ew bidîta
 Wan ew bidîta

plural object

Min ew bidîtina
 Te ew bidîtina
 Wî ew bidîtina
 Wê ew bidîtina
 Me ew bidîtina
 We ew bidîtina
 Wan ew bidîtina

1. Xwezî te li wî nexista.
2. Xwezî te nanekî din jî bikirîya, mêvanên me hene.
3. Xwezîka te elektrîk venemiranda, xewa min nayê.
4. Xwezîka min îro nobet negirta, serê min diêşe.
5. Bila ew bidîta û jê re bigota.
6. Bila wî li wan nexista.
7. Bila wan dirav giş serf nekira.
8. Hek me gişan bi hev re serî hilda, em ê nuha azad bûna.
9. Hek me ewqas çewtî nekirina, em ê azad bibûna.

10. Hek we ewqas nelîsta, hun ê bixebitîna.
11. Hek wî hêdî neajota, em ê bigihaştina trêne.
12. Hek min diravê xwe giş serf bikira, ez ê nehatîma.
13. Hek we telefonî me bikira, em ê pir kêfxweş bibûna.
14. Hek tanq û top bihatina jî, em ê bi şûn ve neçûna.
15. Hek listika wan xweş bûya, me yê jî bilîsta.

1. I wish you didn't beat him. 2. I wish you had bought another loaf of bread, we have guests. 3. I wish you didn't switch the lights off, I can't sleep. 4. I wish I didn't stand guard today, I have a headache. 5. He should have met and told him. 6. He shouldn't have beaten them. 7. They shouldn't have spent all the money. 8. If we revolted all together, we would now be free. 9. If we didn't make so many mistakes, we would become free. 10. If you didn't play so much, you would work. 11. If he didn't drive slowly, we would catch the train. 12. If I spent all my money, I wouldn't come. 13. If you phoned us, we would be very pleased. 14. Even if the artillery came, we wouldn't withdraw. 15. If their game were nice, we would also play.

Part of the sentence may be **non-bilanî**.

1. Hek dilê min bixwasta ez diçûm, nexwasta ez nediçûm.
2. Hek ew dilşad bûya, ez jî dibûm.
3. Hek nobedar li cihê xwe bûya, em nediçûn.
4. Hek baran bibarîya, min ê baranîyê xwe bianîya.
5. Hek me kar bikira, me yê hinek dirav bidaya te.
6. Hek we têlek bişanda, ez ê teqez bihatîma.
7. Hek balafirên wî tunebûna, serîhildan'ê biserketa.
8. Hek hun ewqas pev neçûna hun ê bi ser (bi)ketîna.
9. Hek me ewqas rû nedaya wî, li me wisa nedikir.
10. Hek min kevir biavêta, giş'ê bifirîyana.
11. Hek tu ne kal bûya, min ê tu bişanda.
12. Hek ew bi xew de biçûna, em ê birevîyana.
13. Hek ne em bûna, hun serfiraz nedibûn.
14. Hek kêfa te hebûya, me yê bîskeke bilîsta.
15. Hek ew ne çavteng bûya, min ê jê bixwasta.
16. Hek me li ber xwe nedaya, wan ê girav bistenda.
17. Hek wî firoşerî tiştên hêja nefîrotîna, me ji wî nedikirî.

1. If I felt like going, I went, otherwise I wouldn't. 2. If he was happy, so was I. 3. If the guard was in his place, we didn't go. 4. If it was raining, I

would bring my raincoat. 5. If we worked, we would give you some money. 6. If you sent a telegram, I would definitely come. 7. If he hadn't got aircraft, the rebellion would have succeeded. 8. If you didn't quarrel that much, you would be successful. 9. If we didn't indulge him that much, he wouldn't do this to us. 10. If I threw the stone, they would all fly. 11. If you weren't old, I would send you. 12. If they fell asleep, we would run away. 13. If it wasn't us (if we didn't help), you wouldn't be victorious. 14. If you were happy, we would play for a while. 15. If he wasn't miserly, I would ask him. 16. If we didn't resist, they would capture the island. 17. If that seller didn't sell valuable things, we wouldn't buy from him.

HETA KU

heta ku corresponds to such English conjunctions as **as long as, unless, until**. It is used with **bilanî** as well as other tenses.

1. Heta ku ew bihata, em ê biçûna.
2. Heta ku ew hat, em çûn.
3. Heta ku ew pir bipeyive, ew bi ser nakeve.
4. Heta ku wê pîrejinê negota, wan tişteke nedikir.
5. Heta ku rûyê xwe tîrş nekira, zarokê wî nedisekinî.
6. Heta ku ew bi xew de biçûna, me bi kaxezan nedilîst.
7. Heta ku keça wê dilşad bibûya, jê re çîrok digotin.
8. Heta ku em pevçûnê neqedînin, em rojeke bi kêf nabînin.
9. Heta ku wî sedema hatîna xwe ji min re negota, ez ê teqez neçûma.
10. Xwezîka heta ku tu bihata ez neçûma.
11. Xwezî heta ku gir xuya bibûya, em bimeşîyana.
12. Heta ku ew were, em ê şil bibin.
13. Heta ku em neçin, tişteke nekin.
14. Heta ku hun cixare bikişînin, hun ê bikuxin.
15. Heta ku tu çûyî, ez li wir mam.
16. Heta ku otoboz bi rê ket, me li wan nêrî.
17. Heta ku bavê min hat, me lîst.

1. By the time he came, we would go. 2. Until he came, we went. 3. As long as he talks a lot, he will not be successful. 4. They didn't do anything, unless that old woman said so. 5. His child didn't stop (calm down), unless he got

a sour look on his face. 6. We didn't play cards, until they fell asleep. 7. She told her daughter stories, until she became happy. 8. Unless we finish quarrelling, we will not see a happy day. 9. I would definitely not go, unless he told me the reason why he came. 10. I wish I hadn't gone, until you came. 11. I wish we had walked, until the hill was seen. 12. We will get wet, until he comes. 13. Don't do anything, until we go. 14. As long as you smoke, you will cough. 15. I stayed there, until you went. 16. We watched them, until the bus set out. 17. We played, until my father came.


DA KU

da ku (so that, so as, in order) is used with **bilanî**.

1. Divê ew pir zû bên da ku em bigihêjin trêne.
2. Bila bi balafirê bihata da ku bigihaşt ser bavê xwe.
3. Ez ê her tiştî bikim da ku ez dilê wî xweş bikim.
4. Hatina wan ji kesekî re nebêje da ku polis nebihêze.
5. Min ê her tişt bikira da ku kurê min bixwenda.
6. Divê em berxwedanê dom bikin da ku em bi ser Kevin.
7. Wan nedihîşt em bi Kurdî bipeyivin da ku em giş bibin Tirk.
8. Ew ê biçûna ser gir da ku xwe veşartina.
9. Wî yê navnîşana te bidaya min da ku ez bihatima mala te.
10. Ez pir dixebitîm da ku ez zû hîn bibûma.
11. Ew hindikî dixwe da ku qelew nebe.
12. Ew bi şev û roj dixebitî da ku keça wê bixwîne.

1. They must come very early so that we (can) catch the train. 2. He should have come by air so that he (could) have caught his father. 3. I will do anything in order to make him happy. 4. Don't tell anybody that they have come so that the police don't hear (find about it). 5. I would do anything so that my son could study. 6. We must continue the resistance in order to be successful. 7. They didn't allow us to speak Kurdish so that we would all become Turkish. 8. They would go up the hill in order to hide themselves. 9. He would give me your address so that I (could) come to your house. 10. I worked hard so that I could learn quickly. 11. She eats a little so that she doesn't get fat. 12. She worked day and night so that her daughter could study.

Derewa Rêwî



Rojekê rêwîyek di rê de diçû. Aciz bû, piştî xwe da zinarekî, got:

- Ax, ax! Xwezî ez li vira bimirima!

Qirçeqirç ji zinêr hat. Rêwî:


- Ê, zinar! Ma meriv derewekê neke!

Rabû ser xwe û ji wir revîya.

aciz bored

qirçeqirç (f) crack, crackle

Biratiya Deve û Berfê



Deve û berf bûbûn bira. Devê ji berfê re gotibû:
 - Ez û tu birayên hev ên axretê ne. Lê gava ku tu hatî, ji min re bibêje ji bona ku ez birevim, xelas bibim.
 Berfê gotibû:
 - Wey ser çavê min! Gava ku ez werim ez ê ji te re bibêjim.
 Rojekê berf hat ser çiyayê Begokê, deve ji xwe re bêtirs diçêrîya. Di dilê xwe de digot:
 - Berf birayê min e. Ez ê ji xwe re têr biçêrim.
 Roja din, berfê girt ser devê. Devê serê xwe bilind kir, got:
 - Ka biratiya te?
 Berfê jî got:
 - Qey tu kûr bûyî? Te serê xwe bilind bikira, te dît çiya sipî bû, tu birevîya, xelas bibûya.

birayê axretê close friend, blood-brother girtin ser to raid kûr blind
 xelas bûn *vi* to be saved/rescued bêtirs fearless(ly)
 têr satisfied; replete di dilê xwe de to oneself

BILANÎ: DEMA BORÎYA ÇÎROKÎ PAST PERFECT TENSE

Past Perfect + a (ya after a vowel)

A: Intransitive Verbs

| <u>Dema Borîya Çîrokî</u> | | <u>Bilanî</u> |
|---------------------------|---|---------------|
| Ez ketibûm | | Ez ketibûma |
| Tu ketibû(yî) | N | Tu ketibûya |
| Ew ketibû | I | Ew ketibûya |
| Em ketibûn | T | Em ketibûna |
| Hun ketibûn | E | Hun ketibûna |
| Ew ketibûn | K | Ew ketibûna |

| <u>Dema Borîya Çîrokî</u> | | <u>Bilanî</u> |
|---------------------------|---|---------------|
| Ez bûbûm | | Ez bûbûma |
| Tu bûbû(yî) | N | Tu bûbûya |
| Ew bûbû | U | Ew bûbûya |
| Em bûbûn | B | Em bûbûna |
| Hun bûbûn | | Hun bûbûna |
| Ew bûbûn | | Ew bûbûna |

In some sub-dialects sound variations occur when adding -a to bûm, etc.: bûma becomes biwama, etc. This is why in some grammar books this variation has been treated as the rule for forming this case. It is wrong however, as there is not merely one variation. For example, in some regions the variation is bama or bam, and the variation is only for those verbs whose past stems end in û. It will therefore be more useful writing according to the rule (adding a/ya to the past perfect) in the written language, instead of generalising one of the regional variations.

1. Xwezî em çûbûna mala wî, dibe ku ji me biqehire.
2. Xwezî em bi wî re nepeyivîbûna, dibe ku ji bavê xwe re bibêje.
3. Xwezîka em revîyabûna, baranê em girtin.
4. Bila em çûbûna, bila em şil bûbûna.
5. Bila ew zû raneketibûna, ma nizanîbûn em ê bihatina.
6. Hek hun zû nehatibûna, we yê em nedîtina.
7. Hek ez gihaştibûma trêne, ez ê nuha li wir bûma.
8. Hek berf nebarîyabûya, rê yê nehatibûya girtin.
9. Hek ew neçirîyabûya, min ê li xwe bikira.

1. I wish we had gone to his home, he may get angry with us. 2. I wish we hadn't talked with him, he may tell his father. 3. I wish we had run, we were caught in the rain. 4. I wish we had gone, although we would have got wet. 5. They shouldn't have gone to sleep early, didn't they know we would come. 6. If you hadn't come early, you wouldn't have seen us. 7. If I had caught the train, I would have been there now. 8. If it hadn't snowed, the road wouldn't have been closed. 9. If it hadn't torn, I would have worn (it).

B: Transitive Verbs

The same rule is applies, except that **bûn** agrees with the object.

Dema Borîya Çirokî

Min kiribû
Te kiribû
Wî kiribû
Wê kiribû
Me kiribû
We kiribû
Wan kiribû

KIRIN

Bilanî

Min kiribûya
Te kiribûya
Wî kiribûya
Wê kiribûya
Me kiribûya
We kiribûya
Wan kiribûya

Dema Borîya Çirokî

Min anîbû
Te anîbû
Wî anîbû
Wê anîbû
Me anîbû
We anîbû
Wan anîbû

ANÎN

Bilanî

Min anîbûya
Te anîbûya
Wî anîbûya
Wê anîbûya
Me anîbûya
We anîbûya
Wan anîbûya

1. Xwezî te dirav anîbûya.
2. Xwezîka min pirtûkên xwe anîbûna.
3. Xwezî me di şer de alkarîya wan nekiribûya.
4. Hek we çek neanîbûna, me yê li ber xwe nedaya.
5. Hek te navnîşana wan nedabûya min, min ê ew nedîtibûna.
6. Hek wê em nedîtibûna, ew ê biçûya mala me.
7. Hek wan baranîyên xwe neanîbûna, ew ê şil bibûna.
8. Heta ku min ew bidîtina, ew ê çûbûna.
9. Hek te ji wan re gotibûya, ew ê hatibûna.
10. Heta ku em bigihaştina gund, ew ê miribûya.
11. Hek wî kiribûya, ew nedihat vir.

1. I wish you had brought money. 2. I wish I had brought my books. 3. I wish we hadn't helped them in the war. 4. If you hadn't brought the guns, we wouldn't have resisted. 5. If you hadn't given me their address, I wouldn't have seen them. 6. If she hadn't seen us, she would have gone to our home. 7. If they hadn't brought their raincoats, they would have got wet. 8. They would have gone, until I saw them. 9. If you had told them, they would have come. 10. He would have died, before we reached the village. 11. If he had done (it), he wouldn't (have) come here.

BILANÎ: DEMA BORÎYA DÛDAR PRESENT PERFECT TENSE

bûn (bilanî: dema nuha) + past stem

| BÛN | ÇÛN |
|--------------------------|----------------------------------|
| <u>Bilanî: Dema Nuha</u> | <u>Bilanî: Dema Borîya Dûdar</u> |
| Ez bim | Ez çûbim |
| Tu bî | Tu çûbî |
| Ew be | Ew çûbe |
| Em bin | Em çûbin |
| Hun bin | Hun çûbin |
| Ew bin | Ew çûbin |

| Bilanî Dema Borîya Dûdar | |
|--------------------------|----------------------|
| <u>singular object</u> | <u>plural object</u> |
| Min ew anîbe | Min ew anîbin |
| Te ew anîbe | Te ew anîbin |
| Wî ew anîbe | Wî ew anîbin |
| Wê ew anîbe | Wê ew anîbin |
| Me ew anîbe | Me ew anîbin |
| We ew anîbe | We ew anîbin |
| Wan ew anîbe | Wan ew anîbin |

ANÎN

1. Gava ku ez hatim malê, bila elektrîk vêketibin.
2. Gava ku mêvan hatin, bila we ode maltibe.
3. Gava ku em derketin, bila seyare hatibe.
4. Hek bavê min hatibe, em ê herin.
5. Hek filîm dest pê kiribe, em nakevin hundir.
6. Hek hewa sar bûbe, ez ê sakoyê te bînim.
7. Hek wan mifte anîbe, em ê biçin malê.
8. Hek wî li Azad xistibe, em ê jî li wî bixin.
9. Hek wî av germ nekiribe, em nikarin xwe bişon.
10. Hek ew revîyabin, ew ê nuha li ser gir bin.
11. Hek wan ew biribe, ew ê biçin giravê.
12. Hek ew raketibin, em ê vegerin.
13. Hek wan derî kilît kiribe, em nikarin vekin.

1. Make sure the lights have been (are) switched on, when I come home.
2. Make sure that you have swept the room, when the guests come.
3. Make sure the car has come, when we get out.
4. If my father has come, we will go.
5. If the film has started, we will not enter.
6. If it becomes cold, I will bring your coat.
7. If they have brought the key, we will go home.
8. If he has beaten Azad, we will also beat him.
9. If he hasn't warmed the water, we can't have a bath.
10. If they have run, they will now be on the top of the hill.
11. If they have taken him, they will go to the island.
12. If they have slept, we will come back.
13. If they have locked the door, we can't open it.

FUTURE PERFECT - DÛDARA PÊŞÎ

Future Perfect refers to time before or until "then" in the future. Such as **When you arrive, I will have done it.**

1. Heta ku hun bîn, ez ê çûbim.
2. Heta ku tu sîwanan bînî, em ê şil bûbin.
3. Heta ku tu xwe bişo, min dê ew nivîsibe.
4. Heta ku hun telefon bikin, ew ê hatibin.
5. Seet di 16:00'an de, roj ê çûbe ava.
6. Gava ku hun rabin, roj ê hilatibe.
7. Gava ku hun bangî wî bikin, ew ê raketibe.
8. Roja Şemiyê wî yê pirtûk anîbin.
9. Di 1997'an de, ew ê bûbin mamoste.

1. When (by the time) you come, I will have gone.
2. Until you bring the umbrellas, we will have gone wet.
3. By the time that you have a bath, I will have written it.
4. When (by the time) you phone, they will have come.
5. The sun will have set at 6.00 pm.
6. When you wake up, the sun will have risen.
7. When (by the time) you call him, he will have slept.
8. He will have brought the books on Saturday.
9. They will have become teachers in 1997.

DIVÊTÎN: DEMA BORÎYA TÊDAYÎ

divîya/diviya + bilanî dema borîya têdayî

| | |
|------------------|---------------------------|
| <u>Dema Nuha</u> | <u>Dema Borîya Têdayî</u> |
| Divê ez biçim. | Diviya ez biçûma. |
| Divê tu nexwî. | Diviya te nexwara. |

| | |
|-------------------------------|----------------------------------|
| Divê ew bireve. | Diviya ew birevîya. |
| Divê em guhdarî bikin. | Divîya me guhdarî bikira. |
| Divê hun zû nemeşin. | Diviya hun zû nemeşiyana. |
| Divê ew xwe bişon. | Divîya wan xwe bişuştina. |

The above Kurdish sentences may be translated into English as:

| | |
|-------------------------|----------------------------------|
| I must go. | I must have gone. |
| You must not eat. | You must not have eaten. |
| He/she must run. | He/she must have run. |
| We must listen. | We must have listened. |
| You must not walk fast. | You should not have walked fast. |
| They must have a bath. | They must have had a bath. |

DIVÊTIN - DEMA BORÎYA ÇÎROKÎ

diviya(bû) + bilanî dema borîya çîrokî

Note that the English version is still **must have** or **should have** or **ought to have** as in **divetin dema borîya têdayî**. The difference between the Kurdish versions is that **dema borîya têdayî** indicates that the action **must have started**, while **dema borîya çîrokî** indicating that the action **must have been completed**:

Diviya ez seet di 4.00'an de biçûma.

Diviya ez çûbûma.

I should have gone at 4.00 (should have started going).

I must have gone (must have already gone).

| | |
|-------------------------------|---------------------------|
| Diviyabû ez çûbûma. | I must have gone. |
| Diviya tu hatibûya. | You must have come. |
| Diviya wî xwaribûya. | He must have eaten. |
| Diviyabû me dîtibûya. | We must have seen. |
| Diviya hun revîyabûna. | You must have run. |
| Diviya wan çêkiribûya. | They must have made (it). |

1. Te çima Azad nedît? Diviya te ew bidîta.
2. Gava ku ez bigîhaştîma wir, diviya min telefonî wan bikira.
3. Çer ku ew çû, diviya te ji min re bigota.
4. Çer ku mamoste ket hundir, diviya em rabûna.
5. Baran barîya, em şil bûn, diviyabû me sîwan anîbûna.
6. Bavê we li we pirsî, diviyabû we jê re gotibûya.
7. Diz di pacê re ketiye malê, diviya wan pace girtibûna.

1. Why didn't you see Azad? You must have seen him. 2. I should have phoned them, when I arrived there. 3. You should have told me, as soon as he/she went. 4. We should have stood up, as soon as the teacher came in. 5. It rained, we got wet, we should have brought the umbrellas. 6. Your father asked about you, you should have told him. 7. The thief has entered the house through the window, they should have closed the windows.

TEVA KU

Teva ku (although) has also the form **tevî ku**.

1. Teva ku kêfa me tunebû, me li wî guhdarî kir.
2. Tevî ku ez kal bûm, min alîkarîya wan kir.
3. Teva ku em bi ser neketin, têkoşîna me nesekinî.
4. Teva ku wan bi balafiran êrîş kir, têkoşîn nesekinî.
5. Teva ku tiştên wî pir hêja bûn, me nekirîn.
6. Teva ku bavê wî mamoste ye, bi tişteki nizane.

1. Although we were not happy, we listened to him. 2. Although I was old, I helped them. 3. Although we didn't succeed, our struggle didn't stop. 4. Although they attacked with aircraft, the struggle didn't cease. 5. Although his things were very valuable, we didn't buy (them). 6. Although his father is a teacher, he knows nothing.

RAWEYA ÇÊBIWAR - PARTICIPLES

Participles make adjectives out of verbs, such as **gone**, **fallen**, **wounded**, **sitting**, **waiting**. Kurdish participles are formed by adding **-î** (**-yî** after a vowel) to the **past stem**.

| infinitive | past stem | participle | |
|------------|-----------|------------|--------------|
| ketin | ket | ketî | fallen |
| vekirin | vekir | vekirî | open |
| girtin | girt | girtî | closed |
| çêkirin | çêkir | çêkirî | made |
| rûniştin | rûnişt | rûniştî | sitting |
| vêketin | vêket | vêketî | (lights) on |
| betilîn | betilî | betilî | tired |
| vemirîn | vemirî | vemirî | extinguished |
| çûn | çû | çûyî | gone |
| hişyar bûn | hişyar bû | hişyarbûyî | woken |
| kurt kirin | kurt kir | kurtkirî | shortened |

Note that past stems of compound verbs normally written as two or more separate words are written together as a participle.

Keça rûniştî hevala min e/The girl sitting is my friend.

Pantorê kurtkirî yê wî ye/The shortened trousers are his.

HÎNDARÎ 22

A: Dîyalogê bixwînin û pirsan bersîv bikin.

- Ma Azad ji girtîgehê derket?
- Na hîna tê de ye.
- Hek wî ewqas zû neajotibûya, ew ê nuha azad bûya.
- Hek ew derkeve jî, ew ê dîsa wek berê bajo.
- Ka em biçin serdana wî û pê re bipeyivin da ku cardin ewqas zû najo.
- Hek em berê pê re peyivîbûna yê baştir bibûya.
- Divê em ji wî re bibêjin ku heta ku ew ewqas zû bajo, derdên wî naqedin.

1. Heke Azad ewqas zû neajotibûya, ew ê nuha di girtîgehê de bûya?
2. Çima dixwazin bi Azad re bipeyivin?
3. Hek we dîyaloga jorîn nexwendibûya, we yê bikariya herdu pirs bersîv bikirina?

B: Lêkerên jêrîn wergerînin Dema Borîya Çirokî.

1. Hek tu bihata, ez ê biçûma.
2. Hek te bikira, wanî nedibû.
3. Hek baran nebarîya, em şil nedibûn.
4. Hek ez bigihêjim trêne, ew ê pir baş bibe.
5. Hek wan ji me re bigota, em ê bihatina.
6. Hek we ewqas dirav nedaya wî, ewqas tişt nedikirî.
7. Hek wan pirtûkên me bianîna, me yê ew bixwendina.
8. Heta ku tu bigihêştê wir, rojê biçûya ava.
9. Hek we ew baş veşarta, wanê nedîta.
10. Heta ku tu ji wî re bibêje, tişteke namîne.

C: 9 hevokên çewt bibînin.

1. Hek hewa xweş bûya em ê biçûna sînemayê.
2. Hek Silo li wir beya, me yê pirtûka wî jê bistenda.
3. Hek te ew avêtibûya, bavê te yê biqehirîbû.
4. Heta ku ew bihata, me yê şiv bixwara.
5. Ez ê birevîyama, da ku ez bigihêştibûm trêne.
6. Hek min ji wan re gotibûya, wanê ew anîbûya.
7. Hek me Azad bidîtibûya, me yê ew jî anîbûya.
8. Heta ku ew çûbû, malê giş şewitîbû.
9. Heta ku wan name şandibe, Azad ji girtîgehê derketibû.
10. Hek berf nebarîyabûya, em ê nahatîbûna.
11. Hek ew nehatibe, ji Bawer re bibêjin.
12. Heta ku roj derkeve, em ê hişyar bûbina.
13. Seet di 4:00'an de, ew ê raketibe.
14. Hek wan av germ kiribin, em ê xwe dişon.
15. Roja Yekşemê Xecê yê hatibe.
16. Di 1992'an de, ez ê vegeşîyabûm.
17. Te jê re bigota, wî yê bine.

Na Rûvî ye!



Mêrik û jina xwe çûn nav zevîyê. Kîroşkek ji ber wan rabû, revîya. Jinikê ji mêrê xwe re got:

- Rûvî.

Mêrik got:

- Na, jinik, ew ne rûvî ye; ew kîrgo ye.

- Na, rûvî ye.

- Na kîrgo ye.

Dest bi şer kirin. Yekî go kîrgo ye, yekê go rûvî ye. Êvarî mêr û jin pevra hatin malê. Jinikê çû nivînê xwe danî, xwe dirêj kir, raza. Mêrik got:

- Keçê rabe, ji me re hinek xwarin bîne, em birçîne.

- Hek tu bibêjî rûvî ye, ez ê rabim, hek tu nebêjî ez ranabim.

- Welleh kîrgo ye.

Mêrik kir nekir jinik ranebû. Ew rabû çû xwarin anî, xwar, nivîne xwe danî û heta sibê raza. Sibê rabû, ji jina xwe re got:


- Keçê rabe, hinek nan bîne, ez ê herim cot!

- Hek tu bibêjî rûvî ye.

- Welle kîrgo bû!

Jinik ranebû. Mêrik çû cot; êvarî vegerîya malê, dît ku jinik hîna di nav nivînê xwe de razaye, ne tenûr dadaye, ne nan patiyê. Mêrik got:

- Qîzê te çima tenûr daneda? Nan nepat? Xwarin çenekir?



- Bibêje rûvî bû, ez ê rabim, an na ez ranabim.

- Welle kîrgo bû! Qîzê rabe! Vî awayî terk bike! Şuxulê xwe bike!

- Bibêje rûvî bû, ez rabim, an na ez ranabim!

- Welleh kîrgo bû! Keçê binêre, ez ê herim ji cîranan re bibêjim, werin jina min dimire.

- Bibêje rûvî ye ez ê rabim, an na ez ranabim.

- Welle kîrgo bû!

Mêrik ji cîranan re got:

- Werin jina min nexweş e, dimire, halê wê tune.

Cîran kom bûn, giş hatin, dîtin ku jinik nexweş e, halê wê tune. Mêrik ji jinikê re got:

- Keçê rabe, bes e!

- Bibêje rûvî ye, ez ê rabim. An na ez ranabim.

- Welleh kîrgo bû!

Jinikê çavên xwe girtin, xwe mirand. Mêrik got:

- Keçê rabe, ez ê bibêjim jina min miriye, ew ê te bibin têxin mezel.

- Bibêje rûvî bû, ez ê rabim, an na ez ranabim.

- Welleh kîrgo bû!

Mêrik rabû ji cîranên xwe re got:

- Werin, jina min miriye!

Cîran hatin, dîtin ku jina wî miriye. Ava wê germ kirin.

Kefenê wê hazir kirin. Mêrik devê xwe kir guhê jinikê got:

- Qîzê rabe, ew ê te bişon, kefen bikin, têxin bin erdê.

- Bibêje rûvî bû, ez ê rabim, an na ez ranabim.

- Welle kîrgo bû!

Jinik şuştin, tabûta wê rakirin, birin ser mezel. Mêrik devê xwe kir guhê wê got:

- Keçê rabe, tu anîne ser mezel, ew ê te têxin hundir mezel, ser te tijî ax bikin.

- Bibêje rûvî ye, ez ê rabim, an na ez ranabim.

- Welleh kîrgo bû!

Jinik kirin mezel, mêrik ji gundiyan re got:

- Bisekinin, jina min e; ev bîst sal in, em bi hev re ne. Ez ê dakevim hundirê mezel, xatir jê bixwazim û derkevim.

Mêrik ket hundirê mezel, devê xwe kir guhê jinikê got:

- Jinik, binêre tu kirine hundir mezel, ew ê axê bavêjin ser te. Evda xwedê, were vê yekê neke, zarokên te hûr in, rabe em herin!

- Bibêje rûvî ye, ez rabim.

- Welle kîrgo ye!

Mêrik ji mezel derket, ser wê tijî ax kirin.

cof (m) plough

dadan (dada) vt to light

eyd man, human being (in relation to God)

hal tunebûn to be weak/exhausted

hûr little

kefen (m) shroud

mezel (m) grave

mirandin (bimirîne) vi to kill
(xwe ~) pretend to be dead

razan (razê) vt to sleep

rûvî fox

şuxul (n) work

tabût (f) coffin

tenûr (f) earthenware oven

vegerîn (vegere) vi return, come back

welle, welleh By God

xatir xwestin vt to say goodbyes

zevî (f) field

FERHENGOK

balo at least

baz dan vt to run (away); to dance

berçavk (f) glasses

berê xwe dan (derekê tişteki) vt

to head/go/turn towards

bê without, -less

bêyî ku without

bi with

bizîn, bizîyan (bibize) vi to be badly

frightened, to be scared out of one's wits

bizonek coward, timid

civandin (bicivîne) vt to gather, to

collect

çok, çong (f) knee

derewçin, derewîn liar

destmal (f) handkerchief

devê yekî negerîn vi to be unable to

speak

fersend (f) opportunity, occasion,

chance

fersend dan vi to give the opportunity

fersend pê ketin vi to have/get the

opportunity

gewr whitish, light grey

gotin qey vt to think that

helkehelk (f) panting

heste (m) lighter

hêz (f) strength, power

him...him both...and

hirç bear

ji dewsa (ku) instead of, in place of

ji dêvla (ku) instead/in place of

ji xêndî, ji xeynî except

kef (f) foam

jê kat kirin vt to mention

lerizîn (bilerize) vi to shiver, to

shake

nav lê kirin vt to name

nivîsar (f) article, essay

peyv (f) word, speech, talk

pê kanîn vi to manage, to be able to

cope with

pî (m) arm

pîrçînî, pîrçînî (f) laughter

qelibîn (biqelibe) vi to turn over

rûyê yekî qelibîn to grow pale

qe(t) nebe at least

qîdûm (f) strength

qîdûmê yekî şikestin vi to be badly

frightened, to be scared out of one's wits

rêbir bandit, brigand

ricifîn (biricife) vi to shake, to tremble

serpêhatî (f) experience, adventure

sipîboz pure white, snow-white

sîng (f) chest

taşî naked

taşî kirin vt to rob

tew tunebe at least

tîrs (f) fear

tîrsonek, tîrsek (f) coward, timid

ta mirinê fatal fever

vir (f) lie

wekî din what else, else

wêrîn (biwêre) vt to dare, to venture

xwe self, oneself

bi xwe personally, in person

bi xwe ber automatically, by oneself

xwe xwe, xwe bi xwe alone, to/by

oneself

zûka quickly

balo, **qe nebe**, **tew tunebe** and **ji tune de** all mean **at least**. **balo** is only used with **bilanî** and the **imperative**. The others are used with all tenses.

1. **Balo te telefon bikira.**
2. **Balo ji bavê wî re bibêjin.**
3. **Balo wan derî negirtibûya.**
4. **Balo sîwanê bi xwe re bibe.**
5. **Qe nebe 5 zilam hebûn.**
6. **Qet nebe sê gundên wî hene.**
7. **Qe nebe îro neçe.**
8. **Qe nebe me jê re got.**
9. **Tew tunebe 4 gundî hebûn.**
10. **Ji tune de cîhê xwe ji me re bibêje.**
11. **Ji tune de sê kesan lê xist.**

1. You should have at least phoned. 2. At least tell his father. 3. At least they shouldn't have shut the door. 4. At least take the umbrella with you. 5. There were at least 5 men. 6. He has at least 3 villages. 7. At least don't go today. 8. At least we told him/her. 9. There were at least 4 villagers. 10. At least tell us your place (where you are). 11. At least 3 people hit him.

berê xwe dan (derekê/tiştêkî) expresses moving in the direction of something/a place

1. **Piştî ku ji malê derket, berê xwe da xwendegehê.**
2. **Çer ku wî dengê bihîstibû, berê xwe dabû gund.**
3. **Berê xwe bide min û bipeyive.**
4. **Em ê ji vir derkevin û berê xwe bidin malan.**

1. He/she headed towards the school, after leaving home. 2. He had turned towards the village, as soon as he had heard a voice. 3. Face me (turn round) and speak. 4. We will go out of (leave) this place and head for the houses.

bê (-less, without) is normally written separately, but together with a noun it also forms new words. It is not written separately in that case. **bi** (-ful, with) is also used in the same way.

1. **Bila çaya min bê şeker lê bi şîr be.**
